


HEJMAR 4 2021

# BERNA MEGEH

## JAN DOST

DERDÊ DUZIMANIYÊ

## OCCO MAHABAD

DÎROKA MEWLÛDÊN ZAZAKÎ

## HESENÊ METÊ

XEZEBA XWEDÊ

## MİSTEFA AYDOGAN

MİROVAYÎ JEHRDADAYÎ

BERNAMEGEH

# NAVEROK


04 Ji Edîtor

05 Jan Dost / Derdê Duzimaniyê

07 Hêvî Hêvîdar / Di Gerdûnekî Din De

08 Occo Mahabad / Dîroka Mewlûdên Zazakî

13 Rûbar Elî / Raperîn

14 Lokman Polat / Wêje, Dîrok û Romanên Dîrokî

20 Şoreşger Karakol / Çavên Melûl

21 Evîn Hesen / Deyndar Im

22 Memê Miksî / Kur Ji Kirina Xwe Şerm Dike

23 Rêber Hebûn / Helbestvanê Nemir Ferhad Içmo

24 Can Brahîm / Çavên Şil

26 Îkram Oguz / Pênc Pirtûk û Nivîskarek

31 Mahmûd Derwîş / Ji Bahozê Pê ve Ji Yê Kurdan Re Tune / Wergêr: Fewaz Ebdê

33 R. Kemal Bindal / Beg Li Helebê, Firara Seîd Begê Helebî

35 Xelîl Duhokî / Hejarino

36 Hesenê Metê / Xezeba Xwedê

39 Kevok Mizgîn / Dengek Ji Biyaniyê

40 Keyhan Mihemedînijad / Ceco Xan

43 Newaf Mîro / Xidir Eylaz û Xidir Nebî, Xizir yan Walentîn

45 Alî Bayram / Matem A Tîk

46 Soran Hemereş / Berdeysan Kî Bû? / Wergêr: Muhsîn Ozdemîr

49 Evîn Çîçek / Merî Ber Bayê Penaberiyê Germ Nabe, Dikizire

50 Şîlan Doskî / Hêroya Kurdî

53 Ramazan Kavak / Qesasê Pezkoviyan

# NAVEROK


54 Azad Ekkaş / Çend Hilbijarde Ji Erotîkaya Yanîs Rîtros

56 Nîhat Oner / Kulla Mûşê

58 Mistefa Aydogan / Mirovayî Jehrdadayî

62 Tengezar Marînî / Şev û Mij

63 Yaqûb Kurmanc / Roja Cilûberg ango Kincên Kurdî Pîroz Be

65 Mehmûd Badilî / Dara Şilfî Tazî

66 Hem Bozan Qeregeçîye / Girêka Gordîonê

67 Lîda Gerdenzerî / Bahar

68 Îhsan Bîrgul / Televîzyon û Ziman

69 Xakî Bîngol / Çar Bistî

70 Ezîz Xemcivîn / Bihna Baharê

72 Sıraç Oğuz / Mêrxas û Neteweperwerê Kurd Seyda Melle Selîm

75 Mihemed Hesko / Ey Felek

76 Seîd Veroj / Dr. Mesûd Fanî Bîlgîlî

83 Bûbê Eser / Ew in Dijminê Mirovayî

84 Ronî Stêrk / Rewşa Zimanê Kurdî Li Almanyayê

91 Farûqê Feroyî / Nezanîn Ne Şerm e

92 Mamo Kader / Tirsa Heralî

93 Rûmet Med / Li Ser Sînemaya Kurdî û Sînemaya Cîhanê 10 Pirtûk

99 Mahîn Şêxanî / Qedera Dirêj



# Ji Edîtor

Bi hejmareke nû dîsa em li ber we û li ba we ne. Kovara Bernamegeh bi tenê dixwaze ku civata Kurd bi çand, hûner û edebiyata xwe dewlemendtir bibe. Ne siyaset e ku asta civatekê bilind dike, ji bo pêşketin û serkeftinê her tim çand, huner û edebiyat lazim in.

Di vê hejmarê de Jan Dost meseleya duzimaniyê û têkiliyên serdestî û bindestiyê hildaye dest, Occo Mahabad bi lêkolîneke giranbiha bi her awayî Dîroka Mewlûdên Zazakî nivîsandiye. Hesenê Metê bi çîrokeke herikbar dilê xwendevanan fireh û aram dike, Mistefa Aydogan birîn û êşa me ya dîrokî Karesata Helebçeyê bi zimanekî dilşewat radixine awêneya hişê me.

Ji xêncî wan gellek nivîskarên vê hejmarê bi gotar û helbestên xwe yên rengoreng bi we re ne.


Koordînatorê Giştî: Occo Mahabad


Edîtor: Mihemed Keskîn, Cîhan Soylu

Rûpelsazî: Mîtannî Ajans

Email: bernamegeh@gmail.com

Malper: www.bernamegeh.org


Her nivîskar ji nivîsên xwe berpirsiyar in.



> Em ziman û desthilatdar wek hev dihesibînin. Êdî em ziman jî alavekî çewsiandina xwe û zimanê xwe dibînin.

# JAN DOST

## Derdê Duzimaniyê

---

Mirov eger du zimanan yan jî bêtir bizanibe, bêguman dewlemendiyek e ku bi dest her kesî nakeve. Gelek mirov hene, berê xwe didin welatekî ku ji zimanê wî hez dikin û bi salan li wir dimînin ku fêrî wî zimanî bibin. Ez hinan nas dikim, mîna Hadî El Elewî yê rehmetî ku fîlosofekî ereban î mezin bû û dostekî dilsoz ê gelê kurd bû û ji şiroveya min a Mem û Zînê re pêşgotinek hêja nivîsî bû, li Çînê mabû û fêrî zimanê çînî bûbû, pê dixwend û dinivîsî. Carekê ez çûm li Şamê bûme mêvanê wî. Ewî li ser deriyê xwe bi erebî û çînî nivîsî bû. Li mala wî jî wêneyên fîlosofê çînî Law Tsê û nivîsên çînî dîwarê wî xemilandibûn.

Ê me kurdan, ji mecbûrî em herî kêm fêrî du zimanan dibin. Ji ber ku em bindestê sê neteweyan in divê em her yek li beşê xwe fêrî zimanê neteweya desthilatdar bibin. Êdî di navbera „me“ û wan zimanan de dijminahî derdikeve holê. „Em“ di kûrahiya hinavê xwe de, di dilê xwe de dijmintiya wî zimanê serdest dikin. Em ziman û desthilatdar wek hev dihesibînin. Êdî em ziman jî alavekî çewsiandina xwe û zimanê xwe dibînin. Heta radeyekê ev hizr rast e. Dijmin, yan desthilatdar berî her tiştî dixwaze ziman bi bindestên xwe bide jibîrkirin.

Dagîrkirina rûhî rêyan li ber dagîrkirina giştî vedike, û ew  dagîrkirina rûhî jî qet nikare pêk were eger milletek girêdayî zimanê xwe bimîne. Me got divê mirov  „zimanê dijmin“ anku  zimanê serdest neke qurbana nakokiyên etnîkî. Çima? Ji ber ku ziman afrîdeyekî bêlayen e, gunehê wî di kiryarên hovane de nîne. Zimanê erebî mesela, ne zimanê Seddam Husên û Beşar Esed e. Ew zimanekî ku di pêvajoya dîrokê de  li ser destê gelek neteweyan (Kurd bi xwe di nav de) hatiye sîqalkirin û bi pêş de hatiye. Lê li vir divê milletek, yan jî kesek zimanê xwe jî kêm nebîne ji ber ku ew bindest e, divê bindestiyê neke eyba zimanê xwe. Gelek helbestvanên kurd hene, di dema ataturkiyetê de bi dizî bi kurdî nivîsin, nifşên min bi xwe di serdema Baas de di quncên tarî de wêje û ziman bi pêş de bir. Fêrbûna kurdî sûcekî giran bû di dewleta faşîst a Baas de.

Mirov dikare bi du zimanan di yek katê de hestên xwe derbibirre. Bi taybetî gava ku herdu ziman ji zarotî de bi mirov re mezin bûbin. Ez wek mînak, erebî li ba min hema hema zimanê dayikê ye. Ji pêncsaliya xwe de bi awayekî firehtir ji kurdî ez fêrî erebî dibim. Li mal, bi dayik û bav û xweh û bira û cîranan re ez bi kurdî diaxivîm.

Tenê diaxivîm. Lê li dibistanê, ez bi erebî fêr dibûm ku bixwînim û binivîsim û bi mamoste re biaxivim.

Wisa herdu ziman, erebî û kurdî li ba min bi hev re li rex hev mîna cêwiyan xwedî bûn û mezin bûn.

Şêrîniya kurdî taybetmendiyek wê hebû û heye. Ew zimanê diya min e, zimanê bavê min e, yanî ew zimanê hebûna min e. kûr heta tu bibêjî bes di hindirê giyanê min de çûye. Erebî jî zimanê mêjî, fikr, hest, û gelek aliyên din e. Erebî pencereya min î ku mi  tê re li wêjeya cîhanê, felsefeya dunyayê nihêrî ye.

Helbet gava ez kurê welatekî serbixwe bama, dikaribû erebî ji min re nebûba meraq jî, lê vê mecbûriyetê aliyekî xwe yê erênî hebû û encamek qenc da.

Mixabin dema ku ez romanekê bi erebî dinivîsim, gelek kurd hene dilê xwe digrin, dibêjin: çima tu bi „zimanê dijmin“ dinivîsînî? Ji xwe hinan jî sixêf kirin min û bi gotinên zêde kirêt pêşwaziya nûçeya derketina yekemîn romana min î erebî kirin. Ji bo min nenivîsîna bi erebî mîna veşartina gencîneyekê ye, mîna veşartina dermanekî ku divê were bikaranîn e. Loma jî ez di navbera herdu zimanan de, kurdî û erebî mîna ku di hêlanekê de bim diçim û têm.

Min xwe gelekî ragit da ku bi erebî helbestan û romanan nenivîsim. Heta ez bûme pêncî sal min her hestên xwe bi kurdî nivîsîn. Zimanê erebî ji bo min zimanê lêkolîn û wergerê bû. Lê êdî ava ku di binê erdê de kombûbû, bêgav bû ku rêya xwe ber bi jor de bibîne, biherike û mîna kaniyekê biteqe.



# HÊVÎ HÊVÎDAR


## Di gerdûnekî din de

Giyan westiya, ez çawa newestim?
Bîranînên te dîsa serî hildane,
Hemû tax û kolanên dil hatiye talan kirin.
Pir ditirsim rojek min bêhêz û bêruh bihêle evîna te.
Hiş nema li serê min û hêdî hedî dihelim...
Nikarim xwe li ser pêyan bigirim,
Êdî giran dibe laş û hişên min.
Evîna te ji min re giran tê,
Evîna te ji pênûsê re giran tê,
Pênûs nikare peyvan bîne ba hev;
Avnûska evîna te xwe kuştiye,
Ji ber ku nekariye te bide fêm kirin!
Ji ber ku ber te stûxwar mane hemû peyv...
Lê ruh û dilê min dizane;
Gerdûneke din de ez û tu li ba hev in.
Çîroka bextewariyê li ser me de tê xwendin,
Lê belê ne mîna efsaneya Mem û Zîn e...
Haya tu kesê ji me tune ye li wir.
Lewma delalîka ber dilê min;
Îşev şabûn û dilrewaniya te divê,
Ji ber ku çiqas em negehin hevdu jî,
Evîna me dê ziman bi ziman bigere.
Ew ê tu bajar û welat nehêle ku me nede naskirin!
Dilê xwe fireh bike.
Ev cîhana ku nehişt em bigehin hevdu,
Wê rêyeke nû veke bi mirina me.
Dawiyê emê bimrin ku bikaribin bigehin hevdu.



# OCCO MAHABAD

## DÎROKA MEWLÛDÊN ZAZAKÎ



Di edebiyata Zazakî de cihê mewlûdan bi berhema Mela Ehmedê Xasî ya bi navê Mewlûda Nebî dest pê dike.

Mewlûd di tesewifa Îslamê de cihekî girîng digire. Koka vê peyvê ji zimanê Erebî tê. Li gorî kok û bêjeyê bi wateya welîdinê tê binavkirin. Mijara mewlûdan bi giştî jidayikbûna pêxember, heta mirina pêxember bûyer û qewimînên çêbûyî û mucîzeyên ku di vê navberê de pêkhatî ne. Hem di edebiyata Kurmancî hem jî di edebiyata Zazakî de ji ber baweriya ola Îslamê cihêkî taybet digire. Di Kurmancî de mewlûdên herî girîng yên Melayê Bateyî, Mela Eliyê Baqustanî û Seydayê Tîrêj in. Ji bilî wan Mewlûdnameya Şêx Hisê Qazî ya bi Soranî û Mewlûdnameya Mela Ebdilla Bilberî ya bi Hewramî mewlûdên herî naskirî ne.
Di edebiyata Zazakî de cihê mewlûdan bi berhema Mela Ehmedê Xasî ya bi navê Mewlûda Nebî dest pê dike. Ev berhem di sala 1892an de bi tîpên Erebî tê nivîsandin û di sala 1899an de li çapxaneya Litografyayê tê çapkirin. Mewlûda wî ji 14 beşan û 366 beytan pêk hatine.

Ehmedê Xasî di sala 1867an de li gundê Xasê yê nehiya Hezanê ku girêdayî Licêya Amedê ye tê dinyayê. Navê bavê wî Hesen yê diya wî Medîne ye. Kalikê wî Osman di dema meletiya xwe de li Hezanê bi cih dibe. Bi navê Mistefa û Mihemed Emîn du birayên Xasî hene. Perwerdeya xwe ya pêşî li cem bavê xwe Hesen hildide. Piştî bavê xwe ilm û îrfana xwe di gundê Pêçar de li ba mele û alimê wê demê bi Mustafa Hatib re didomîne. Piştî Pêçarê perwerdeya xwe di Medreseya Mesûdiyê de ku girêdayî mizgefta Mezin ya Diyarbekirê ye temam dike û îcazeta xwe ji miftî Hecî Îbrahîm distîne.

Xasî di saziyên dewleta Osmanî de erk û wezîfeyên curecur dike. Di sala 1909an de ji ber fikr û ramanên xwe yên ayînî bi fermana Îttihatparêzan sirgûnî girava Rodosê tê kirin. Heta damezrandina Komara Tirkiyê li navenda Diyarbekir û Hezanê dersdariyê û li Liceyê miftîtiyê dike. Piştî damezrandina Komara Tirkiyê dest ji karê xwe berdide û nawxaze di bin banê hikûmeta Kemalîstan de bixebite.

Ehmedê Xasî heta mirina xwe li Hezanê dijî, sê caran dizewice û ji jina xwe ya dawî xwedî qîzekê ye. Ehmedê Xasî zimanên Erebî, Tirkî û her du zaravayên Kurdî yên Kurmancî û Zazakî baş dizane. Di 18ê sibata 1951ê de li Hezanê jiyana xwe ji dest dide. Gora wî li Savatê ye. Mewlûda Nebî tam pênc caran tê amadekirin û Latînîzekirin. Transkrîpsiyon û latînîzekirina herî pêşî di sala 1985an de ji aliyê Malmisanij ve tê kirin û di kovara Hêvî de tê weşandin. Latînîzekirina duyemîn di sala 1994an de bi destê Mihanî tê kirin û ji weşanxaneya Firatê tê çapkirin. Latînîzekirina sêyemîn di sala 2005an de ji aliyê Mele Mihemedê Kavarî ve tê kirin. Latînîzekirina çaremîn bi destê W.K.Merdımin di sala 2008an de tê kirin û transkrîpsiyona herî dawî ji aliyê Roşan Lezgîn ve 2008an de tê amadekirin. Kesên ku latînîze kirine di wergerê de navê berhemê ji hev cudatir bi nav kirine. Malmisanij wek Mewlidê Nebî, Mihanî bi Mewlûdê Nebî, Melle Mihemedê Kavarî Mevludî Zazakî, W.K.Merdimin wek Mewlîd û ya dawî Roşan Lezgin bi navê Mewlidê Kirdî sernavê berhemê senifandine.

Berhema Ehmedê Xasî ji aliyê nivîskî ve wekî mewlûda Melayê Batê cihekî girîng û taybet digire. Bi vê mewlûdê rêyek vedibe û mewlûdên cihê cihê yên zazakî tên nivîsandin.

Mewlûda duyemîn ku piştî ya Ehmedê Xasî, mewlûda Biyişê Peyxemberî ya Osman Efendiyo Babij e ku di sala 1903yan de hatiye nivîsandin. Mewlûda wî bi giştî ji 8 beşan û 196 beytan pêk hatine. Her beşê mewlûdê li gorî xwe behsa mijarekê dike.

Osman Efendiyo Babij di sala 1852an de li gungê Babê yê Sêwrega Rihayê welidiye. Navê wî yê fermî Osman Efendî ye lê di nava gel de wek Osman Efendiyo Babij hatiye naskirin. Navê bavê wî Hecî Eyup Efendî û yê diya wî Emîne Xanim e. Bavê wî demekê miftîtiya Sêwregê dike ji aliyê gel ve pirr tê hezkirin. Osman Efendiyo Babij piştî perwerdeya xwe ya medreseyê îcazeta xwe hildide li Sêwregê dest bi memûriyetê dike. Bi mirina xoceyê wî yê hêja Zilfîkar Zuhtî Efendî re di sala 1905an de ji bo miftîtiya Sêwregê tê tayînkirin.

24 salên xwe di miftîtiya Sêwregê de derbas dike. Di sala 1929an de jiyana xwe ji dest dide niha gora wî li Sêwregê ye. Osman Efendiyo Babij zimanên Erebî, Osmanî, zaravayên Zazakî û Kurmancî yên Kurdî  dizanibû.

Mewlûd piştî mirina Osman Efendiyo Babij herî pêşî di sala1933yan de ji aliyê Celadet Bedirxan ve bi tîpên Erebî li Şamê tê çapkirin. Transkrîpsiyona ewil ya bi tîpên Latînî di sala 1985an de ji aliyê Malmisanij ve tê kirin û di hejmara çaremîn ya kovara Hêvî de bi navê Biyîşê Pêxemberî tê weşandin.
 Enstîtûya Kurdî ya Amedê di sala 2007an de mewlûdê careke din bi navê Mewlido Dimilî (Zazakî) çap dike. Dîsa Mewlûd ji aliyê Roşan Hayig ve di kovara Zazana de bi navê Biyayişê Pêxemberî tê weşandin. Herî dawî Ahmet Kırkan di teza xwe ya lîsansa bilind de mewlûdê bi navê Bîyîşa Pêxemberî bi nav dike.

Mewlûda ku ji aliyê Malmisanij ve hatiye amadekirin 196 beyt ya ji aliyê Enstutiya Kurdî ya Amedê 205 beyt, ya Roşan Hayig 206 beyt û ya Ahmet Kırkan 204 beytan pêk hatine. Mewlûda Osman Efendiyo Babij bi zimanekî sade, fambar û watebar hatiye nivîsandin.

Mewlûda sêyemîn ya Zazakî ji aliyê Mela Mihemedê Elî Hun ve di sala 1971an de tê nivîsandin. Mewlûd ji çar beşan pêk hatiye. Ziman û vegotina wî sade, herikbar, fambar û bi zimanekî xelkî ye lewma bi hêsanî tê fêmkirin û xwendin. Mela Mihemedê Elî Hun di navbera navçeyên Palû û Gencê de li bajarokê Beyhanê yê Xarpêtê di sala 1930an de tê dinyayê. Navê wî yê fermî Mehmet Ali Öztürk e.

Zarokatiya wî di bajarên Xarpêt, Sêrt û Şirnexê de derbas dibe. Bajarên Amed, Cîzir, Bismil û Farqîn ji bo wî dibin cihên ilm, îrfan û kemilandina olî. 25 salên wî bi peywira meletiyê derbas dibe, piştî ewqas xizmet û xebatên ilmî teqawît dibe. Mela Mihemedê Elî Hun di nava gel de rêz û hurmeteke mezin dibîne û ji aliyê xelkê herêmê ve pirr tê hezkirin. Mewlûda wî di sala 2004an de ji aliyê kovara Vateyê tê weşandin. Berhem bi giştî 120 rûpelan pêk tê. Qesîdeyên Kerbela, Ûsiv û Zileyxa beşên balkêş in ku bi hêmanên xwe yên mîstîk û giyanî dilê mirovên bawermend hêsa dikin.

Mewlûda çaremîn ya Mela Kamil Puexî ye. Mewlûd 65 rûpel e ji beşekê û 104 beytên balkêş hatine sêwirandin û nivîsandin. Di sala 2003yan de li Stenbolê bi navê Mewlîdî Nebî tê çapkirin. Transkrîpsiyona Latînî ya ewilî ji aliyê W.K. Merdimin ve tê kirin. Mela ne bi tenê alimekî ye ew helbestvanekî jêhatî ye jî piştî kutabûna mewlûdê em dibînin ku heyşt helbestên wî yên li ser mirin, axret û  jiyana fanî di berhemê de cih digirin.

Mela Kamil Puexî di sala 1938an de li gundê Puexî yê Çewlikê tê dinyayê. Zaroktî û ciwantiya wî bi xwendin û têgihiştina olî ve derbas dibe. Perwerdeya xwe ya medreseyê li Mêrdîn û Diyarbekirê temam dike. Piştî medreseyê dest bi meletiyê dike. Di dema meletiyê de sirgûnî navçeya Gencê ya Çewlikê dibe. Emrê wî bi zor û zehmetiyan derbas dibe niha teqawît bûye.
Di sala 2003yan de kovara Vate di hejmara xwe ya 19. de mewlûdê diweşîne. Mela Kamil Puexî mewlûdê bi devoka Çewlikê nivîsandiye.

Mewlûda pêncemîn ya Mela Mehamedê Muradon e ku di navbera 1999 û 2000an de tê temamkirin. Tê de 7 beş û 204 beyt hene. Berhem bi navê Mewlidî Zazakî ji aliyê kovara Vateyê ve di sala 2003an de tê weşandin. Transkrîpsiyona mewlûdê bi destê W.K.Merdimin û N.Celali tê kirin.

Mela Mehamedê Muradon di sala 1952yan de li gundê Muradonê ku girêdayî Genca Çewlikê ye tê dinyayê. Perwerdeya xwe ya pêşî ji bavê xwe digire. Pişt re li Mûşê perwerdeya xwe temam dike û di sala 1976an de dest bi peywira xwe dike. Di sala 1977an de ezmûna meletiyê qezenc dike ji bo peywira xwe ya nû diçe navçeya Bongilanê ya Çewligê.
Di derbeya eskerî ya 12 îlonê de sirgûnî navçeya Gixî ya Çewlikê tê kirin. Sirgûnkirinê wek heqaretek qebûl dike dev ji memûriyetê berdide koçî Qosera Mêrdînê dibe. Di Medreseya Şêx Silhedîn de demekê dersdariyê dike. Bi şîretên derdora xwe dîsa serî li memûriyetê dike ji bo peywirê tayînî bajarê Çorûmê tê kirin. Piştî salekê vedigere Paliya Xarpêtê. Nêzî pênc salên xwe li Paliyê derbas dike. Bi biryara rakirina sirgûntiyê re ji bo wezîfeyê vedigere navçeya Gencê.
Mela Mehamedê Muradon jî wekî Mela Kamil Puexî helbestvan e. Li navçeya Qoserê dest bi nivîsandina helbestan dike. Hem helbestên xwe hem jî mewlûda xwe qeyd dike ser bandên teyibê ku bên parastin.

Mewlûda şeşemîn Mewlûda Nebî ye ji aliyê Abdulqadir Muşekî ve hatiye nivîsandin. Ev berhem bi nûshayên fotokopiyê hatiye zêdekirin lê hê nehatiye çap kirin.

Tê de 268 beyt û 15 beş hene, bi tîpên Erebî hatiye nivîsandin. Nivîskar di navbera salên 1992 û 1995an de amedekirina mewlûda xwe temam dike. Transkrîpsiyona wê ya Latînî nehatiye kirin. Bi taybetî nivîskar nexwestiye ku mewlûda wî bê Latînîzekirin.

Navê wî yê fermî Abdulkadir Arslan e, di sala 1968an de tê dinyayê. Li gundê Muşekiyê bi ser Çewligê ye lewma jê re gotine Abdulqadir Muşekî. Perwerdeya xwe ya pêşî li gundê xwe dibîne. Piştî xwendina medreseyê îcazeta xwe distîne dest bi meletiyê dike. Niha li Çewligê peywira xwe ya meletiyê didomîne.

Mewlûda heftemîn ya Bîlal Feqî Çolig e. Nivîskar di sala 1971ê de li navçeya Gencê ya Çewligê tê dinyayê. Berhem bi navê Mewlîdê Peximbêr Qey Tutunê Zazon ji bo zarokên Zaza ji aliyê weşanxaneya Dîwan Kitêb ve hatiye çapkirin. Armanca mewlûdê ew bû ku zarokên Zaza bi zimanekî hêsan û zelal hînî mewlûdê bibin û bixwînin. Berhem jiyana pêxember dide nasandin û li ser pesnê jiyan û xebatên wî dike.

Mewlûda heyştemîn ya Mehmet Akîf Demîr e. Nivîskar di sala 1978an de li navçeya Hênê ya Diyarbekirê tê dinyayê. Berhem bi navê Mewlûda Zazakî ji aliyê weşanxaneya Banga Haq ve di sala 2017an de tê weşandin. Berhem 10 beş û 278 beytan pêk hatine.

Herî dawî dixwazim ji we re qala Siyerekî Zazakî bikim da ku di edebiyata Zazakî de bi tenê Siyerekî heye ew jî Siyerê Nebî yê Mela Cimayo Babij e. Çavkaniya herî sereke ya Siyeran Qurana Pîroz e. Hûn hemû jiyan, fikr û kirinên pêxêmber bi saya Siyeran dizanin.

Pêxember li ku hatiye dinê, ciwantiyeke çawa derbas kiriye, çawa bûye Pêxember, ji bo ol û mirovên dinyayê çi kirine, armanca wî çi bû, li ku û çawa miriye mijarên sereke yên Siyeran e.

Mela Cimayo Babij di sala 1946an de li navçeya Sêwregê ya Rihayê hatiye dinê. Navê wî yê fermî Osman Özusan e û ji eşîra Babij e. Perwerdeya xwe ya sereke û navîn li Sêwregê temam dike. Xwendina xwe ya lîsê ji derve temam dike. Piştî xwendinê dest bi meletiyê dike. Bi qasî pênc salan li navçeyên Sêwreg û Curnê Reşê meletiyê dike. Di demekê şûn de dev ji meletiyê berdide dibe memûrê tenduristiyê. Niha li bajarê Bursayê dijî. Zewicî ye û xweyî çar zarokan e, zimanên Erebî û Farsî dizane. Siyerê wî 23 beş û 906 beytan pêk hatine. Berhema 104 rûpelî di sala 2009an de ji aliyê weşanxaneya Nûbiharê ve hatiye çapkirin.

Di edebiyata Zazakî de heya niha heyşt heb mewlûd û siyerek hatine nivîsandin. Mewlûdên Zazakî jî wekî mewlûdên Erebî û Tirkî bi heman mijaran derketine pêşberî me. Îro li gorî do edebiyata Zazakî di gellek waran de pêş ketiye wek roman, çîrok, helbest gellek berhemên hêja hatine çapkirin. Zazayên me bi pirtûk, kovar, malper û weşanên xwe xizmetî civata xwe dikin.

Îro hûn bi kîjan Zaza re biaxivin gilîkar in. Dixwazin ku siyasetên kurd û medyayên kurdî di her warê jiyanê de bi qasî zaravayê kurmancî girîngî û cih bidin zaravayê zazakî. Îro Zazayên Bakur ji aliyê bikaranîna zimên ve bindestên vî welatî ne. Hêviya min ew e ku gilî û rexneyên Zazayan bên dîtin, ji bo çareserkirinê xebatên pêwîst bên kirin, bi her awayî bên destekkirin da ku Zazayên vî welatî xwe bindest û tenê nebînin.

ÇAVKANÎ:


1-Ahmedê Xasî'nin Hayatı ve Mewlid Adlı Eserinde Tema, İbrahim DAĞILMA, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak 2015, ss. 124-146
2- Ehmedê Xasî, Mewlidê Kirdî, Amadekar û Tadayîş Lezgin Roşan, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2013.
3-Mele Ehmedê Xasî, Mewlid, Tadayox W.K. Merdimin, Weşanên Hivda İletişim, İstanbul, 2008.
4- Murat Varol, Zazalarda Mevlid ve Siyer Geleneği, 2. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumu, Bingöl Üniversitesi Yayınları, s. 625-654
5- Murat Varol, Benateyê Mewlidê Mela Kamilê Pueği u Mela Mehamedê Muradoni Dı Yo Muqayese, Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi 2018 6(2) 287-291
6- Osman Efendi Babıj, (1933). Biyişa Pêxımberi, Şam: Weşanên Hawar.
7- Milla Cima Babij, (2009) Sîyerê Nebî, İstanbul: Weşanên Nûbihar.
8-Bîlal-Feqî Çolîg, (2012) Mewlîdê Peximbêr Qey Tutonê Zazon, İstanbul: Weşanên Diwan.
9- Akgündüz, Murat Osmanlı Dönemi Urfa Medreseleri ve Tedrisat Hayatı, İslâm Tarihi ve Medeniyetinde Şanlıurfa: "Osmanlı Belge ve Kaynaklarında Urfa", 2018, cilt: III, s. 12-18
10- Ahmed-i Hasi Mevlîd, Dr. Osman Özer, Bingöl Üviversitesi Yayınları, 2016.
11- Ercan ÇAĞLAYAN, "Osmanlı Belgelerinde Zazalar ve Zazaca Üzerine Notlar", I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011), Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2011, s. 271-290.
12- Mola Mehemedê Muradan (2003) Mewlidî Zazakî, Vate, İstanbul, Weşanên Payîz.
13- Molla Kamil Puexi (2003) Mewlidi Nebi, İstanbul.
14- Molla Mehemed Elî Hûnî (2004) Mewlid, Weşanên Vate, İstanbul.
15- Molla Muhammed Kavarî (2005) Mevlûdî Zazaki, İstanbul.
16- Mela Kamilê Puexî (2003) Mewlidî Nebî, Vate, Hûmare: 19, Zimistan, Wisar.
17-Hasibe, MAZIOĞLU, "Türk Edebiyatı'nda Mevlid Yazan Şairler", Türkoloji Dergisi, C.IV, S.1, 1974, s.31-62
18- Ahmet Kırkan, Mewlîdê Osman Efendîyo Babijî, The Zaza People: History, Language, Culture, Identity, 28-30 October, 2011, Yerevan.
19- Murad Canşad, Mela Mehemedê Muradan, Nûbîhar, Sayı 118, İstanbul.
20- Mehmet Uzun, Mela Mehmed Elî Hunî û Edebiyato Kirdkî (Zazaki), Vate, Hûmare:18, Hamnan, Payîz 2002.
21- Semra Alyılmaz, Mevlid ve Türk Edebiyatı'nda Mevlid Türü, Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Sayı 13.
22- Mustafa Fayda, "Siyer ve Megâzî", Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, (Ankara: TDV Yayınları, 2009), 37: 319.
23- Îbrahim Dağılma, Mehmet Akif Demir û Mewlûda Zazakî, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:4, Cilt:4, Sayı:7, 2018.
24- Mehmed Malmîsanij, "Nimûney Edebiyatê Dimilkiyê Klasîk û Dînî" Hêvî, H. 4, Îlon, Parîs, 1985.
25- Mehmet Yergin, "Zazakî de Metnê Dînî", Nûbihar, h. 119, Îstanbul, 2012.
26-dogruhaber.com.tr/haber/266816-bingolde-zaza-edebiyatinda-mevlidin-yeri-paneli/
27- rudaw.net/turkish/culture/02052016



# RÛBAR ELÎ

## RAPERÎN

Îşev qetla min helal e
Li ser bircên Amedê
Di bin çend stêrkên welêt de
Min bi serserkî berdin xwarê
Bila stûyê min ji nermiya hewayê bişkê
Ne ji hişkiya erdê
Îşev qetla min helal e
Kevirekî bi piyê min ve girêdin
Û min berdin bin behra Wanê
Bila goştê min bibe zirav
Ji kefalên rengesmer re
Îşev qetla min helal e
Herdu çavên min birêjin
Û bikin du şînok
Yekî bi deriyê me ve kin
Yê dî bi sîngê zarokên Şengalê ve
Ger hebe daxwaziya min ya dawî
Ji bo Xwedê û hemî pêxemberan
Çend stêrkan biguvêşin
Ji asîmanê welatê min
Û li ser sîngên helepçê
Binuqutînin lêvê min.

# Lokman Polat

## WÊJE, DÎROK Û ROMANÊN DÎROKÎ



Gelek çîrokên antîk, folklorîk yên gelêrî hene ku dikare bibe roman. Edebiyata kurdî di hêla romanên ku ji ber bûyerên dîrokî hatine afirandin qels e. Di dîroka kurdan de wisa bûyerên girîng pêk hatine ku, her bûyerek bi serê xwe dikare bibe roman.

Serkêş û damezrevanê romana kurdî a yekem romannivîserê kurd ê Kafkasya'yê Erebê Şemo ye. Romana modern –nûjen- ya kurdî bi berhemên wî dest pê kiriye û li Swêdê bi Mehmed Uzun, Hesenê Metê, Lokman Polat, Firat Cewerî, Laleş Qaso, Silêman Demîr, Bubê Eser, Mistefa Aydogan, Enwer Karahan, Mihemed Dehsiwar, Kamran Simo Hedêlî, Mezher Bozan, û hwd hatiye domandin. (Li welat jî /mebest bakkurê Kurdistanê ye/ di hêla afirandina romanên kurdî de hinek nivîskarên kurd romanên dîrokî nivîsîne û weşandine. Navê hemûyan nayê bîra min lê wek mînak; Îlhamî Sîdar, Osman Ozçelîk, Fevzî Bîlge, Rênas Jiyan, Fêrgîn Melîk Aykoç, Mihemed Saîd Temel, Fevzî Bîlge û hwd. ) Di hêla nivîsîna romanên dîrokî de jî Ereb Şemo serî kişandiye.

Romana wî ya bi navê "Dimdim" li ser bûyereke dîrokî, anku li ser berxwedana serdarê kurd, Xanê Çengzêrîn ê qumandarê kela Dimdimê ku li hemberê farisan pêk hatibû, hatiye nivîsîn. Romana Ereb Şemo "Dimdim" romaneke gelek baş e, hêja ye. Ev roman li Tirkî jî hatiye wergerandin. Romana Ereb Şemo ya bi navê "Şivanê Kurd" romana bi kurdî ya yekem e ku li bakurê Kurdistanê ji aliyê weşanên "Ozgurluk Yolu – Riya Azadî" ve hatiye weşandin û belavkirin.

Çend romanên Mehmet Uzun jî ji ber bûyerên dîrokî hatine nivîsîn. Romanên wî yên biyografîk û bûyerên ku di wan romanan de hatine qalkirin, dîmeneke ji dîroka kurdan ya nêzîk radixe ber çavên xwendevanên kurd. Romana min a navê "Fîlozof – Katibê Şêx Saîd" jî ji ber bûyera serîhildana Şêx Seîdê nemir hatiye nivîsîn.

Kurteromana min a bi navê ”Nûrheyata Licî” bi tevahî kurteromaneke dîrokî û mîtolojîk e ku bi xeyalî, lêbelê bi şêweya kurteromanê hatiye afirandin. Hinek xwendevanên ku ji edebiyatê fêm nakin, berhemên edebî û pirtûkên dîrokî têkilhev dikin. Divê ew bizanibin ku; edebiyat dîrok nîn e û berhemên edebî pirtûkên dîrokî nîn in. Malzemeyê dîrokzan (yan jî dîroknas – zimanzanên kurd(!) hêj biryar nedane ku ew ji ”tarîxçî”yan re bibêjin dîrokzan yan dîroknas.) belgeyên rastîn û şîroveyên îlmî, zanîstî ne. Yê romannivîser fiction, xeyal, îmge, kurgu, tevn û taswîr in. Herçiqas romannivîser carna belgeyên dîrokî bi kar bînin, yan jî ji wan feyde, sûd bigre jî, ew dikare li gor keyfa dilê xwe, li gor mentalîteya xwe wan bi kar bîne û bi şêweyeke din taswîr bike û şikleke xeyalî bi cureyeke din bide pê. Binêrin, li gorê dîrokzanan Kleopatra jineka reş, nerind herweha xirab, poza wê xwar e. Bejna wê kin e, zikmeşk e, anku qet rind nîn e. lêbelê romannivîser dikare Kleopatra’yê pir bedew û xweşik bide nîşandan, bi taswîra edebî û xeyalî wê rind û spehî bike û weke jineka bedew bide rave kirin. Romannivîser li gor zewqa xwe dikare her tişt bi xeyalî biafrîne, lê dîrokzan nikare weha bike. Lewre jî, divê pirtûkên dîrokzanan li gor rastiya dîrokî û romanên romannivîser li gor hunera edebî bêne şîrovekirin.

Romanên Dîrokî

Niha hem li dinê û hem jî li Tirkiyê gelek romanên ku li ser bûyerên dîrokî û li ser şexsiyetên dîrokî hatine nivîsîn gelek têne weşandin û pir jî têne firotinê.

Romana li ser Fîravûnên Misrî, ya li ser Keleopatra, romana Îskenderê Mezin, ya Hanîbal, romanên li ser Omer Hayam û Hesen Sebah, întreseya xwendevanan dikşîne û gelek têne xwendin. Gelek nivîskarên biyanî û yên Tirk li ser Padîşah û Xanim Sultanên Osmanîyan gelek roman nivîsîne û ev romanên wan di seriya lîsteya firotina pirtûkan de cihên xwe girtine.
Roman û dîrok bi hevdu ve eleqederin, bi hev ve girêdayîne. Romanek dema bê weşandin, ew roman dixwazî li ser dîrokê û dixwazî li ser bûyerên rojane ya dema nû be, piştê demeke dûr û dirêj -yanê nabeynê de dem û dewran bibûre- ew roman jî dibe berhemek, belgeyek anku pirtûkeke dîrokî. Dema ku roman tê weşandin, şahîdê dema xwe ye, lê piştê demeke ew jî dibe dîrok.
Romana dîrokî di sedsala 19’an de bi romannivîs Walter Scott dest pê kiriye. Berhemên W. Scott, Balzac, Tolstoy, Pûşkîn, Dostoyevskî berhemên klasîk yên dîrokî ne. Di van berheman de kes û bûyer li gorê rastiya dîrokî hatine afirandin, lê gelek xeyal jî lê hatine zêdekirin. Berhemên Aleksander Dumas li ser bingeha macerayên dîrokî, wek çîrokên serpêhatinê, lê bi teknîk û forma romanê hatine nivîsîn.

Hinek romanên dîrokî jî li ser serpêhatiyên şexsiyetên dîrokî hatine afirandin. Her wekî romanên ku li ser Hz. Alî, Tîmûrleng, Raspûtîn, Kleopatra, Îskenderê Mezin, Hanîbal, Ramses, Hz. Musa û yd, hatine afirandin. (Di vir de hêjayê gotinê ye, ku şaristaniya Misêrê ya kevin gellek hikarî li mejiyê romannivîsan kiriye.

Hinek roman jî hene ku ji vê cureya romanê re dibêjin romanên dîrokî yên fantaziyê, yan jî romanên fantaziyên dîrokî. Romana Catherîne Hermany “Wezîrê şevê” , ya Mîka Woltarî “Evîndarên Bîzansê” , ya Umberto Eco “Navê Gulê” û hinek romanên Necîb Mehfoz û Amîn Maalouf di vê kategoriyê de ne. Di van romanan de dîrok û fantazî têkilhev dibe. Bûyerên ku di van berheman de têne qalkirin bûyerên dîrokî ne û bi fantaziyan hatine xemlandin.

Dîrok di esasê xwe de şîrovekirin e. Li ser bûyereke dîrokî şîroveyên curbecur têne kirin. Li ser şexsiyetekî dîrokî gelek şîroveyên ji hev cuda têne kirin. Li ser jiyan û têkoşîna Hasan Sabah çar romanên cuda hatine nivîsîn. Li ser Harûnê Reşîd bi dehan çîrok û roman hatine afirandin. Di hinek romanên dîrokî de eynê wek vaqîanuseran bûyerên wan demên dîrokî, bi zimanekî çîrokî tên qalkirin. Di gelek romanan de jî hawayê mîstîk û bi şêweyên metafîzîk bûyerên demên dîrokî têne afirandin. Helbet armanca romannivîserên ku romanên dîrokî dinivîsîn, bûyerên dîrokî ronahî bikin nîn e. Ew bûyerên dîrokî li gorê haceta estetîkî li hevudu dihonin. Tiştên ku însanan eleqeder dike di nav dekora dîrokî de qal dikin. Dekor dekoreke dewlemende û di nav vê dekorê de mirin, jiyan, evîn, tenêtî, hestên şehwetê, vijdan, dirustî, durûtî û herweha gelek tiştên ku însanan eleqeder dike hene.

Di hemû romanên dîrokî de sazkirinên hunerî û edebî hene. Di bin ronahiya bûyerên çûyîn de ji ceribandin û tecrûbeyên çûyîn ders derxistin heye.

Romannivîsên romanên dîrokî bûyerên çûyî li gor dema nû dinirxînin, lê îskeleta berhema xwe li gor demên dîrokî saz dikin. Di sedsala 19’an de nivîskar Walter Scott bi nivîsa romanên dîrokî, rê vekir û gelek nivîskarên cîhanê li ser vê rê û şopê meşiyan û wan jî bi sedan romanên dîrokî nivîsandin. Hinek nivîskar di vê hêlê de bi serketin û berhemên pir bi qîmet yên giranbiha nivîsandin. George Lukacs dibêje “Serketina romanên dîrokî ev e ku, ew gihaştin radeya destanan.”

Di van demên dawîn de hinek nivîskarên Post-modernîst jî dest pê kirin û romanên dîrokî nivîsandin. Wan berhemên xwe bi şêweyeke nû, bi terzek nû nivîsîn û bi îmajan berhemên xwe xemilandin.

Romana Dîrokî û Hîcîv

Ez ji xwendina romanên dîrokî gelek hez dikim. Her dema ku romaneke dîrokî derdikeve, dikirim û dixwînim. Di salên 1970’yî de rojnameyên rojane yên Tirkiyê romanan wek tefrîka her roj diweşandin. Di wan salan de du romanên balkêş ku xwendina wan gelek xweşa min çû û ji bo wê jî min her roj rojnameya rojane dikiriyan û dixwendin.

Yek jê romana “Rasputîn” bû. Di wê romanê de têkilî û entrîkayên saraya kralê Rusan (Urisan), (peyva kral bi tirkî nîne, bi rusî ye) dihat behskirin. Ya din jî romana bi navê “Kleopatra” bû. Kleopatra jî kralîçeya Misrê bû. Ji nesla Fîravûnan dihat. Di şerê navbera Misrê û împaratoriya Roma’yê de, Misir têk çûbû. Împaratoriya Roma û împaratorê wan Sezar bi ser ketibû.

Di nav Sezar û Kleopatra'yê de hîsên evînî dest pê kiribû. Sezar bi Kleopatra re zewicî bû û jê kurik çêbûbû. Piştê ku Sezar tê kuştin, Kleopatra û generalê ordiya Roma'yê Markos dibin evîndarên hev, ji hevdu hez dikin.
Piştê kuştina Sezar, di şûna wî de Ostavîoz dibe serdarê împaratoriya Roma'yê. Kleopatra û general Markos desthilatdariya împaratorê nû Ostavîoz qebûl nakin û li dijê împarator Ostavîoz şer dikin, lê bi ser nakevin.
Împaratorê Roma'yê yê piştê Sezar, temamê Misrê dagir dike û dixwaze Kleopatra'yê esîr bigre. Kleopatra ji bo ku esîr (destegîr) -dîl-nekeve destê leşkerên Romê, marê bi jehr berdide laşê xwe û xwe dikuje.
Piştê van herdu romanan, di nav pêvajoya jiyanê de min gelek romanên din yên dîrokî (ji romanên dîrokî qesta min romanên ku li ser bûyerên dîrokî lê di dema me de hatine nivîsîn) xwend. Herî dawî min romana li ser Omer Hayyam û romana jiyan û têkoşîna bawermendê sofîstan, Helacê Mansur xwend.
Du qategoriyên romanên dîrokî hene. Yek jê; roman li ser bûyerên rasteqînî yên dîrokî û şexsiyetên dîrokî hatine hunandin. Ya din jî; li ser bûyer û kesên mîtolojîk hatine nivîsîn. (Her wekî romana Gilgameş û Enkîdo.) Di romanên mîtolojîk yên dîrokî de, ew bûyer di dîrokê de bi rastî çêbûye yan nebûye û ew kes, ew leheng bi rastî hebûye yan tunebûye kes nizane. Qalkirina wan bûyer û lehengên mîtolojîk bi xeyalî hatine afirandin. Roman û çîrokên ku behsa lehengê Yunanî Herkul û lehengê kurdan Mîrze Mihemed dikin, hemû jî xeyalî ne.

Kesek nizane ku bi rastî jî Herkul û Mîrze Mihemed hebune yan na. Çîrokên gelêrî yên ku di nav kurdan de li ser Mîrze Mihemed têne gotin wek çîrokên hezar û yek şevî ne. Hemû jî xeyalî ne.
Di van çend salên dawîn de romannivîsên Ewropî metodek nû dane ber xwe. Nivîskarên romannivîs yên Ewropî destanên mîtolojîk ji nûh ve wek roman dinivîsin. Em bibêjin Homeros destana Îlyada nivîsiye, romannivîsekî niha vê destanê wek roman ji nû ve nivîsiye û weşandiye. Gelek bûyer û destanên mîtolojîk wek roman hatine nivîsîn. Her wekî destana Gilgameş û Enkîdo, şerê Toroya'yê û hwd bi şêweya romanê hatine afirandin. Li ser Fîravun'ên Misrê, li ser Hz. Musa, Hz. Îsa, Hz. Muhammed, Hz. Alî, Hz. Suleyman û serdarê kokkurd Siltan Selhadînê Eyubî, damezrevanê hêza fedaîyan Hasan Sabah, Siltanên Osmanî'yan, çarên Rus'an û lehengên bi nav û deng yên dîrokî, herwekî Robîn Hod, Willhelm Tell û Rustemê Zal, roman hatine nivîsîn.
Helbet romanên dîrokî, dîrok bi xwe nîn e. Lê di nav xwendevan û dîrokê de dikarin bibin pirek. Dîrok anku pirtûkên dîrokî yên îlmî-zanîstî pêvajoya civakan ya aborî, siyasî, çandî, civakî û psîkolojîkî dinirxînin, analîz dikin. Roman metnên edebî ne. Romanên dîrokî hinek aliyên civakî yê dîrokî radixe holê û bi hunerî hîtabê hestên mirovan dike.
Romanên dîrokî ji îlmê dûrin, di wan de xeta û kêmanî gelek in û hêza manîpulasyonê zêde ye. Ev jî xwendevanan ber bi hîsiyatê ve dikşîne û li wan tesîr dike.

Nortrop Frye dibêje “Di gelek berhemên edebî de şêweyên komîk, romantîk, trajîk û îronîk hene. Di çîrokên gelek romanan de têkoşîna başî û xirabiyê tên qalkirin.” Îronîyên ku di romanan de hene gelek bala xwendevanan dikşîne. Di romana Don Kîşot da îronî heye. Puşkîn jî di “Çîroka Yevgenî Onegîn” de şêweya îroniyê bi kar anîye. Di romanên klasîk de tîp û fîgurên ku ji alî nivîskaran ve hatine xulqandin tîpên balkêş in û tîpên weha di nav civakê de tîpên nimune ne. Hinek lehengên romanan romantîk in, maceraperest in, hinek nihilîst in, hinek budala ne, hinek saxik in, hinek dîn in, hinek pir biaqil in, hinek bi îhtîras in. Hinek lehengên romanan hene ku bi karektera xwe tîpên navnetewî ne. Her wekî Hamlet û Don Kîşot. Hamlet ji ber fikrandinê nakeve hareketê, lê Don Kîşot qet nafikire û dikeve hareketê. Li vir du karekterên zidê hev derdikevin holê.

Di romana dîrokî Don Kîşot de hîcîv heye. Lê ev hîcîv, hîciveke basît nîn e. Di romanê de kurgu û teknîkek wisan hatiye pêk anîn ku bi afirandina tîpekî Don Kîşotvarî, ev roman hêjayiya xwe hetanî dema me berdewam kiriye.

Di gelek romanên dîrokî de mijara Hîcîvê heye. Hîcîv çiye? Hîcîv cureyek edebiyatê ye. Hîcîva gelêrî ya devkî heye û ya nivîskî heye. Hîcîv gelek kevn e, kevnbûna wê digihîşe dema Împaratoriya Roma’yê. Hîcîwa bi nivîskî cara pêşîn di Konstantîniyê de, di dema dewleta Bîzans de hatiye nivîsîn. Nivîskarên edebiyata Bîzansê Horatîus, Persîus û Juvenal wek cureyeke edebî Hîcîv nivîsîne. Westayê berhemên hîcîvî yên navûdeng Arîstophanes, Dante û Cervantes in.

Di Rusyayê de jî nivîskarên hîcîvvan yên sereke Puşkîn û Kantemîr e. Li Fransayê jî nivîskarên hîcîvvan xwestine hîcîva dema Bîzansê ji nûh ve jîndar bikin û di vê hêlê de gelek berhem nivîsîne. Serkêşiya Hîcîvvanên Fransayê jî Boîleau kişandiye.

Hîcîv bingeha xwe ji bûyerên civakî distîne. Nivîskarê Hîcîvvan li hember bûyerên civakî hêrsê xwe û xemgînîyên xwe bi metoda hîcîvê tîne zimên. Di berhemên hîcîvî de perwerdekirin jî heye. Bingeha hîcîvê li ser rexneyan ava dibe. Di gelek deman de nivîskarên hîcîvvan bune dengê civakê û li hemberê bêdadiyê, bêhizûriyê derketine. Di hîcîvê de hedef şexs in, kes in, sazuman in. Hîcîv jî wek komedya û parodî, dîrek hîtabê xelkê dike. Di edebiyatê de Hîcîv şêweya herî demokratîk e. Di nav civakê de berhemên hîcîvî berhemên herî populer in. Umberto Eco jî di romana xwe ya “Navê Gulê” de -ku romaneke dîrokî ye- Hîcîvê bi kar tîne. Berhemên edebî yên ku li gor şêweya Hîcîvê hatine afirandin di her demî de desthilatdarên sazumanperestan daye tirsandin.

Li Rusyayê nivîskarê Hîcîvvan Kantemîr di nivîsên xwe yê hîcîwî de reformên civakî parastiye. Rexne li kesên ku tinazên xwe li zanînê kirine, girtiye.

Rexne li kesên muhafazakar û ew kesên ku sazûmana kevnare diparastin digre. Têkiliyên edebiyata hîcîvî her tim bi jiyan ve, bi civakê ve hebûye. Nivîskarê navdar yê Rusî Puşkîn berhemek gelek balkêş nivîsiye û weşandiye ku ev berhema wî Hîcîv e.

Navê berhema wî “Ji sansurvanekî re nameya vekirî“ ye. Wî bi vê nivîsa xwe serî li hember sansurê rakiriye û li dijê qedexebûnê derketiye. Ji bo Hîcîvê Davîd Perkîns dibêje “Di nav hemû çîrokan de ew ya herî bi êş e. Bi êş e, lewra me dide kenînê.” Nivîskarekî bixwaze dikare bi rengê şanoyê, bi rengê helbestê yan jî bi rengê çîrok û romanê jî hîcîv binîvîse. Ew hendî di destê nivîskar de ye, çawan bixwaze dê weha binivîse.

Di berhemên edebî de nivîskar bi metoda hîcîvê li nakokiyên nav însanan bi çavekî henekî dinêre û rexneyan dike. Hîcîv beşekê edebiyatê ye. Di edebiyata kurdî de berhemên hîcîvî kêm in. Lê edebiyata kurdî ya devkî ji alî hîcîvê ve dewlemend e. Lê çi heyf ku, ji alî nivîskî ve ev dewlemendî xwe nîşan nade.
Di bingeha hîcîvêê de êriş heye, hîcîv bi rexneyê pêş dikeve, dewlemend dibe. Lê di hîcîva a Kurdî de êriş û rexne kêm heye.
Hîcîv, bi tinazbûnî li Cîhanê nêrîn e. Di nav gelek civakên Cîhanê de mesajên civakî yên herî balkêş bi riya hîcîvên siyasî têne dayîn. Lê, çi heyf di masmediya Kurdî de hîcîvên siyasî tune ye.
Di edebiyata Kurdî ya devkî de hîcîv ciheke girîng digire. Divê hîcîvên gelêrî bêne berhevkirin û weşandin.



# ŞOREŞGER KARAKOL

ÇAVÊN MELÛL




Di çavên melûlî de
Hêsir, bi firîna kevokek bask spî
Dihatin xwarê
Xeyalan, bi rondikan xwe dişûşt
Û dihefişîn rupelên evînê,
Bi qulfa Zîndanek zingar girtî.

Evîna min ...
Di şevek xemilandî da
li esîmanê bajarekî nenas de
Stêrka Mem u Zin ê
Di xefika bekoyan de diçilmisand
Û di beyaniyêk xemgîn de
Dû tîp ji dev hatin herikîn.
Yek bu evînek sêwî
Yek bu evînek bê dawî
Ez.. û ez
Ez bê te sêwî mam
Tu jî bo min, evînek bê dawî.



# Evîn Hesen

## Deyndar im

Min ji xwe re her rojek ji bo serdana te, kiriye ferzeke nimêjê, ferzeke jiyan û serdanê, ku di wê rojê de te nebînim, jiyana min tevlihev dibe, bê ser û ber dibim, nizam çi bikim, bi kê re biaxivim, bi kê re bikenim, bi kê re navê welatê xwe bibêjim.
Lê nabe rojek jî derbas bibe û te nebînim. Cizbiyek heye min ber bi te ve dikêşe, min ber bi bêhna te ve dikêşe, nizam ji ber çi. Lê ya dizanim, ku te nanasim û min caran te nedîtiye, tenê dizanim tu pakrewan î, azad î, serfiraz î, Kurdisatan î û şehîd î.

Dema li wan kêlên ku navên te li ser bi tîpên kurdî hatine neqişandin dinêrim, girûziyek û lerizînek dikeve canê min, girêk dikeve qirik û xurnaqa min, dikim nakim xwe jê rizgar bikinçare tune, hema pê re tayek dikeve canê min jî.

Ez bi carekê de disekinim, min got çi ye ev, çi bi serê min tê. Ma gelo ne zivistan e ku min serma girtibe, yan jî ne havîn e ku şewb xwe li min dabe. Lê piştre min zanî çi ye, taya azadî û rûmetê ye ku min ji wan pakrewanan girtiye. Min dema li wan kêlên bi tîpên kurdî ku navên şehîdan li ser hatine neqişandin nihêrî, taya azadî û berxwedanê kete canê min.

Li ser her kêleke ji goristanê gurzek kulîlkên kesk, sor û zer heye, gurza ku nîşaneya xwezabûn, paqijbûn û pakrewaniyê ye. Gurza kulîlkên biharê û bêhnkişandina bêhnên azayê ye. Çaxa di welatekî ku kesk, sor û zer hebe, ew welat qudsal e û nemir e. Lê em deyndarê te ne ey welato, ey pakrewano, ey azayo.....



# Memê Miksî

## KUR JI KIRINA XWE ŞERM DIKE

Li xortaniyê dema tê zewal
Mêrik dikeve ser darê kopal
Bi saya evî temenê mezin
Êdî li zelam dest dilerizin

Wextê xwarinê firaxa di dest
Te dît ji nişkê kete xwar şikest
Kur diket li ber firaxên malê
Hewl da çû çêkir wî ji bo kalê

Bi tevşiyê xwe kodikeke dar
Ji hingî pê ve di wê da dixwar
Midehek dirêj borî di ser ra
Rojekê mêrik ji kar vegera

Dêhna xwe didê çakûç û darik
Vayê di destê kurikê jarik
Mêrik jê kir pirs: Lawo te xêr e?
Ev çi çakûç e? Bibe veşêre

Kurik bersiv da: Bavo dixwazim
Kodikek çêkim wê bike lazim
Dê wext bê tu jî firaxên çînî
Wek bapîrê min bêhemd bişkînî

Hingav bo şîv û taştêyan şert e
Bi vê kodikê danime ber te
Mêrik şerm kir ji evî tefalî
Ew kodik avêt şkest bû du alî

Poşman bû gelek ku kir ev xeta
Rabû ji ewil zêdetir heta
Girt bo bavê xwe qedr û siyanet
Li bêrêziyê nebû xwedî qet.

# RÊBER HEBÛN

## GOTİNEK Dİ BÎRANÎNA HELBESTVANÊ NEMİR FERHAD IÇMO



Di dîrokê me de, gelek ronakbîr hizrên xwe kirin çira ,ji bo zanyariyê û evîna xak û maf , ji wan helbestvanê nemir Ferhad Içmo , û wekî her car , em nirxê saxa nagrin, û haja wan nabin , lê dema dimrin , em wan tînin ziman , û ev jî pirsekê bi xwe re tîne , gelo çima têkiliyên me tenê bi miryan re ye?!, û bi vî rengê em kêlek ji birînê xwe vedikin, ku bidin nasîn heta kîjan astî em wekî wêjevan û bîrnas ,dikarin têkiliyên xwe bi çand û kultorê xwe re , binyad bikin , û ev jî omîda ferhad bû û çi kesên yên bi awayî wî bar kirin bêdeng , ji cîhaneke bi qirecir…
di baweriya min de, ku helbestvanê resen zengilê jiyanê ye , di her serdemê de, ne daholê partî û desthilatdara ye , an rebenê kesayeta ye , ev tişt di hizr û giyanê ferhad Içmo de hatibû xuyakirin, wekê ku min di berhemên wî ya helbestî de hest kiribû, lewre xebatên wî ya wejeyî ,ket di rojeva pirs û lêgerînê , û bi vî awayî karibû di tora xwe de, nûnertiya perwer û dildarên kurdistanê bike, ll vir jî dibêje:



Heger jiyan bibe derya
evîna te bi min pêle
heger viyan bibe tembûr
evîna te li ser têle
heger bihar bin ax bibe
evîna te xaç û kêle

ê cudabûnek di Ferhad Içmû de heye ,di derbarê nêzikbûna wî ji mijarên rexnî de, di şêweya helbestê de, wekî min dît di helbesta ya bi navê, -bersiv- dema dibêje:
Rexnevanî ka çiye?
Were ji bo min bêje
bihayê gotarekê
ma bi peyvên qirêj e
bi dîtina diriste.
Neb zimanê dirêje.

Û bandoreke wî taybetmend hebû di warê mijarên netewî de, ji ber bi awayekî niyaz û tenik welat şêwe dikir dorî reftarên kilasîkî û gotarbêjî, wekî hatibû xuyan di helbesta ya bi navê – kurdistan- :
ji nav baxên te
di bin berfê de
ji bo rojeke nû
hêlîn sar hiştin
çend hezar care
tu bûye bûka qîr û Hawar.

Û bi dûmahîkê de em dibêjin , şopê afrênerên zanyar û ronakbîr ti cara em bernadin , ji ber helbestên zanyar Ferhad içmo bi dawî nebûne , û her ji me tê xwastin ku em karwanê helbestê berdewam bikin ji bo maf û bedewbûn û azadî.

# Can Birahîm

## ÇAVÊN ŞİL



Ez û xwe.. Bi tena xwe
Li wargeha xwe
Di xilmaşeke rêwî de
Bihna min diçike
Di taya mirinê de
An jî zeng a jiyanê de
Sermest im
Vedgevizim

Bayê zuha
Û peyva ked î
Li gel çavên şil
Di dilopek hêsir de
Avjeniyê dike
Her ku
Bîranînek rêwî
Dil bi hêwî dike

Mizgîniyek
Tagirtî û qufilî
Li derîyê bala min dide
Ta ku bûyereke rûken
Derîyê kilît veke
Û bi tîna êzingên
Ku sirûda mayinê
Bi şadî û şahî birêse.

Wêrekî pira
Derbasbûna min e
Wî alî
Da ku ez derkevim
Ji xwe
Dûrî zîvroka
Ku di qolincên demê de
Dikewkire

Ez û xwe.... Bi aramiya xwe
Li mîrgeha xwe
Û şanogerî li kolanên rût
Digere
Ji ber kula har
Û neçariya dergehên
Bê berdêl

Xwendina
Zimanê çavan
Tenê rastiya dil dibêje
Wergera tîpên
Deyîhev
Di dil de aşkere dike
Û çav dikenin jî
Ne tenê digrîn

Perî.. Li ser qûma
Peravên hêviyan
Bi ser xwe de
Mijûl dibe
Li benda pêlên
Rû bi ken
Da ku guliyên xwe
Bi tîrêjên rojê re bihûne


Di omîda hilata
Roka jîndar de
Û zayîna sira sibehê
Ya şermok
Bi dilekî ciwan û şemal
Ji nav lêvên
Payîza rû terikî



Sozdar im
Bi berbangeke
Sorînge kirî
Ji neksa sirûcê
Ta berya mêrdînê
Da ku xwe li hilma
Nanê sêlê
Û şûnwarê koçeriyê
Bipêçe

Şad dibim
Bi koçkirina
Karwanê ewrê tarî
Ji vir
Li gel mayîna
Asîmanekî sayî
Di rûbera çavan de
Û çav dikenin jî
Ne tenê digrîn.






# Îkram Oguz

## PÊNC PİRTÛK Û NİVÎSKAREK

Nivîskar Wezîrê Eşo, pirtûk jî Îtbarî, Tosinê Ûşan, Sîber, Qirme û Hosta Hovannes e…
Dîrok, bi rûyê xwe yê fermî çîroka serdestan e û di wê çîrokê da bindest jî, mirovahî jî cîh nagre.
Lêbelê rûyek wê yê din jî heye, ku ew jî çîroka rastîya jîyanê ye. Di wê dîrokê da êş û jan, xwîn û girî, komkujî û koçberî, ken û henek, şahî û serkeftî jî cîh digrin.
Lehengên wê dîrokê zêde û bênav in. Ew, dê û bav, xwîşk û bira, xal û xwarzî, ap û birazî ne.
Loma di zarê dengbêjan da, dibe stranên mêranî û mêrxasîyê û diherike…
Di vegotina çîrokvanan da, dibe destanên li ser evîn û evîndarîya keç û xortan…
Di nav rûpelên defterênhelbstvan û nivîskaran da dixemile, dibe helbest û roman.
Dîrokzanbi çavên xwe,li rût û tazîbûna bûyerên di dîrokê da qewimîne, dinihêre, wêjêkar rûyê neynûkê dide dîrokê ûêş û jan a dîrokê, bi evîn û evîndarîya lehengên wê va diteyîsîne.

Jiber ku, dîrokzan bi jimar û bûyerê ra, wêjekar bi xemla jîyanê ra mijûl e.
Ji wan kesên ku çîroka bav û kalên xwe, herwiha dîroka gelê xwe bi xemla jîyanê va nivîsîne, ji wan yek jî Wezîrê Eşo ye.
Loma, berî pênc pirtûkên wî, divê mirov berê Wezîrê Eşo nas bike, ku ew kî ye?
Nivîskar, lêkolîner û rewşenbîrê Kurd Wezîrê Eşo, di sala 1934 li Tiblîsa paytextê Gurcîstanê hatîye dinê. Bav û kalên wî di destpêka sedsala 20an da ji Zêdkakoçber bûne, ku Zêdka nuha bi navê Eleşgirtê navçeyek girêdayî bajarê Agirîyê ye…
Di sala 1953an da li paytextê Êrmenîstanê li Zanîngeha Erîvanê dest bi xwendina fakulteya dîrokê dike. Di navbera salên 1958-61ê da wek rêvebirê dibistana Gundê Pampê dixebite. Di navbera salên 1961-63an da li bajarê St. Petersburgê li Enstîtûya Rojhilatzanîyê li ser dîroka Kurdistanê lêkolînê dike.
Ji sala 1964an heta sala 1983ê wek redaktör, di radyo, televizyon û çapemenîya Ermenîstanê da dixebite. Di navbera salên 1983-94an da jî karê redaktorî û wergerîyê di Radyoya Êrîvanê da tîne cîh. Bi hezaran gotarên wî di rojnameya Rîya Teze û di rojname û kovarên Ermenîstan û Rusyayê da hatine weşandin.

Di sala 1991î da bi xelata Yekitîya Nivîskarên Ermenî û Seksîyona nivîskarên Kurd ya bi navê Erebê Şemo tê xelatkirin.
Piştî hilweşandina Sowyetê Wezîrê Eşo jî mîna bavê kalen xwe, ji cîh û warên ku lê mezin bûye, koçber dibe. Di roja 23ê Berfanbar a 2015an da li welatek xerîb, li bajarê Brûkselê koça xwe ya dawîyê dike.

Pirtûka Yekemîn: Îtbarî

Mijara pirtûkê koçberî ye, çîroka koçberîya Kurdên Êzdî yên li Gurcîstan û Ermenîstanê. Dem, destpêka sedsala 20an e. Du dewletên mezin, Osmanî û Rûs di nav şerek demdirêj da ne û qada şer jî Kurdistan e. Gor encama şer, gund û bajarên Kurdan bi caran dest diguherînin, ger dikevin bi desthilatîya Rûsan, ger dikevin bi desthilatîya Osmanîyan. Herdu dewlet şerê hev dikin, mixabin Kurd di nav xwînê da dimînin, tên kuştin û birîndar dibin. Ji bêçaretîyê,mal û milkê xwe li paş xwe dihêlin û ji warê bav û kalen xwe koçber dibin.
Nivîskar jî di vê pirtûkê da rabirdûya hemû Kurdên Êzdî yên ku di destpêka salên 1900î da ji gundên derdora Qersê revîyane û xwe avêtinê Ermenîstan û Gurcîstanê vedibêje.
Ji devê meta bavê xwe Meyane, çîroka koçberîya mala Hûtî Begê tîne ziman, ku Hûtî Beg kalikê nivîskar e. Meyane jî di dema koçberîyê da keçikeka piçûk e û bi malbata xwe ra dikeve serê rê û dirban. Rû bi rû tî û birçîbûnê dibe, zarokên ku di Ava Reş da dixeniqin, bi çavên serê xwe dibîne. Di derbarê wê demê da wuha dibêje:
„Welat çetin e, destê merîya jê nabe. Li ser axa me şer û pevçûn kêm nedibû. Em bêçare man û me xwe avêt serê çol û çîyan. Li pêşberî me Ava Reş rê li ber me digirt, li paş me jî Roma Reş berî me dida. Ava Reş jî mîna qedera me reş diherikî. Di derbasbûna ji avê da gelek zarok, jin û kalemêr di Ava Reş da xeniqîn û di rodaçûn."
Yên ku ji Roma Reş xilas dibin û ji Ava Reş derbas dibin, berê xwe davêjin bajarê Gumrî yê, ji wir jî derbasî Axbaranê dibin, ku wê demê li Axbaranê 12 gundên Êzdîyan hebûne û ew jî ji berê da hatine li wir bicîh bûne.
Malbata Hûtî begê jî li Axbarênê bicîh dibe û ji nû va dest bi jîyana xwe ya li koçberîyê dike. Di derbarê jîyana xwe ya nû da vebijerê çîrokê Meyane wuha dibêje;
„Koçber ne tenê welatên xwe, di dema koçberîyê da hemû tiştên xwe jî wenda dikin… Mîna Hûtî Begê bavê Eşo û sîwarê Têro…"

Pirtûka Duyemîn: Tosinê Ûşan

Mijara pirtûkê, di kesayetîya Tosinê Ûşan da nirxandina pergala kolxozîyê ye.
Lehengê romanê Tosinê Ûşan,mirovekî navsele, kesekî bêxwedî,gundîyekî bê mal û milk e. Jiyana Tosin û jina wî Zeynê bi şivantî û xizmetkarîya li gundên Kurdan yên li ser bajarê Rewanê derbas dibe. Êdî çi tê serê wan, ew û jina xwe Zeynê,rojek ji rojên germa havînê, di meha Hezîranê da radibin,berê xwe didin gundekî din û ji xwe ra li cîh û warek nû digerin.
Gund, gundê Kurdan e, Apê Ûsiv jî dewlemendê gund, xwedî kerîyên pez û dewar e. Dema ku Tosin û Zeynê tên nava gund û halê xwe ji gundîyaran vedibêjin, gunehê Apê Ûsiv bi Tosin û Zeynê tê û derê mala xwe ji wan ra vedike.Cil û nivîn, nan û av dide wan û wan di mereka xwe da bicîh dike. Tosin herçiqas Kurd be jî, kes nizane ji kûderê û ji kîjan êl û eşîrê ye. Jiber ku Tosin bixwe jî nizane ew kî ye. Tene dizane, ku nave bavê wî Ûşan, loma ji wî ra jî Tosinê Ûşangotine.
Hemû sermîyanê Tosin çoyê destê wî ye û ew bi saya Apê Ûsiv li gund bi cîh dibe.
Tosin dibeşivanêgund, jina wî Zeynê jî di nav malên gûndîyan da xulam û xizmetkarîyê dike.

Çend sal şunda, rojek ji bo damezrandina pergala kolxozîyê, ji bajarê Rewanê heyetek tê gund. Bi hatina heyetê ra pergala gund ser û binê hev dibe, rewşa gund û gundîyan ji binî va tê guhartin.
Heyet, berê bi gundîyan ra dicive, rewşa gundîyan gor sê xalan tasnîf dike.Gor wê tasnîfê Apê Ûsiv dewlemend, Tosinê Ûşan feqîr û xizan, gundîyên din jî di hale xwe da ne.
Heyet, gor pergal nû, Tosin wekî batrak (feqîr û xizan) binav dike û li hizûra gundîan jê ra dibêje: “Tu ji îro şûn vadi vî gundi daçav û guhên dewleta Sowyetê yî, ji ber ku dewleta Sowyetê dewleta karker û xebatkaran, dewleta feqîr û xizanan e…”
Pergala kolxozîyê li gund saz dibe, Tosin jî ji wê rojê şûn va ne tenê çav û guh, dibe hertiştê dewletê û serenca wî ya bi gundîyan ra dest pê dike.
Ji bilîçoyê Tosin, êdî sermîyanek wî yê din jî heye, ku ew jî, Heval Stalîn e…
Şev û roj, radibe û rûdinê, ji gundîyan ra pesnê Stalîn dide; “Bijî bavê me heval Stalîn…” dibêje û vê hevokê bi gundîyan dide gotin.
Rojek gundîyek ji Tosin ra dibêje; “ger ez jî yekî mîna te dîn bim, bi saya Stalîn bibimçav û guhên dewletê, sere min bilind bibe û li ezmanan bikeve, ezê wî bikim bav jî bira jî…”
Piştîdanînapergala kolxozê û bi fen û fûtên Tosin va, Apê Ûsiv ê ku ew di xanîyê xwe da bicîh û star lê kiribû, wek kulak tê tawanbarkirin û bi malbata xwe ra ji bo Sibirîyê tê sirgûnkirin.
Tosin jî di gund da dibe çav û guhê dewletê û bi qedera gundîyan ra dilîze. Ji kê biqahire, gilîyê wî dike û dide sirgûnkirine.
Tirs û xofa ji Tosin dikeve dilê gûndîyan ûsedem wê tirsê gundî ji jinên xwe jî dikevin şikê û li cem wan jî di derheqê Tosin da gotinek xirab nakin…
Gundî herçiqas ji pergala kolxozîyê razî nebin jî, ji tirsa Tosin û dewletê dengê xwe bilind nakin.
Tenê di nav xwe da, gilî û gazinên xwe dikin û ji hev ra dibêjin; “tenê maye ji me ra bibêjin, ka em çava herin nav cîh û nivînên xwe ûbi çi rengî bi jinên xwe ra razên…”
Nivîskar di vê pirtûkê da pergala, bi bûyerên jîyayî dinirxîne û nirxandina xwe jî bi qirf û henekên va dixemilîne.

Pirtûka Sêyem: Sîber

Mijara pirtûkê, jîyana civakî ya Kurdên Êzdî yên li Gurcîstan û Ermenîstanê ye.
Lehenga romanê qîzeka bedew û nazenîn,Sîber e.
Nivîskar, di kesayetî û kurtejîyana Sîberê da adet û tore, şîn û şahî, cil û berg û nêrînên Kurdan li ber çavan radixîne û bi tomarkirina di nav vê pirtûkê dawan ji wendabûnê diparêze…
Sîber qîzeka bedew û nîvbajarî ye.Zarokatîya wê li bajarê Tiblîsê û bi xwendina dibistanê derbas bûye. Rojek ji rojan rêya xortekî ji gundên nêzîk, bi gundê mala bavê Sîberê dikeve. Navê xort Temir, Temir jî xortekî perwerdekirî û di kolxoza gundê xwe da xebatkar e. Dema ku Sîberê dibîne, bi bedewîya wê ra heyr û hijmekar dimîne. Vedgere gund, ji dîya xwe ra qala Siberê dike û demek şunda jîbavê wi wekxwezgînîberê xwe dide mala bavê Sîberê. Bavê Sîberê mirovekî nîvbajêrî û zana, bavê Temir jî mirovek gundî, kevneperest û çavnebar e.
Bavê Temir, Xudo, herçiqas bibe xwezgînî jî, bêdil e û li dijberî zewaca Temir a bi Sîberê ra ye. Ew, sedem xwendin û nîvbajêrîya Sîbêrê, wê layiqî mala xwe nabîne. Jibo ku Temir û Sîber negihîjin mirazê xwe, çi ji destê wî were, dike.
Mixabin bi ser nakeveû gor nerazîbûna wî Temir û Sîber diziwecin û daweta wan tê kirin.
Edetê Kurdan e. Xinamîtîya Kurdan, bi hezkirin û kêfxweşîyek jî dest pê bike, heta roja dawetê bi qilûlikên kêm û zêde ya jî bi pirsgirêkên piçûk didome.

Piştî roja dawetê, dawî li hezkirin û kêfxweşîyê tê û nayartîyî dest pê dike.Ew neyartîya ku bi taybetî malbata zavê bi yekalî didomîne, heta bûk û zava ji mal cihê nebin, naqede…
Xido yê bavê Temirjî wusa dike. Piştî dawetê jînêrîna xwe naguherîna û pêsîra Sîberê bernade.Jibo ku Sîber, ji Temir veqete û vegere mala bavê xwe, hemû kar û barê malê bi Sîberê dide kirin. Şîrê ku Sîberê ji dîya xwe mijîyaye, di pozê wê da tîne. Bi der û cînarên xwe ra di derheqê bûka xwe da qilûlikan dike. Dema ku cînar pesnê bedewî û zanebûna Sîberê didin, wê gavê jî hêrs dibe û ji wan ra dibêje; „Bedewî û zanebûna wê ji min ra çi, ger ku nizanibe mîh û çêlekan ji min ra bidoşe…“
Sîber xirabîya ku ji xezûr û xwesîya xwe dibîne, roj bi roj dihele û ji jîyana xwe bêzar dibe. Mixabin ew jixwe zêdetir, dê bavê xwe difikire, jibo ku navê wan xirab neke, di ser wan da venagere. Lêbelê jîyan li ber çavên wê reş dibe, roj tê, ji bêçaretîya xwe, di nîvê şevekê da radibe, di kuncikê axur da weris davêje qirika xwe û xwe dixeniqîne. Bi mirina Siberê ra daxwaza Xido yê xezûr tê cîh, lêbelê mirazê bûk û zavayê dest bi hine di nîvî da dimîne…

Pirtûka Çaran: Qirme

Mijara vê pirtûkê, di destpêka avakirina pergala sosyalîzmê da, civaka Kurdên Êzdî ye.
Lehengê romanê xortekî Kurd, Tîtal e.
Tîtal mîna navê xwe xortekî bedew, xortekî perwerdekirî û zana, serokê komsomola gund, evîndarê sosyalîzmê ûheyr û hijmekarê Stalîn e. Şev û rojên wî bi kar û xebatê ji bo serkftina komsomolê derbas dibe. Bi zanebûn û serkeftîya xwe, di navçeyê da nav û dengê wî belav dibe. Ji bilî xebata ji bo serkeftina sosyalîzmê ne zewacê difikire, ne jî qîzên derdora xwe dibîne û li wan dinihêre.

Hevalên wî di dizewicin, dibin xwedi zar û zêç, lê gor der û cînaran Tîtal di malda mayî ye. Heta sedem wê yekê hinek di derbarê mêranîya wî da qilûlikan derdixin, ku ew qilûlik heta guhê wî jî tên.
Rojek bi çûyîna xwe ya Tiblîsê ra çavê Tîtal li qîzeka bajarî dikeve û pê ra jî jîyana wî tê guhartin. Navê keçikê Gezo ye. Bi dîtina yekamcar va xwîna Gezo û Tîtal li hev dikele. Bejn û bal û bedewîya Gezo hiş û aqilê Tîtal ji serê wî dibe û sermest dike. Gezo jî qasî bedewîya xwe keçikeka xwenda û zana ye. Tîtal bi alîkarîya dotmamek xwe Gezo nas dike û di hevdîtina xwe ya ewil da daxwaza zewacê lê dike. Bi erênîya Gezo ra,dê û bavê Tîtal dibin xwazgînîyê Gezo û wê ji Tîtal ra dixwazin û daweta wan dikin. Gezo ya li bajarê Tiblîsê mezin bûye û xwendîye, dibe bûka gund û di demeke kin da wek keçikeka di gund da mezin bibûye, hemû kar û barê gundîtîyê hîn dibe û dike. Qasî nav û dengê Tîtal, bedewî û jêhatîbûna Gezo jî di gund û herêmê da belav dide.
Dema ku gundî qala Gezo dikin, bi heyr û hijmekar pesnê wê didin û dibêjin; „Bukeka pê û par e, li bajêr mezin bûye, lê hemû karê gundîtîyê ji qîzên gundan baştir dike. Ev hemû huner û jêhatîbûna wê jî ji xwendina wê ye…"
Bedewîya Gezo û serkeftîya Tîtal a di xebata komsomolê da li navçeyê jî tê qisedan. Rojek Koçaryan ê serokê partî û saloxgerî ya navçeyê tê gund û di dawetekê da Gezo dibîne, bi dîtina wê ra matmayî dibe. Jibo ku Gezo ji nêzîk va bibîne û pê ra biaxife, Koçaryan destê Tîtal û Gezo digre, bi wan ra dikeve govendê û direqise.
Govend diqede, lê bedewî û bejn û bala Gezo ji ber çavê Koçaryan naçe. Loma Koçaryan ji wê rojê pê va, li wendakirina serê Tîtal digere.
Tîtalê ku ji bo serkeftina sosyalîzmê û Stalîn serê xwe dide, Koçaryan bi fen û fût,wî berê bi dijminatîya rejimê va tawanbar, dûra jî sirgûnî Sibîryayê dike.

Gezo ducanîye, piştî wendakirina Tîtal diwelide û lawek jê ra dibe. Ji bo bîranîna mêrê xwe, navê lawê xwe jî Tîtal lê dike.
Ji bo ku nêzikî Gezo be, Koçaryan wê ji bo serokatîya kolxoza gund pêşnîyar dike. Gezo dibe serokê kolxozê, lê Koçaryan nagihîje mirazê xwe. Gezo heta dawîya emrê xwe, wek jineka bî, li ser Titalê lawê xwe disekine û bi keda enîya xwe wî mezin dike…

Pirtûka Pêncan: Hosta Havannes


Mijara pirtûkê, çîroka li ser hevaltîya Ermenîyekî û Kurdekî Êzdî ye.
Kurd, bavê nivîskar Eşo yê Hûtî, Ermenî jî hosta û çêkerên dîwaran Hovannes e.
Eşo yê Hûtî Kurd û koçberek ji herêma Serhedê, Hosta Hovannes jî Ermenî û koçberek ji Ermenîyên Îranê ye. Eşoyê Hûtî li gundê Pampê, Hosta Hovvanes jî li Humamlîyê, ku nuha jê ra Spîtak dibêjin, bicîh bûye. Cara yekem ew di sala 1934an da hevdu nas dikin. Hosta Hovannes ji malbata Eşo ra du odeyên bi pencere çê dike, hevaltî û dostanîya wan jî ji wê demê va dest pê dike. Dem tê Eşo ji gund koçberî Tiblîsê dibe, xanî yê ku ji alî gundîyan va wek îstasyon tê binav kirin, jihev da terin û xirab dibin. Zarokên Eşo mezin dibin û dizevicin, dûra dixwazin ji xwe ra li gund havîngehan çê bikin. Ji bo vê yekê Eşo vedigere gund û dixwaze xanî, bi destê Hosta Hovannesê hevalî wî were çêkirin. Mixabin Hovannes êdî kale û ji zû va dest ji çêkirina xanîyan berda ye. Ji lawên Eşo yek Şîralî li Spîtakê doxtor e û Hovannes ji nêzîk va nas dike. Li dijberî daxwaza bavê xwe derdikeve û dibje, “ew nikare ji cîhê xwe ra be, lê ewê çawa kevirên giran ji erdê rake û pê dîwar çê bike…” Eşo, “ew birayê min e, daxwaza min naşkîne û ew ê were dîwarê mala min bi destê xwe çê bike…” dibêje û bersiva lawê xwe dide.

Di encamê da gotina Eşo rast derdikeve û Hosta Hovannes bi wê kaltîya xwe tê û xanîyê birayê xwe bi destê xwe çê dike…
Ji bo pirsa Şîralî yê ku lawê Eşo û doxtorê wî ye, bersivek wuha dide; “Şîralîyê min Eşo yê birayê min ji rêyeka dûr hatîye û daxwaza çêkirina xanî li min kirî ye, ez ê çawa wî bîşkînim û daxwaza wî di cîh da bihêlim…”
Nivîskar, bi hevaltîya bavê xwe û Hosta Hovannes rava dide ku, mirov bi kesên ji heft bavan dûr, heta bi kesên ji miletek cûda ra jî dikare bibe heval û bira, bes ku ji hev ra durust û dilsoz be…

Hevaltîya Eşo yê Hûtî û Hosta Hovannes jî hevaltîyek ji biratîyê jî nêzîtir bûye û dibe ku ji sedemên wê hevaltî û dostanîya ji dil, yek jî ev hevparîya wan, koçeberî, be.

Wek gotina dawîyê ez dikarim bibêjim, her sê roman û du novelên Wezîrê Eşo jî hêjayî xwendinê ne.
Jiber ku mirov di her pênc pirtûkan da jî, hemû xalên jîyana Kurdên Êzdî yên ku, li Gurcîstan û Ermenîstanê jîyane, li ber çavan radixîne. Ew jîyana ku bi koçberîyaji herêma Serhedê dest pê kirîye û di nav welatên Sowyetê û 70 sal di bin pergala sosaylîzmê da derbas bûye, piştî hilweşandina sosyalîzmê jî careke din rû bi rû koçberîyê maye, bi berfirehî dibîne…
Jiber ku zimanê nivîskar zelal û paqij, vegotina wî jî bi qalibên Kurdî xemilandî û herikbar e.

Loma, mirov ji dewlemendî û ahengîya ziman tahma xwendinê digre û bi lehengên pirtûkan ra dibe heval û hevpar. Bi êş û jana ku wan kişandîye ra xemgîn, bi serkeftinên wan ra jî dilşa û bextewar dibe…





# JÎ BAHOZÊ PÊVE JÎ YÊ KURD RE TUNE

## HELBEST: MEHMÛD DERWÎŞ
## WERGERANDİN: FEWAZ EBDÊ

bo Selîm Berekat

Yê kurd dema ez diçim serdana wî sibe bibîr tîne, bi melkesa tozê wê dûr dike:
Ji min bigere!
Çiya ew çiya ne. Û
vodka vedixwe, da xeyalê wî bêalî bimîne:
Ez im rêwingê di rêgeha xwe de, û qulingên jar birayên min î ehmeq in. Û siyê ji ser nasnama xwe dide alî:
Nasnama min zimanê min e. Ez.. û ez.
Ez zimanê xwe me.
Ez di zimanê xwe de surgûnkirî me. Û dilê min pizota yê Kurd de li ser çiyayên wiyî şîn.
/Nîqosiya mîn a her bajarekî din, di helbesta wî de piştguh kiriye.
Hemû alî li ser pisklêtekî hilgirtin, û got:
Dawî ez li kîjan alî rast bêm ezê li wir bi cih bibim.
Weha vala bûn bijart û xew kir. Û ji çaxê ko cin di gotinên wî de bi cih bûn, wî nema xewn dîtin.
(Peyvên wî masolkên wî ne, masolkên wî peyvên wî ne)
Yê xewnan dibînin doh pîroz dikin, yan dergevanên deryên zêrîn ên sibe bertîl dikin
Ne sibe ji min re heye û ne doh. Ev kêlîk meydana min î sipî ye./

Mala wî mîna çavê dîk paqij e.
Ji bîr kiriye mîna konê mîrekî, ko miletê wî weke perîkan belav bûne.
Sicadeke ji hirya xelek.
Ferhengeke perpitî.
Pirtûk in bi lez qapkirî
Balgeh in bi derziya qehweçîkî qenewîçkirî.
Kêr in bo serjêkirina balinde û berazan tûjkikî.
Vîdyo bo taziyên rêdayî.
Gurz in stirî himberî rewanbêjiyê.
Pencereke ji tiştxwestinê re vekirî.
Li vir Turk û Grîkan zixêf dikirin hev.
Ew bû lîstoka min û lîstoka serbazên li ser sînorên pêkenîneke reş şiyarmayî./
Ne rêwinge ev rêwing, Ne rêwingê çawa dibe bila bibe!
Bakur ew Başûre, Rojhilat di rewrewkê de Rojavaye. Û ti çente ji bahozê re tunene, û ne erk ji tozê re.
Nastirê, mîna ko bêrîkirina xwe ji xeynî xwe re veşartibe,
Dema siya wî derbasî dara Akasya dibe, ew nastirê, yan dema baraneke sivik porê wî şil dike, lê ew gazî gur dike ko jê re dakeve meydanê:
Were! Were kurê seh, were em li dahola vê şevê xînin da miriyan şiyar bikin.
Vane kurd nêzîkayê li rastiyê dikin, dûv re mîna perperîka helbestvanan têne şewitandin.
Zane çi ji wateyan dixwaze. Hemû boş in.
Peyv jî xapînokin, bê hode dijraberiyê bi nêçîrî dike davên xwe.
Peyvan ji keçkanî dixîne û dîsa wan keçîn li ferhenga xwe vedigerîne.
Hespên alfabêtê, mîna berxikan, ber bi xapîngeha xwe de dajo, û bersika ziman kurt dike:

Min tola xwe ji nediyariyê hilanî
Tiştê ko mijê bi birayên min kir, min jî ew kir, û min dilê xwe weke nêçîrekê biraşt.
Ezê ne weke dixwazim bim.. û
Ezê ji xakê hez bikim, ne bihtir û ne kêmtirî hezkirina min ji helsestê re.

Ji bahozê pêve ji yê Kurd re tune, di wî de bi cih dibe weke ko ew di wê de bi cih dibe, hûgirî wî dibe mîna ko ew hûgirî wê dibe, da ji saxletên xak û tiştan rizgar bibe./

Bang li nenasiyê dikir: Wa lawê min î azad!
Wa beranê labîranta sermedî!
Heger te bavê xwe bidarvekirî dît
Werîsê asîman ji hustê wî veneke
Bi pembuwê sirûda xwe ya şivankî wî kefen neke
Wî di gornê de veneşêre.
Di surgûna wî de bahoz ew e wesyeta
Yê kurd ji yê kurd re,
Lawê min!
Baz li hawîrdora min û te
Li Anadola fereh pir in.
Darbesta min nepenî ye, bi diziye,
De malwêraniyê bispêre çarenûsa wê, û
Asîmanê xweyî pêşî ber bi
ferhenga xweyî cadobaz ve bikşîne, û
ha ji geztina hêviya birîndar hebe,
ew hovekî efsaneyî ye. Û
tu niha.. Tu niha azad î, hey lawê xwe,
Tu ji bavê xwe û ji xezeba navan, azadî...
Bi ziman tu bi ser ket, te zora nasnameyê bir.
Min ji yê Kurd re got, bi ziman te tola xwe ji nediyarbûnê hilanî.
Wî got: Ez naçim beyabanê.
Min got: û ne ez.. û
Min li bahozê nêrî
Êvara te baş.
Êvara te baş!



# R. KEMAL BİNDAL

## BEG Lİ HELEBÊ
## FİRARA SEÎD BEGÊ BADÎLİ

Seîd Beg an Seîdê Kor, li Rûha serekeşîre Badîliyan bû. Dema ku Fransîyan Rûha dagir dikin bi 250 şervanên xwe ve şer dike. Ser we zeman derbas dibe dadgehên serxwebûnê de (İstiklal Mahkemeleri) te darizîn û dadgeh, qerarê berdarî dide. Seîd Beg dibin û heya dema darvekirinê dişînin girtîgehê. Seid Beg ji roja yekê de planên revê çêdike lê çawa?

Di girtîgehê de Seîd Beg nexweş dikeve û wî radikin nexweşxanê. Destê wî bi nivînê çerçoq dikin. Her du saetan carê du leşker tên û pêş odeya wî nobetê digrin.Çend roj şûn da du leşkerên Kurd têne nobetê. Ji wan yek silavê dide Seîd Beg :

Selamûn aleykûm,

Ve aleykûm selam,

Pîşti merhebayê Seîd Bed pirs dike:

Birazî Xwadê zane hûn kurmanc in ?

Erê apo.Navê min Mehemede.Ez ji Biracike,ji Çutlixê kurê Selhê Hoste me.

Seîd Beg şaş dibê :

Tu rast dibêjî :

Bi kelamî qedîm,

Wir da were. Were çavên te ramîsim.Bavê te birakê min e.

Seîd Beg her du çavên Mehemed maç dike û vedigere yê din :

Birazî,l ê tu?

Apo ez jî, ji Pirsûsê, ji Etmanekê,kurê Etmanî Etmên im. Û navê min jî Etman e.

Seîd Beg destê xwe li çokê xwe dixe.

Hele li karê Xwadê binêrin.Ezê bi sûce kî biçûk vir kevim û her du kurên birakên min were ser min. Law teres, ne bavê te ji birakê min e. Were çavên te jî ramîsim.

Seîd Beg çavên Etmên jî maç dike û û destê xwe yê kelepçekirî dirêj dike:

De vekin vekin. Vekin em herin navrojê xwe bixwin.

Etman û Mehemed li hev dinêrin fam nakin.

Apo çawa, dibê Etman.

Birazî, dibê Seîd Beg. Gava ku dema navreyê te leşker min dibin mal, em tew li wir navrojê xwe dixwin û em vedigerin.

Mehemed ji Etmên pirs dike :

Etman tu çi dibêjê ?

Ez ê çi bêjim Mehemed, dibê Etman. Te bi guhên xwe bihîst.Ew apê me ye. Madem leşkerên romî apê me dibine malê, em çima nebin?

Pir nafikirin. Çerçoqe ji destê Seid Beg vedikin û tew bi rê dikevin. Devê tifinga ber ve jêr dikin ku ev tê vê wateyê ku ne bûyerek e. Vê carê, gava ew têne sûkê, hemî esnaf derdikevin derve û ecêbmayî dimînin. Di nav hev de diaxifin :

Ew ne Seîd Beg e ?

Belê,

Ma îdam nedane wî?

Belê. Di vê yekê de karek heye lê çi ye ? Panzdeh bîst deqîqe şûn da ew digihîjin mala Seîd Beg.

Seîd Beg dibê, Birazî hûn derbasî odê bin, ez ji xaltiya we ra çend gotinan bikim û werim.

Mehemed û Etman derbasî odê dibin.Ode heya ber dêv tijî mirov e. Hemû ji ber du hevalan ra radibin û cih didin wan. Çawa rûdinin mirre te. Sê mirova di sê teyşt de danhêvirên bi goşt disitirandin. Tew li ser sifrê rûdinin. Ew çig bû, ew mirre, ew şire bû, dixwin û vedixwin, Mehemed vedigere Etmên :

Etman em rabin?

Lê, em rabin, dereng nemînin.

Mehemed ji odê derdikeve û ber wê hêle malê ve gazî dike :

Ley xaltiyê, xaltiyê, xaltiyê de bes e. Bila beg were em dereng man.

Vê care ji hêlê male dengê xaltê te :

Qûrbane te û beg bim. Beg li Helebê . Heleb ???

Lê anê ji dema ku îdam dane beg vir de em li bêndê vê rojê bûn.

Îdam ???

Erê qûrbana serî we bim.

Etman û Mehemed vedigerin artêşgehê. Bi gotinê Mehemed be her yekî sed çoyî lêdixin. Sê meh heps dikin û sê meh rojên wan jê dişevitînin. Gava ew vê bûyerê vedibêje, li gundê wî her kes henekên xwe bi Mehemed dike. Û Mehemed ji her care ji wan ra dibêje :

Bila be. Me ji jiyana Seîd Beg rizgar kir.





# XELÎL DUHOKÎ

## HEJARİNO !

Ey hejarên vî welatê
pirr dirrinde û çi gundek lê,
nemayî ava…
Sedan sal e û ta ku niha,
rojê b'dehan binax dibin,
j'pîr û genc û keç û sava.
Ne dijminên we d'rawestin,
ne hûn d'karin xwe rizgar kin,
j'tor û dava!
Hejarino
Koçerên bê wargeh û kon!
Vî dijminî deşt û zozan wêran
kirin,
dê kî v zaroka hajon!
Dawîya çerxê bîstê ye û heşta,
jin û dayikên we, ji axan ra,
nanî d'pêjin, cilka dişon!
Hêşta keda destên hewe,
derebeg û axa dixon!
Hejarino
Heta gengî, dê xanîya ava kin û
qet nagehin tê da rûnin!
Qurbaniya den û dê her
hejar mînin!
Rêkê b'bînin!
Şax û daxên welatê me,
b'hizir û bîrên,
rast û dirust bixemlînin.
Bawer bikin,
paşeroja geş bo we ye,
dê her bînin.
Dê her bînin.



# HESENÊ METÊ
## XEZEBA XWEDÊ

*Di rêya ser pirê re li pêş min bi awayê xwe dimeşiya: hêdî hêdî. Yekî bi salan ve çûbû û êdî bûbû salmezinekî kal. Salmezinekî ji lingê xwe î çepê kulek û ji herdu çavên xwe jî kwîr. Weke gopalê di dest de, pişta wî jî welê xûz bûbû ku meriv digot qey ji ber giraniya ewî kevneqapûtê reş î li milên wî pişta wî wusa xwar bûye.*

Pira ku rê di ser re dibuhurî, hinekî teng û kert û kort lê vebûbûn. Ez li hafizê pêş xwe û rewşa wî fikirîm û min di dilê xwe de şikirdarî li hebûna çavên xwe kir, min şikirdarî li hebûna lingên xwe kir û min ji bona wî bangî Xwedê kir.

Min bangî Xwedê kir ku Ew evê yekê bide xatirê nod û neh navên xwe ên pîroz, sebireke zêde bide evî rebenê li pêş min û li wî were rihmê. Û dema ez di ber salmezin î kal re derbas dibûm, min xwest ez pê bidime zanîn ka wî alîkariyek divê an ne. Loma min deng lê kir û gotê:

# BİZANE KU SERÊ EVÊ PİRÊ HİNEKÎ Bİ KERT Û KORTAL E, LOMA MİN Jİ CENABÊ TE PİRSÎ. XWEDÊ ALÎKARÊ TE BE Û BÊGUMAN XWEDÊ Bİ NÛRA XWE RÊ NÎŞANÎ HERKESÎ DİDE.

– Xwedê te ji nûra xwe kêm neke, ya hafizê delal, gelo te alîkarî divê ez te derbasî hêla din bikim?


Hafizê delal ji nişka ve çerx bû, bi wan çavên xwe yên ku nedidît li min û dengê min mêze kir, bi hêrs û bi narihetî got:

– Na!

Bi "na"yeke wusa qelew got ku kûçikan jî dizanîbû ew ji van gotinên min gelekî aciz bû. Lewra ku ew bi wî dengê qelew di ser kûçikekî de jî bihata, sond dixwim kûçik ê ji cîhê xwe bipengiziya û bireviya. Lê ez nereviyam û min li wan çavên wî yên weke du bîrên miçiqî mêze kir. Her yek ji wan kortalên çavên wî rasterast mistek xwê diketê. Ez gelekî ecêbmayî mam û min ti maneyek jî neda evê narihetiya wî. Ku erbabiya min û fahmkirina ji merivan hebûya, min ê rasterast bigota: ev yekî cirnexweş e. Di wê gavê de ez lê hizirîm û tirsek jî li min çêbû... tirsa min ew bû ku ev rewş û ev hafiziya wî arihandineke îlahî be ku Xwedê weke xezebê ji ber evê cirnexweşiyê li wî danîbe. Lê li gel vê "na"ya wî ya qelew jî min dîsa gotê:

– De baş e, ya hafizê delal. Ku te pêwîstî bi alîkariyekê tunebe jî... bizane ku serê evê pirê hinekî bi kert û kortal e, loma min ji cenabê te pirsî. Xwedê alîkarê te be û bêguman Xwedê bi nûra xwe rê nîşanî herkesî dide.

Bi van gotinên min re ew î kwîr serê gopalê xwe jî li erdê da û dîsa bi zirtînî got:




– Tu di rêya xwe de here, te çi ji min û rêyên bi kert û kortal e, te çi ji min û alîkariya Xwedayekî ye! Ma tu jî wekîlekî Xwedê yî?!...

Matmayîna min zêdetir bû û min gotê:

– Istaxfîrellah, ezbenî, ez ne wekîlekî Xwedê me lê çima tu welê xwe aciz dikî?

Wek kûçikê ku ji lingekî xwe î paşîn birîndar, wî jî lingê xwe î çepê li pey xwe kişand û bi niçeniç got:

– Di çêbûna xwe de ez welê me, ez kwîr im, lê ti rojekê jî Xwedayekî alîkariya min nekiriye, ma Ew ê bi van du gotinên te nûra xwe ji min kêm neke û rê nîşanî min bide, ma Ew bi xwe vê rewşa min nabîne!










Vê carê di dilê xwe de min “îstixfarek” got û ez têgêhîştim ku ev narihetiya wî ne ji min û gotinên min e. Rasterast qayîş bi Xwedê re dikêşa. Ez hinekî aram bûm, dilê min bêtir pê şewutî û her bi wê aramiya xwe min dîsa gotê:
– Baş e, ya hafizê delal, biçe bi a xwe bike... tu bi xwe here. Xwedê rê û ronahiyê bide ber te û bêguman Ew dide jî...

Ew î kwîr vê carê mîna ku gopalê xwe jî nîşan bide, hinekî ber bi dengê min bilind kir, dûre du caran serê gopêl li erdê da, av û kef bi devê xwe xist û got:
– Rê jî û ronahiyê jî ev gopal dide min, ev gopal rê û ronahiyê dide ber min. Xwedayê min ev gopalê ji darê hişk e... tu anuha li ber ketî!?

Û bi van gotinên xwe re di cîhê xwe de sekinî, çawa ku mîxekî zengarî di textekî hişk de naçe xwarê û xwar dibe... ew jî welê xwar sekinî û dipa. Xwedê dizane wî dipa ka ez ê çi bibêjimê, lê min bersiva wî neda. Tenê di hizra xwe de ez li bersivekê geriyam: aya Xwedê ji qudret û ji tehemûla însên zêdetir êş lê bar nekiriye?
Heta ku ez bi qasî sê werîsan jî jê bi dûr ketim, ew niçeniça wî ya ji aciziyê û ew teqeteqa serê ewî gopalê wî dihat min... gopalê ku li gor gotina wî, wek Xwedayekê rê û ronahî nîşanî wî dida.

*"Vê carê di dilê xwe de min “îstixfarek” got û ez têgêhîştim ku ev narihetiya wî ne ji min û gotinên min e. "*

# KEVOK MİZGÎN




## DENGEK JI BIYANIYÊ

Bi sehkirin a dengê wî ye ji bihîstokê
Dilê min bû bi heftrengoka kevan vedayî
Mijang bûn reş gulên avê lê danî
Qudûman govend girtin li ber ahenga
gupe-gupa dil.
Li zimanê min
Peyvan xwe girêdan bi heft werîsên bi
heçî.
Eger lêvên min bi liv bibûna
Min dê bi qêrîn ji çarmedorên xwe re
bigota
Hûn hûş bin
Bila perdeyên guhên min
Bi vî dengî bimînin neqişandî.






# CECO XAN SERKİRDEYÊ QEHRİMANÊ TEVGERA AZADÎXWAZİYA KURDÊN XURASANÊ

## KEYHAN MİHEMEDÎNİJAD

Şerê Çaldiranê ku bi şerê împitartoriya Osmaniyan û Sewewiyan tê nasîn, ew şere di sala 1514an de di navbera Osmaniyan û Sewewiyan qewimî.
Piştî wî şerî gelek alogor bi ser Kurdistanê de hatin û Kurdistan dibe bi du parçe bi ser Sewewiyan û Osmaniyan de.
Wê demê alogorek din jî ku pêkahat ev jî dûrxistina Kurdên bakurê Rojhilatê Kurdistanê bû ku di navbera salên 1598an û 1602`an de Şah Ebas destûrek da ku Kurdên vê deverê bo aliyê Xurasanê ve bêne dûrxistin.
Piştî împiratoriya Sewewiyan û hatina çendîn hikimdarên din di Îranê de û di encamê de hatina Qacaran boser desthilatê, wê demê dîsan wan dest avêtin bi serkutkirina Kurdan û nemaze Kurdên Xurasanê.
Lê malbatek jî hebû ku di Xurasanê de li dijî wan bisekîne û ev jî malbata Elahwirdî Begê bavê Ceco Xan bû. Ceco Xan Deregezî yek ji mezintirîn û netirstirîn Kurdê devera Xurasanê bû. Ev di gundê “Hisar” ê ser bi bajarê deregezê de hatiye dinê.

Bavê Ceco Xan ê bi navê Elahwirdî Beg dema ku wekî hakimê devera Miyankohê tê diyarîkirin, wê demê Ceco Xan jî digel bavê xwe diçine wê devrê û li gundê “Kebikan” û devera Miyankohê dimînin.
Ceco Xan kesek siyasetmedar, rewşenbîr û zana bû. Her lewma bavê Ceco Xan ew wekî piştevanê xwe dizanî û hertim bi wî re bû.Ceco Xan li kêleka bavê xwe wekî çiyayekê piştevanî ji desthilata wî dikir.
Dema ku bavê Ceco Xan diçe ser dilovaniya Xwedê, Ceco Xan cihê bavê xwe digre û dibe birêveberê wê deverê.
Ceco piştî mirina bavê xwe birêveberekî baş bû û xelkê wê deverê jê razî bûn. Ceco Xan dixwest tev deverên Xurasanê bixe bin desthilata xwe û Kurdan ji bin destê dagîrkeran rizgar bike. Her lewma desthilta Qaçaran li dijî vê biryara Ceco Xan bû û hertimî givaş dixiste ser xelkê devera Xurasanê. Rojek li rojan di devera Xurasanê de, dengê qîrîna zarokan û jinan û nalîneke kûr li wê deverê tê bihîstin, axîn û nalîn û qîrîna zarok û jinan di wan çiyayan de çend car deng dide, ew denge yê hawara hevkariyê ye, ew gazî Ceco dikin.
Ceco Xan bi bihîstina qîrînan, xwîna wî xirab dibe û xwe diavêje ser pişta hespê xwe û çend çekdaran jî digel xwe dibe. Dema ku Ceco ji dûr ve mêzeyê gundan dike, dokelek bilind dibe, kadîn û gidîşên ku xelkê bo ajelên xwe embar kiribûn tev dihatine şewitandin. Dema ku Ceco digîje wê deverê tenê gundên şewitî û qirkirinekê dibîne. Ev komkujî û wêrankariye dujminê hertimî yê gelê Kurd kiribû ew gundane ji aliyê leşkerê
Qajaran û Ûrisan ve hatibû şewitandin.
Ceco Xan nedikarî wê qirkirinê qebûl bike.
Ji aliyek din ve jî bi heman awayê Rûsan jî destdirêjî dikirine ser wan deveran û ew serkut dikirin, vê yekê dengvedanek zêde li pey xwe ve anîbû.

Dijayetiya Ceco bi dijî
Qajaran û Ûrisan roj bi rojê zêdetir dibû û xwe amade dikir bo vê ku li dijî serkutkariyê bisekîne û xelkê xwe li bin zilm û serkutê de rizgar bike.
Wî di demek kin de leşkerê xwe amade kir.
Wî digel sê birayên xwe, Îso Xan, Elo Xan û Memo Xan û hejmarek din ji şervanên qehriman serhildana xwe dest pêkir. Wî bi êrîşkirin li ser binkeyên dujmin di wê deverê de bi awayekî qehrimanane karî wê deverê heta Deregezê rizgar bike û sedan serbazê dujmin bikuje.
Bi wî awayî navê Ceco Xan bibû peyva ser zarê xelkê Deregez û gundên derdorê wî bajarî û xelkeke zêde tevlî leşkerên Ceco Xan bûn. Mensûrûl Mulk ku yek ji fermandê Qacaran bû û ji aliyê hêzên Ceco Xan ve hatibû derxistin, car din bi leşkereke çend hezar kesî ve êrîş kire ser desthilatdariya Ceco Xan, lê dîsan ew û hêzên wî ji aliyê hêzên Ceco Xan ve rastî şikestê hatin.
Ceco Xan desthiladariya xwe berfireh kir û heta Qoçanê xiste jêr desthilatdariya xwe, ev yeka bo hikûmeta navendî cihê qebûlkirinê nebû û daxwaza alîkariyê ji Ûrisan kir.
Ûrisan çend leşker û hêzên siwar bo alîkariya hêzên Qacaran şandin û wê carê, diba Ceco Xan hevdem digel hêzên Ûrisan û Qacaran şer bikiriba. Merema Ceco Xan rizgarkirina deverên Xurasanê di bin destê dujminan de bû û dixwast li wir hikûmetek serbixwe a Kurdî ava bike û nehêle Kurdên Xurasanê bêne serkutkirin. Hêzên Ûrisan û Qacaran çend caran êrîşê ser desthilatdariya Ceco Xan kirin, lê hertim ev rastî şikestan dihatin.
Ceco Xan bibû xewnek bo dujminan, Ûrisan bo binçavkirina Ceco Xan xelat diyarî kirin.
Hêzên Ceco Xan roj bi rojê bihêztir dibûn û hêzên partîzen û şervan di çiya û deşt, gund û bajarên devera Xurasanê de berbilav bibûn.




Xelkê wan deveran bi hebûna hêzên Ceco Xan razî bûn û roj bi rojê xortên nîştimanperwer tevlî hêzên Ceco dibûn ku bikarin berevaniyê ji ax û namûsa netewa xwe bikin. Ûrisan û Qacaran xwe bihêztir kirin û dîsan êrîşê ser hêzên Ceco Xan kirin.

Wê carê şerek mezin di deverên Deregezê de qewimî, şerek ku hin çavkanî dibêjin sê mehan pê çû.

Ceco Xanê qehriman ji bo ku bikare xelkê vê deverê jiyaneke xweş û azad hebin ya ku hewce ba dikir û li dijî dagîrkeran disekinî.

Di wî şerî de gelek hêzên Ceco Xan ji aliyê hêzên Ûris û Qacaran ve hatine kuştin û Ceco

Xan digel hêzên xwe kevtine dorpêça Ûrisan û ti rêyek nemabû ku xwe û xelkê xwe jê rizgar bike. Di encamê de û di nav şer de dema ku Ceco Xan di nav gundekî de mijûlê şer bû pêyê hespê wî dikeve nava qûbiya heriyê de û Ceco Xan bi gulleyê hêzên dagîrker ve tê şehîdkirin. Ceco Xan di sala 1911`an de ji aliyê hêzên Ûris û Qacaran ve hate şehîdkirin. Ûrisan cenazê Ceco Xan di Qoçanê de pir kirin ji berf û bûz û ber bi Moskoyê ve birin ku Tizarê Ûrisan wî serkirdeyê Kurd bibîne. Hin çavkanî jî dibêjin Tizarê Ûrisan serê Ceco Xan dibire û di kiloxê serê Ceco Xan de şerabê vedixwe.

Ceco Xan digel malbata xwe û xelkê Kurd ên devera Xurasanê, bi salan di nav sir û seqemê, baran û sir, deşt û neval û çiyayên Xurasanê de bi rijîndina xwîna hezaran xortên Kurd li hember dagîrkeran sekinîn û xebat kir.

Îro rojê jî navê wan navdaran di devera Xurasanê û Kurdistanê de hertimî li ser zarê Kurdan e û ti carî wî ji bîr nakin. Niha di Xurasanê de gelek awaz û stran û helbest li ser Ceco Xan û qehrimanetiya wî hatine afirandin.

# Newaf Mîro

## XİDİR EYLAZ Û XİDİR NEBÎ, XİZİR YAN VALENTÎN?

Li cem Êzdiyan li gorî salnameya kevn, heftiya yekemîn ji meha Sibatê, ango piştî 14ê heyvê li gorî salnameya mîladî, Êzîdî; duşemê,şêşem, çarşemê rojî digirin, helbet ne ferze ji bo hemû Êzîfiyan û roja pêncşemê dikin Eyd. Xwarinên îdê yê taybet jî, qawît yan poxîn e. Poxîn ji genimê qelandî û hêrandî çêdibe û dikin weke pelokê û dimsê berdin ser û dixwin. Hin mal jî şilik çêdikin. Roja cejnê divê mirov ranezê, guneh tê hesibandin.
Herweha nabe xwîn bê rijandin. Tenê qût û qawît, weke xêr û xwarins Eydê tê belavkirin. Roja înê roja Xidir Nebî ye. Xwarina wê rojê cûda bû, ji rojên berê. Ji bo xatirê Xocê Xizir, yan Xidir Eylaz divê Êzîdî ji mirovan re alîkar bin, mirovên xerîb tî û birçî ji ber deriyê mala xwe venegerîn in. Şeva Eydê qursikên şor û têr xwê çêdikin, Keç û Xortên bermiraz dixwin, kî avê bide wan di xewnê de, dibe miraza wan.
Ev Roj roja Baba Dewrêş, yan Qencê Xwedê, li cem gelek civakên Olî heye. Di serî de li cem Elewî û hemû Olên Yezdanî heye. Helbet Mesîhiyên cîranên me jî, ew roj pîroz dikirin. Navê Eylaz, Elyas, Îlyas, Îîas, dîroka Troyaniyan û dema şerê Troya weke yek ji berhemên herî kevn ya nivîskî ya sedsala 8 yan 7a beriya Îsa destnîşan dike. 24 çar berhem yan destan/stranên wî hene. Navê Îlîas bixwe li Yewnana antîk, dihat wateya; Troyanî.





Ew weke xefûrê rêya, alîkarê kesên şerpeze û hejar e. Her wiha ew Mirazbexş e. Xwebexşê qencî û xêrê ye. Weke me got, ji 14ê meha sibatê pêve bi salnameya mîladî, dibe Rojên Xidir/Xizir Eylaz, lê heman roj dibe roja evîndaran, yan roja Valentîn li cîhanê. Ew bi Keşe Valentînê xoşewît ve girêdidin, ku di dema Împaratoriya Roma de, bê destûra Qral mara evîndara birî bû.

Lewma jî di wê rojê de hatiye kuştin. Bo xatira wî ev roj kirine roja Valentîn. Valentîn jî Mirazbexş e, Xidir Eylaz jî mirazbexş e. Her du remzên qenciyê ne. Lê em dizanin gelek cejn di nava cîhanê de hene, ku mirov nikarin bi hûrgilî zelal bikin.
Gelek cejn, çîrok û nebatên berê li Mezopotamyayê bûn, ku Mezopotamya weke dergûşa şaristaniyê tê pênasekirin. Û wûsa bû. Medeniyet bi cot, cotkarî, ajalkedî kirin û avakirina bi şikefta destpêkiriye.

Ew çanda û miletana tim cîranê hev bûne û di nava hev de jiyane. Ji Mezopotamya Antîk, heta bi Yewnana Antîk û Romayê. Kurd, Yewnan, Ermen û miletên kevn yên Anatoliya hemû xwedî heman mîrasê ne.
Lewma ez dibêjim ew hemû cûre û nav her yek in. Xidir Eylaz, Xidir Nebî, Xocê Xizir, Xizir û Valentîn yek in. Eyd, Cejn,Roja evîndara û miraza û mirazbexşa li we pîroz be.



# ALİ BAYRAM


## MATEM A TÎK

Min û te li hev nekir
Çend qurîş kêmbûn nizanim
Ji hezkirina min
bazara
Hestên şikestî û beyhûde bû eşq
Li kû despêdikir
Li kû diqedîya
Êşek bê navber bû diyariya te
Tu zindî dihiştî
Qelenê qirkirina min.

Kezîkûrê!
Çavbeloqê!
Bi tenê bihûstek dî li ser bejna te ba
Min ji xwedê tiştek nedixwest
Eniya te meydan
Singê te zozan jî bûya xem nedikir.

Min û te li hev nekir
Te digot nirç û na!
Ber bi min ve nehatî gavekê
Te şa bikim bi ramûsanekê
Weke şair gotî
Em li hev nehatin
"Îdekê erefatekê."







# SORAN HEMEREŞ

## KURMANCÎKIRIN: MUHSÎN OZDEMÎR

## FEYLESOFÊ SEDEYÊ DUYEMÊ ZAYÎNÎ BERDEYSAN KÎ BÛ?

Di dema zaroktiyê de yek ji ew tiştên ku min li ser Kurd xwendî û gelek pê keyfxweş bibûm, gera Zeynefon(Ksenefon) a li Kurdistanê bû. Qet nebe bi rêya wê pirtûkê min hîs kir ku em wekî Kurd di quncikeke dîrokê de hebûn. Ji bo min tişteke mezin bû ku di wî temenî de bizanim ku hezaran sal berî niha r bavbapîrên me bi tîr û kevan şer kiribûn. Min dianî ber çavê xwe ku bi cilên çerm û porên dirêj, bi rim û tîr û kevan şer dikirin.

Her çiqasî xwendina wan zanyariyan di zaroktiyê de ez dilxweş kiribûm û hinekî birîna wendabûn û sêwîtiyaya min a çandî baş kiribû jî, lêbelê wan pirtûkan di hizra min de ruxsareke taybetî ya kurdan afirandibû. Bavbapîrên min wek cengawerên dirinde/hov dihatin ber çav û tişteke din wisa nebû ku karibe ruxsareke ji wê zêdetir di hizra min de biafirîne.

Di rastîyê de ew ruxsar tenê di aliyê min ê zarokî de çênebûbû, belkû bi giştî te ku te pirtûkên dîrokî yên li ser Kurdan bixwendaya, di piraniya wan pirtûkande dîsa ew dubare dibû. Lêbelê bi dirêjahiya temen re ku ketim nav kûrahiya dîrokê de, ji min re zelal bû ku ew ruxsar, di encama nehevnasîna me bi xwe re derketiye û ji min re diyar bû ku bê çiqasî me xwe di derbarê xwe de em şaş têgihiştine û xwe nas nakin.

Îro pirî caran di nav mezinahiya gencîne û dewlemendîya çand û dîrok Kurd de, ew heyama ku ji temenê min re maye, pêş min pir kurt xwe nîşan dide, min xemgîn dike. Xemên temenê min têra wê tiştê nake li ser wan hemû babetan binivîsim ku min dil heye li ser wan binivîsim û ew hemû gewher li wê derê bê xwedî bimînin. Ev çand ewqasî dewlemend e sedan kesên wek min bi şêweyekî berdewamî li ser binivîsin dîsa têrê nake. Di rastîyê de di wê erdemea ku Zeynefon(Ksenefon) li ser Kurdistanê re derbaz bibû de, gelê vê herêmê goftûgo li ser gerdûn, çarenivîs û manaya jiyanê dikirin. Ji ber wê pirî caran jiyana hin ji pîrmend û feylesofên rabirdû yên Kurdistanê, pencereyekî li ser dinyaya fîkrî ya bavbapîrên me ve dikin.

Yek ji wan zana û feylesofê cîhanî, navê wî Berdeysan bûye. Berdeysan nêzîkî hezar û nehsed sal berî niha li Kurdistanê jiyawe; di sala 154ê zayînî de jidê bûye û nêzî 222ê zayînî koça dawî kiriye. Ango nêzîkî çar sed sal berî hatina Erebekan, ev feylesof li Kurdistanê jiyaye. Nêrînên cuda hene li ser bingehê malbatî ya vî feylesofî. Hin kes dibêjin Eşkanî ye û hin jî dibêjin Aramî bûye. Sedemê vedigere ser wê tiştê ku Berdeysan hevşêweyê Manî peyamber bi zimanê Aramî nivîsandiye û di rabirdûyê de jî pirî caran her kesek ê navdeng bûyî itsine ser neteweyên serdest yan neteweyên xwedî xwedî wî zimanê kup ê nivîsandiye. Di wê serdemê de jî desthilatiya Eşkanîyan ji desthilatiya Kurdan mezintir bûye û zimanê aramî jî zimanê nivîsê yê piranî bûye, ji ber vê wek Eşkanî û Aramî hatiye nîşandan. Hin caran jî, ji ber ku pirtûk li ser dîroka Ermenya nivîsandiye, wek Ermenî hatiye nîşandan. Di rastîyê de bingeha regezî ya Berdeysanê feylesof jî wek a Manî Peyamber hatiye kirin.

Berdeysan piraniya jiyana xwe li bajarê Ûrfaya Bakurê Kurdistanê bihurandiye, lêbelê hin balkişandinin hene ku peywendîya wî bi herêma Germiyanê re jî hebe, ew peywendî jî zêdetir wek peywendîyekî fîkrî û çandî xwiya dibe bi bingehê malbatî re. Di metnê de ku ji aliyê neyarêkî yê bi navê Seyint Îfrîm), ku zêdetirî sed sal piştî mirina Berdesyan nivîsandiye, di devavêtina xwe ya li hember Berdeysan de dibêje : "hatiye tiştek ji zaravayê Germiyan (Bît Grmay) û zaraweyi Êdêsa (ûrfe) aniye...". Ango bi ronî bingehê fîkrî yê Berdesyan girê daye bi wan her du herêman ve.

Giran e îro sedî sed were zanîn ku ev feylesof bi ser çi regezî ye, di rastîyê de gelek sedmên xwe hene ku Kurd be, lêbelê ya ku qet guman têde nîne ew e ku Berdeysan xelkê Kurdistanê ye û piraniya jiyana xwe li wê derê bihurandiye, bandora fikr û çanda Kurdistana wê serdemê li ser çêbûye û wek feylesof û kesayetiyekî cîhanî, bandora wî li ser dewrubera wî hebûye.

Ev feylesof di maslbatekî dewlemend de mezin bûye û bi derfetê jî kariye xwendinekî baş bidest bixe, li cem camerekî olî yê xwecihî li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Munbicê ya nêzîkî Heleb xwendiye. Berdeysan mirovekî navîn bûye di fikir de, weke hin ji feylesofên din terkedinyayî nekiriye, zewiciye û zarokê wî jî hebûne. Ev feylesof, di destpêka belavbûna ola Krîstiyanî de jiyaye, lêbelê wek mirovekî resen ê herêmê, ola nû ku ola Krîstiyanî ye berga ol e, kevnariyên kurdistanê jiber kiriye û bi wî bergê nû qebûl kiriye raxistiye.

Vî kesayetiyî wek hevşêweyên gelek ji pîrmendên din ên Kurdistanê, ji ber ku di herêmê de jiyaye ku di navbera desthilatîya serekî ya wê serdema Eşkanî û Romê de bûye, ji ber vê ji aliyê bîr û nêrînên olî de bandora fikrî ya wan du çand û olên bingehîn ê kevnar ê herêmê li ser wî çêbûye, van jî di nihêrînên wî yên olî û feylesefa wî de rengê xwe vedane. Lîsteya li Jêrê Navê Hin Berhemê Wî Ne:

- Tarî Û Ronahî
- Siruşta Rohanîya Heq (Rastî)
- Tespît û Netespît
- Li ser Çarenivîsê
- Pirtûka Zagona Welatan

Ji bilî wan berhemên jorê, çendîn berhemê din jî hebûn. Mixabin piraniya berhemên wî wenda ne ji bilî hin perçeyên biçûk, ji aliyê xelkên piştî wî re behsa gelk berhem û mijarên ku nivîsîne hatine kirin. Berdeysan bi taybetî wek danerê yekem şîîra strana olî ya krîstiyanî tê hesbandin di dîrokê de. Em şî'rên olî, ku bi awazê ve hatine danîn û hejmara wan sed û pêncî şî'rên olî bûne, piştî sedan sal piştî wî hatine gotin.

Berdeysan ji felsefeya Yûnana kevnar sûd wergirtiye, lêbelê êrîş kiriye ser ser fîkrê feylesofên piştî Arîsto ‘di babeta qedera wî berê hatiye biryardan’ û herweha sûd ji dualîzim û zanista stêrknasiya Keldanî wergirtiye ji bo dariştina fikr û nihêrînên xwe, bi hûrgilî nêrîna xwe li ser xweda, çarenivîs, hêza tarîtî, .... diyar kiriye.

Piştî mirina wî, Berdesyan ji aliyê hin Krîstiyanan ve wek kesê ji ola krîstiyan derketî hatiye nîşandan. Seyint Îfrîm ku xelkê heman bajarê wî bi xwe bûye, bi dûdirêj mijarine dijî wî feylesofî û Manî peyamber nivîsiye û gelekî bi dijwarî êrîşê wan kiriye.

Her du, Berdesiyan û Manî peyamber, tew cudahiya navbera wan, bingeha fikrê wan vedigere ser yek koka fikrî ya Kurdistanê û hevşêweya fîkrî di nav bera wan dixwiyê.

Îro bi sedan lêkolînên akademîkî li rojavayê li ser bîr û bawerî û fîkra vî feylesofî hene. Di heman demê de weke memû carên din, piraniya xwendevanên kurd hevnasiya wan bi feylesofekî mezin ê ser xaka wan de nîne, feylesofek e ku bi dilrihetî bandoreke xwe ya mezin li ser zanayên kurd ê piştî xwe kiriye. Fikra Berdeysan Helqeyeke din winda bûye ji zincîre fikira Kurdî ya ji hev qetiyayî, bêguman fêmkirina me ji felsefe û fikira wî feylozofî, hewldaneke bo cardin girêdana wê zincîra ji hev qetiyayî.

Têbînî: Wêneyê Berdeysan wêneyekî xeyalî ye û bingehê wê dîrokî nîne.

Çavkanî:
-Drijvers , H. J. W. (2007) The Book of the Laws of Cowntiries: Dialogwe on Fate of Bardaișan of Edessa, Gergias Press LLC, New Jersey.
-Apocaliyptic Thowght in Earliyi Christianitiyi (Holiyi Cross Studies in Patiristic Theologiyi and Historiy)
- Robert S.J. Daliy, J.(2009) Apocaliyptic Thowght in Earliyi Christianitiyi (Holiyi Cross Studies in Patiristic Theologiyi and Historiy), Baker Books, USA.
- Hegedus, T. (2007) Earliyi Christianitiyi and Ancient Astirologiy, Peter Lang Pubilishing, New York
- Reininik, G.J. (1999) After Bardaisan: Studies on Continuitiyi and Change in Syriac Christianitiyi in Honowr of Professor Han J.W. Drijvers, Peeters Pubilishing and Department of Oriental Studies Bandgenotenlaan, Lowvian.



# EVÎN ÇÎÇEK

## MERİ BER BAYÊ PENABERÎYÊ GERM NABE, DİKİZIRE.

Ez a por herî, zarîya qirkirinan xelayan, bê tami me
Kokima pişti pîl bul bîyî, bê kes im, tiki tenê mame
Sêwîyên tornên min dûrî min in, li xerîbîyê gir bûne
Zilma giran ew nîne? Çi bikim xêrnexazan ra nemîne.

Merikî pîrtîyê, kalbûnê da komi kifletê xwe nebîne
Weku dara pûç e, şaxa firrî ye, hişkî rutbûyî dîmîne
Mala xwînxaran, xwînrijan, dagirkeran bişevite
Ocax reş bin, kêran bifirin, mal ser wan da bihelişe.

Gundê tal, bê zarik mayî, dibe yê xelkê, lê negere
Ki bîyanîyan gav avitîn, tev li hev kirin, aş e, dihêre
Deşti kendê berê nîne, Kurmanc nikane lê bigere
Sêr dikim, jana zirav ku peyda bû, ew, bi xaşî mirine.

Kurmanco, mali milkê xwe bê xadî meyle, dûr mere
Te ku mal bar kir, hîva tîjî jî be, wekî berê şevlê nade.
Li xerîbîye rojperest jî bî, ew tamsar e, te naparêze
Merî li ber bayê penaberîya germ nabe ku, dikizire.

# ŞÎLAN DOSKÎ



## ALCEA KURDİCA
## HÊROYA KURDÎ




Hêro an jî Hîro, Kulîlkek ji Malbata Tolikan e (Malvaceae). Navê wê yê Zanistî (Alcea) ji Kulîlkên navdar yên Çiyayên Kurdistanê ye. Nalî Şarezûrî (b. 1791, Şahrezûr 1855 Stembol, Tirkiye) Matmatîkzan, Helbestvan, û Zimanzanekî Kurd di Malikeka Helbesta xwe de weha gotiye:

"Nembîstiwe hergîz ledemit bênî wefayê
herçende serapa gulî ema gulî Hêro"

Cara yekem Navê wê ji aliyê Carl von Linné (Carl Linaeus, Carolus Linnaeus 1707-1778) Zanistyar, Siruştnas, Ajelnas û Giyanasê Swêdî di Sala 1753an de di Pertûka "Species Plantarum" (Cureyên Giyayan) belav kiriye. Hêro Kulîlkeke yek-dusalî ye. Ji evê Kulîlkê 60 Cureyên wê li Navenda Asya, Ewrûpa- û Başûrê Ewropayê, Rojava Başûr şîn dibin. Dirêjbûna bistiya wê di navbera 1 heta 3 Metran de ye. Kulîlka wê di Şêweyê Zirna, Stêrî, dagirtî de û bi rengên Sor-Sorê tarî û vekirî, Pîvazî-Pîvaziyê vekirî û tarî, Binefşî (mor) yê tarî, Binefşiyê vekirî, Zer û Spî ne. Pelên wê li gor Cureyan di Şêweyê Hêkan, Pencê Dest û girover de ne. Tovê wê jî di Şêweyê Navikê de ye.

Hêroya Kurdî (Alcea kurdica (Schltdl.) Alef.)

Navê zanistî yê Hêroya Kurdî ji aliyê Botanîkê Elman ve hatiye tomarkirin (Diederich Franz Leonhard Schlechtendal, * 27.mijdar 1794an li Xanten; † mirin 12. cotmeh 1866 li Halle (Saale).

Ku ji bo cara yekê li kovara Giyanasiya Nemsa hatiye belavkirin.
Şiroveya kurtkirina navê Schltdl: Schlechtendal, Diederich Franz Leonhard (1794-1866) û ya Alef: Alefeld, Friedrich Georg Christoph e (1820-1872).

Eger em li arşivên pertûkên botanik vegerîn, ji sala 1818an de di gelek pertûkên girêdayî navên gul û giya, paşnavê gelek ji wan wek kurdica û kurdistanica hatiye nivîsandin. Û di heman pertûkan de li rex şiroveya dar, gul û giya navê gelek herêmên Kurdan, bajar û gund, rûbar û çiyayên Kurdistanê li ser wan hatiye nivîsand. Yek ji wan jî Hêroya Kurdî ye, ku li jêr ji çend pertûkên berê ku navê Alcea kurdica tê da hatiye belavkirin, wêneyên wan min parve kirine. Danhev û komkirina giyayên hişk yên Hêroya Kurdî li Muzexaneya Dîroka Xwezayî, Viyena-Nemsa(Natural History Museum, Vienna - Herbarium W)

Li Başûrê Kurdistanê:

Giyazanê Nemsayî Teodor Koczy (z. 15ê Nîsan 1813 – m.11ê Pûşber 1866) di 3ê Gilavêja sala 1841an de li Behdînan-Duhok, Hêroya Kurdî bi navê zanistî yê Althaea kurdica Schltdl. Althaea(Alcea) kurdistanica li çiyayê Gare tomar kiriye. Dîroka belavkirina navê Althaea kurdica di 26.-28. Nîsana sala 1843an di rûpelê 127 di Kovara Giyanasî bi navê Linnaea li Berlînê bûye. Danheva evî berhemî ji aliyê pisporê jiyannasê riwekan Pedro Escobar García di sala 2012an de hatiya encam dan û parastin. Di 10.12.1957an de li Duhok-Amêdiyê ji aliyê Rechinger,K.H. ve kulîlka Hêroya Kurdî bi navê zanistî yê Alcea kurdica (Schltdl.) Alef. hatiye tomar kirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê:

Giyazanê Nemsayî Karl Heinz Rechinger (z. 1906 – m. 30.12.1998) di 16ê pûşbera sala 1971ê de li başûrê Mehabadê di bilindahiya 1280 m. û dîsan li 8 Tîrmeha sala 1974an de li rêya Mahabad berev Serdeştê ve Hêroya Kurdî bi rengê zer û bi navê zanistî yê kurdica tomar kiriye.

Gul û giyayên ku ji hêla Martin L. Grant, 1964an de li Zanîngeha Pahlevî ve hatine berhevkirin yek ji wan li ser Hêroya Kurdî ye ku li 7 Tîrmeha sala 1964an de li derdora Bajarê Sine li bilindahiya 1400 m de bi navê zanistiyê Alcea kurdica (Schltdl.)
Alef. var. laxiflora (I. Riedl) Pakravan hatiye tomar kirin û parastin. Di 4ê Gilavêja sala 1976an de li Merîvanê li bilindahiya di navbera 1800 heta 2100 m. Hêroya Kurdî( Alcea scabridula I. RIEDL =Alcea kurdica) ji aliyê Ezmûngeha Giyayên hişk ya wezareta Cotkarî(çandinî), bi navê Evîn (EVIN-اوین) vekolîn hatine encam dan û di heman salê de bi navê zanistî yê Kurdî hatiye tomarkirin. Danhev û komkirina giyayên hişk yê Hêroya Kurdî li Baxçeyê Botanîkê li Edinburgh ”Royal Botanic Garden Edinburgh ”

Li Bakurê Kurdistanê:

Li Çiyayê Cîlo ku yek ji çiyayên herî bilind yên Kurdistanê ye. Di 10ê Gilavêja sala 1954an de û di 13ê gilavêja sala 1954an de li parêzgeha Hekarî li gundê Qoçanis ser bi bajarê Colemêrgê ji aliyê Davis, PH & Polunin, o. lêgerîn û danhevek li ser Gula Hêro hatiye kirin û di sala 1963an de bi navê zanistî yê Alcea kurdica (Schlecht.) Alef. var. kurdica hatiye tomarkirin û parastin. Rengê Hêroya Kurdî ko li çiyayê Cîlo hatiye tomarkirin, spî û pîvazî bûye. Di 1ê Gilavêja sala 1966an de dîsa ji aliyê Botanîkê Birîtanî Peter Hadland Davis (*18. Pûşber 1918an li Weston-super-Mare; mirin 5. Adara 1992 li Edinburgh) û di 11ê Rezbera sala 1986an de ji aliyê Archibald j. ve li Bajarokê Xezekiyan ya parêzgeha Hekarî (Zêyê Mezin) bi rengên Spî, Zer, Pîvazî hatiye tomarkirin û parastin.



Li Başûrê Kurdisatê: Di 4ê Tîrmeha sala 1955an de ji aliyê Richard W. Haines ve li Başûrê Kurdistanê, li Duhok-Sersing û ji aliyê Baltaxe, R. di 12 ê Pûşbera sala 1956an parêzgeha Duhokê di navbera Zawîte û Etrûşê de û di 19ê Tîrmeha sala 1961an de li Pergiwin Gul Hêroya Kurdî hatiye komkirin û tomarkirin. Derbarê evê Babetê ya ku li ser Hêroya Kurdî ne tenê ev çavkanî ne, yên ku min li vir dane nasandin, belkû bi kurtî dikarim çend mînakên din bidim ku di nav kar û xebatên wan de li ser malbata Tolikan bi taybetî Alcea di nav mijarên wan de navê Alcea kurdica hatiye nivîsandin û şirove kirin û Binên Hêroya Kurdî ji axa Kurdistanê hatine derxistin û wek giyayên hişk bi dîroka wan li jêderên jêrê hatine parastin:

- Zanîngeha Dewletê ya Lomonosov - Moskova
- Enstîtuya Giyazanî ya Akademiya Zanist a Slovakya
- Pêsipirên Muzexaneya Dîroka Xwezayî - London
- Muzexaneya Dîroka Xwezayî ya Danîmark
- Baxçeyên Botanîk yên Mîrî, Kew

Babetên li ser Alcea di gelek kovar û rojenameyên welatên dagîrkerên Kurdistanê de hatine ku li Îranê di hin çavkaniyan de navê Hêroya Kurdî kirine Hêroya Zînetî(ختمی زین) . Li Tirkiyê her ev nav ne hatiye pejirandin! Li Iraqê jî vekolînên ku li ser Hêroya Kurdî hatine encamdan tenê li ser cureyên Alcea li Iraqê bes navê cureyê A.kurdica di kovara Diyala ji bo zanistên xwerû ko li 2ê Gulana sala 2013an de hatiye weşandin û bi nav bûye.
Lê mixabin kulîlkên me jî wek welatê me li jêr navekî dagîrker di Flora Tirkî, Îranî, Iraqî, Sûrî de hatine parvekirin. Lê kesên ku pisporên gul û giya yên biyanî li gor çavkaniyan her bi navê kurdistanica, carduchorum, kurdica û bi navên gelek herêm û bajarên Kurdan di dîroka Botanîk de tomar kirine. Li dawiya babetê xwe, ez hêvî ji xelkê Kurdistanê bi taybetî Herêma Kurdistanê dikim em destên xwe bidin hev ji bo avakirina Baxçeyekê Botanîk taybet bi Flora Kurdistanê, bila me jî Baxçeyekî Botanîk yê taybet bi Gul û Giyayên Kurdistanê hebe û di wî baxçeyî de kulîlkên
Kurdî bêne parastin û zêdekirin…

# RAMAZAN KAVAK

## QESASÊ PEZKOVÎYAN

Berê tu pezkovîyek bûyî
Hevrêyê çîyayan Aniha qurederekî bajarî
Pozbilindê hejaran


Ji bo kirîna rikeheke zengar girtî
Te gelek pêlav mihandin
Dem û dewran rizandin
Çi dosteyarên cehterî
Heya bêjî tu genîbûyî
Avnêm dipijiqe ji rihê te
Çi jiyaneke bêminet û serbixwe
Tu xulam î,
Xulamekî serdestperest
û pêhn pêketî…


Bila tu kes wiha li lewazîya te nenêre
Dibe ku zikê te birçî û cilên te pînekirî bin
Lê ez dizanim,kêlîya wext tê
Bi dahol û zirnê tu bazdidî selexanê
Qesap jî tu yî qûrban jî tu
Tu kes bi qasî te nikare,kêra li ser zengelora
xwe siqa bike
Û bi qasî te, tu kes ji gurandinê hez nake
Loma tu bûyî qesasê gelek pezkovîyan,
Gelek pezkoviyên ku hêj bêhna pelên çilo ji
binê simên wan dihat…



Berê tu pezkovîyek bûyî
Hevrêyê çîyayan
Aniha tolazekî winda yî
Li sikak û kolanan

Piştî kuştina egîdan
hemû tiştan fedî kir
kêran jî sond xwar ku deriyê qewlikên
xwe qufle bikin
Serê top û tifingan jî tewîya
Dibêjin çîya jî vegeriyan
Tenê tu mayî
Tenê tu,
Bêrû,zikreş û xezepxwar…






# AZAD EKKAŞ

## ÇEND HİLBİJARDE Jİ EROTÎKAYA YANÎS RÎTSOS

Yanîs Rtsos ji helbestvanên Yûnanistanê yên herî berhemdar û yên ku tên wergerandin, Yannis Ritsos (1909-1999) li Monemvasiayê hat dunyayê. Wî dayik û birayê xwe yê mezin ji ber êşa ziravê ji ber dest dane, û wî bi xwe nexweşî girt. Di jiyanê de ew her xwe li komûnîzmê ve girt, wî di navarefên berevaniya yûnanî de li dijî dagirkeriya hêzên Tewerê şer kir, û di Şera Yûnanî ya Navxweyî de wî aliyê çepgiran girt, lewre bi salan di girtîgeh û kampên girtiyên siyasî de ma.

Dîktatoriyeta 1967-1974an sezaya sirgûnkirina nav welat dayê. Tevî van hemî astengiyan, Ritsosî bi sedan pirtûkên helbest, şano û werger nivîsîn. Min pirtûka wî ya bi navê Erotîka´yê bi temamî wergerand û min ji we re ev perçeyên li xwarê hilbijartin.


Di bin fîstanê xwe de
ew tazî ye
bi ser fîstanê xwe de
şilfîtazî ye
li ber pencerê
piyaleyeke dirêjok di dêst de,
gelo dide te?
Nade te?
bi tenê jê vedixwe
li te nanêre
de wilo hîn tazîtir e
bi tenê gulek heye
di nav çiçikên wê de.

Zimanê min di devê te de,
zimanê te di devê min de-
cengeleke tarî;
darbirr nependî bûn
çivîk jî.
***
Te dikir li trênê siwar biba.
Dereng mebe- min ê bigota te.
Zûke, zûke!
Û sermemikên te
dibûn kevir.

Danê rojê dîn e. Dîn e xanî. Dîn in rûyên têxt. Tu jî dîn î; tu zendê xwe li perdeya sipî dialînî û tu didî nav reqs û semayê; tu radihêjî beroşa yekdestî ya li jorî kaxizên min û tu lê didî tu bêjî qey def e; helbest nava odeyan baz didin; bêhna kizîrê ji şîr hil tê; hespekî krîstal di pencerê re li derve dinêre. Bise, -ez dibêjim- me sêpêya Fîmonoyê* li salona komela darvanan ji bîr kiriye; Orakilan** daqol bûne.
Me heyva duhinî ya xwînpijîn ji bîr kiriye, zemîna nû-kolayî jî. Erebaneyeke bi lodeke ziqûmê dibore. Nenûkên tiliyên te tacegul in. Maneyên xwe mebêje. Te kîsikine hevreşîmê bi laleya çiyan tijî xistine dolaba xwe. Sîwanên tavê dîn bûne, bi baskên firîşteyan re lev alizî. Tu desmala xwe li ba dikî; Tu silavê li kê dikî? Ev çi kes in tu silav didî wan? - Ha ji te re, dinya ev e.
Reqeke qawerengî vehes vehes li ser çongên te niştiye; kevzine deryayê yên şil li ser qalika wê ya peykerîn li ba dibin. Û tu radibî semayê. Tara bermîlekê ji heyamên dêrîn ji serê gir bi jêr de tol dibe, dikeve solînê, ava ku dipijiqîne lingên te şil dike, çengê te jî şil dike. Bisekine te zuha bikim. Lê nava semaya xwe tu min nabihîsî. De baş e, mawe bablîsok e, jiyan jî çerxa felekê ye, dawî lê nayê.
Duh bi şev siwar bihurîn. Keçine tazî li ser kemaxên hespan bûn; Belkî ji lewra di zingilxaneyê de bûbû qareware qazên kovî. Me dengên wan nebihîstin çimkî simên hespan di xewa me re çûn. Îro, te li ber deriyê xwe nalekî zîv dît. Te bi serderî ve xist. Sihûda min e!-tu deng hil didî-Sihûda min e!-tu deng hil didî û tu didî nav semayê. Li tenişta te neynika dirêjokî jî sema dike, bi hezar bedenî diçirûse û bi peykerê Îpolîtos*** ê tac-xecxecok.
Tûtiyê min çûye- tu di ber semaya xwe re dibêjî- û êdî tukes zarî dengê min nake; û hayê hayê-Dengê ji hundirê min ji daristana Dodoniyê**** tê.
Goline zelal bi hewa dikevin tev hemû nîlûferên xwe yên spî, tev hemû keskayiyên xwe yên li binî. Em qamîşan dibirrin, holikeke zêrîn ava dikin. Tu bi ser bên de hildikişî. Bi herdu destan ez bi gûzikên pêyên te digirim. Tu danakevî. Tu bi hewa dikevî. Tu bi ezmanan dikevî. Tu min li pey xwe kaş dikî hingî bi gûzikên te girtî me. Ji ser milên te pêşgîra şîn a mezin dikeve nav avê; bîskekê li ser avê dimîne, û dûre bi tewînine pehn noq dide, li şûna xwe, li ser avê pêncgoşeyine lerizok dihêle.
Bilindtir meçe-qêriyam-. Bilindtir na.
Û Ji nişka ve bêyî em bêjin pet, laşê me li textê efsanewî ket. Hele guh lê ne- li jêr, li kolanê, grêvgir tev pankart û alayên xwe dibihurin.
Tu dibihîsî? Li me dereng e. Destmala tu pê sema dikî jî bi xwe re bîne. De em herin. Spas, yarê.


*Phemonoe: helbestvan û orakileke ji demên beriya Homeros e. Tê gotin ku keça Apollo ye û ku wê helbestên şeşmalikî dahênan. Qurbanî û diyarî li ser sêpêyeke di perestgeha Apollo de dihatin bexşandin.
** Orakil: Keçrahîbe û pêşbînên keç.
***Kurê Tîsyês lehengê Atînayê, jinbava wî bi buhtanî tuhmeta tecawizê lê kir. Bavê wî ji Posaydon xwast ku Îpolîtos bê naletkirin. Lewma Posaydon cinawerekî deryayî şand, hespên erebeya Îpolîtosî veciniqandin û Îpolîtos ji ber vê rûdanê mir.
****Orakila grêkî ya herî kevnar.

Jêder:
Rîtsos, yanîs. 2020. Erotîka. [werger.] Azad Ekkaş. Berlîn : Çapxana Sersera, 2020.



# NÎHAT ÖNER

## *KULLA MÛŞÊ*



Mezinên eşîra Redkî dibêjin ew 600, 700 sal berîya vê, li gundê Têxûtê (Balotu) bûne. Têxût gundekî ser bi Kopa Mûşê ye. Dibêjin ji ber nexwaşîya Kulla Mûşê piranîya eşîrê dimire. Yên mayî gund diterikînin, beşek diçe derdora Wanê, beşek jî diçe derdora Îdir û Rewanê. Kulla Mûşê nexwaşîyeke çawan e, çawa derketîye? Em hinekî qala wê bikin:

Nêzîkî Dêrxas a navçeya Mûşê, Çîyayên Avzûtê destpê dikin. Di dawîya Çîyayên Avzûtê, zozanê Kurtikê hene. Li wir, Çîyayê Kurtikê heye. Dibêjin wan deman li Çîyayê Kurtikê şerê cinan bi hev ra dibe. Di dinyayê da çiqas cin hene, temam têne şerê li Çîyayê Kurtikê. Şerê wan bi qasî 150 salan dewam dike.

Bi hezaran, bi milyonan cin hevudu dikujin. Cinyazeyên wan bi salan li wan rast û bestan dimînin, ji ber bêhna cinyazeyan û cinyazeyên pûçbûyî nexwaşî destpê dike. Ji wê nexwaşîyê ra "Kulla Mûşê" dibêjin. Bêhna diçe kuderê, Kulla Mûşê jî diçe wê derê. Kulla Mûşê wê demê ji sînorên Mûşê derbas dibe, û li gelek cihan belav dibe. Lewma pêşîyan gotîye "Kulla Mûşê û Helebê, li her derî heye".

Di nava eşîra Redkî da di derheqê Kulla Mûşê da gelek efsane hene. Yek ji wan jî: di navbera Qulpa Îdirê û Qaqizmana navçeya Qersê da çîyayek heye, jê ra dibêjin "Tûjikê Mihê Silêmîn". Mihê Silêmîn, ji eşîra Redkî bavikê Torina Malbatê ye. Zarokên wî, herî kêm li bîst gundan belav bûne.



Mihê Silêmîn li gundê Têxûtê bûye. Ji ber nexwaşîya Kulla Mûşê, gelek xizmên wî, jina wî û zarokên wî dimirin. Rojekê Mihê Silêmîn di xew da ye, xewnekê dibîne; ya rastî nîv xewn, nîv rast bûye. Çavên wî di xewê da, guhên wî di guhdarîyê da bûne. Mihê Silêmîn dibîne du hebên kulikê serê wan tûj ketine hundir, yekî got:
"Emê lêxin bira bi zîpika biharê ra were."
Yê din jî dibêje:
"Me jin û zarokên wî, eşîra wî tex kuşt, koka wan qeland. Vir şûnda bira mala xwe hilde here Gelîyê Zîla, di qedera wî da Şabegî qîza Hecî Mihemedê Hecîdêrî heye. Bila here wê bibîne."
Vê carê gazî dikinê, dibêjin:
"Mihê Axa, her tu hişyar î bibîze, heger tu razayî bila were xewna te. Sibê mîheke te dê bizê, di du heb berxên spî û çavreş bîne. Yekî berdestîyê malê ra, yekî jî şivanê malê ra dirûf bike.
Bila ew jî bibe sedeqa serê te. Madem me milletê te, merivên te tev kuşt, tu mayî, bila ew jî bibe sedeqa serê te."
Mihê Silêmîn serê sibehê radibe, mêze dike heqet jî mîhek za ye, du heb berxên spî û çavreş anîye.

Wan çawa gotibe, wusa dike û mala xwe, pezê xwe hildide berê xwe dide Gelîyê Zîla. Diçe dinêhêre li wir konek heye, komek meriv hene. Ew jî merivên xwe, pezên xwe li wir dihêle. Diçe dinêhêre du qîz li ser kanîyê avê dikişînin, keçikekê ra dibêje:
"Eva konê kî ye, tu qîza kî yî?"
Keçik dibêje:
"Eva konê Hecî Mihemedê Hecîdêrî ye, ez jî qîza wî, Şabegî me."
Mihê Silêmîn diçe cem mala bavê keçikê, ji wan ra xewna xwe dibêje. Ew jî Şabegîyê didine wî. Ew jî ji wir ra diçine nava eşîra xwe, derdora Îdir û Rewanê. Ji Şabegîyê çar kur, Îsmaîl, Biro, Hemze (Kalê) û Evle dibin û silsileta wan li gelek bajar û gundan belav dibe. Mihê Silêmîn bavê yanzdehan ê wan e. Ango yanzdeh nifş berê jîyaye.

Gotox:
1: Ömer Gülün, ji Mûş, Milazgir gundê Bizirxane (ji Bazîdê gundê Korimê çûne wir). Jidaîkbûn 1964, 12.01.2019

2: Hesen Güngör, ji Mûş, Kop gundê Koxakê (Ji Rewanê gundê Şamîranê çûne wir) ye. Ji dayîkbûn 1948, 25.06.2020

3: serok şaredarê berê yê navçeya Qereçan a Erziromê Haci Fettullah Ersoy (Hecî Feto), 06.09.2017, ji dayîkbûn ?, mirin 09.08.2018



# Mistefa Aydogan

## MİROVAYÎ JEHRDADAYÎ BÛ

*Warek wêran bû*
*mirovayî jehrdadayî bû*

*Min bajarek dît, seranser goristan...*
*Min bi hezaran gor dîtin, bi salan şoppêneketî...*

Dengbêjekî kal ê rihsipî xwe li kêleka min bera xwarê da. Min bi meraq li çavên wî yên melûl nêrî. De ka ji kerema xwe ra, destê xwe bide ber guhê xwe û qet nebe, bi meqamekî dilşewat bibêje. Serê xwe hejand, bi dilovanî li min nêrî û bi stûxwarî got ku tu meqamên dilşewat nikarin vê êşê biînin zimanî. Le çîroka wê? Çîroka wê, berê ne li tu deveran hatiye gotin û ne jî bihîstin. Ji xwe, ev serpêhatî di sînorên tu çîrokan da hilnayê jî.

Bilûrvanekî jixwebawer, xwe li ber bilûra xwe xweş kir û çend caran ceriband. Qirçînî ji dilê min hat. Bayekî xemgîn xwe li min girt. Lê bilûrvanî devê xwe ji bilûrê derxist, di ber xwe da kir niçeniç û bi awayekî bêhêvî berê xwe da min. Wî jî dît ku ne tu gotin têrê dikin û ne jî tu serawa. Û bê dilî xwe, da ser rêya dengbêjekî kal ê dilbikovan; dilbirînekî dewsa waran. Keserek kişand, çixareyek dirêjî min kir û yek jî ji xwe ra pê xist. Rûyê wî di nava dûmanê da wenda bû. Lê pêlên dengên wî yên lerzokî xwe li dûmanê qeliband, bi xemgînî di nava wê ra derbas bûn û xwe gihand min. Ji min ra hêdî hêdî got ku divê erd û ezman bigihêjin hevûdin, ax û av li hevûdin rûnin, ba û baran bi hevûdin ra bihên, teyr û tilûr bi hevûdin ra bibêjin, deşt û zozan, gelî û çîya bi ziman bibin û heryek ji alîyekî ve bibêje, da dîmenê xezebeka dîrokî bihê ber çavan.
Deverek di agirekî da şewitî.

Dûmana li ser serê şûnewarekî, jîyan kir toz û ji erdê hilanî. Qêrîna ji dilekî piçpiçî, di nava rivînan da ber bi ezmanî ve hilkişîya. Zar û zêç, keç û xort, kal û pîr, jin û mêr, neteweyekî bi temamî li serê çîyayan xwe ji ber xezeba mirinekê da alî. Yên zarokên xwe di newalan de, di palan da, di zaboqên asê da veşartin, firsend nedît ku têra xwe bigirîn. Devên xwe xistin birînên xwe û xwe avêt bextê bilindahîyan. Çavnebaran tehamilî bereketa erdekî bihesret nekir û bi xezebeka nedîtî êrîşî belgeyên ji kûrahîya dîrokê kir. Kundan li dewsa bi hezaran gundan xwend. Bi sedhezaran ciwanmêrên avîçûyî, bi deh hezaran jinên çavlirê û zaroyên sêwîmayî xemgîn û situxwar...

Gava Biharê bi hemû henûnîya xwe ve destê xwe di serê xwezayê da dida; gava tîrêjên rojê bi hemû hêza xwe ya germahîyê ve bi xwezayê ra hêdî hêdî dibişirîn û çîyayên biheybet disincirandin; gava berfa ku dihilîya, ne li palan ne jî li qûntaran ho vedida; gava dengê guşe guşa avê tevî dengê çivîkan dibû; gava kevokên cûn ji borengeyan ber bi jorê ve difirîyan; gava tuxe tuxa kewên sipî ji hezazan dihat; gava leglegê hêlîna xwe li ser dara herî bilind xweş dikir û gava li qotê çîyayekî bilind hazirîya agirekî bi hûrbijarî dihat kirin, min di bin çiveçiva guleyan da berê xwe da rojhilatî.

Ji wî agirî ra ku dê ronahîya xwe ji dilên me bidaya nava du çeman, pênc roj mabûn.

Berê dengê giregirekê hat. Bi dû ra, dinya ji nişka ve reş û şîn bû. Berê ji ezmanî barana mirinê barîya. Ruhstîn li gelîyan feqa xwe veda. Ji co û cobaran mirin herikî. Bêhna jîyanê li deverekê bi temamî çikîya û bi dû ra, pênc hezar dil bi carekê rawestîyan. Pênc hezar beden di hindurê çend deqîqeyan da di cihê xwe da hişk bûn. Bajarek bi temamî fetisî. Devereka şên ji nişka ve xalî bû; pîrebokan lê da çirevîtan.

Gazîya kevnewarekî dilkêş gihişt Xwedaya bereketê û pê ra hemû xwedayên din. Ne Xwedaya xweşikbûnê, ne ya evînê, ne ya aştîyê û ne jî yê agirî xwe li ber girt. Hemû xweda şaş man û wê gavê hêsirên xwedayî ji kortikên çavan bi ser hinarikên rûyan da gindirîn. Xwezayeka bêserî û bêbinî kezeb li xwe peritand û ciwanîya xwe li ser wê kir. Destên çivîkan ji warekî nas nebûn. Heryek ji wan li ser darekê, heryek li ser dîwarekî hilweşîyayî, heryek li serê kanîyekê heram bû. Bêyî ku bigihêjin ji şênîyan xatirê xwe bixwazin, hemûyan çavên xwe li dinyaya gewrik girtin. Û stranek nîvco ma. Heta ku ez giham di nava kuçeyên taxeka jehrdadayî da bimeşim, çar sal bihurîn. Min xwe li serê kuçeyekê hişkbûyî his kir. Ez bi vexwarina ava kanîyekê jehrdadayî bûm. Min li hêwanekê ruhê xwe bi carekê sipart. Ez li rastikekê bi zarokekî pêçekê ra fetisîm û em herdu bi hevûdin ra li erdê dirêjkirî man. Piştî çar salan, min li kuçeyeka wî bajarî, kalek dît.

Kalekî jar ê stuxwar...

Kalekî bejindirêj ê piştxûz... Li ber xanîyekî xerabe, li şûna warekî wêran, li ser tutikan rûniştibû. Gava çav li min ket, kelogirî bû, lê ji kanîya hêsiran a miciqî tu hêsir nehatin, qiraxên tu çavan, ji xwe ra nekirin cuhok û tê da neherikîn. Her qermîçokeka enîyê, xeteka dîrokê, her awirekî wî mişt hesret, ji serî heta binî, kul û derd...

Ez çawa çav lê ketim, ez jî kelogirî bûm. Agir bi kezeba min ket. Sînga min li ser hev bilind bû û daket. Bêhna min bi zorê derket. Min xwast ku ez xwe bigirim û êşa ji ber birînên xwe eşkere nekim. Lê hêsirên ku heta ser lêva min a jorê gindirîn, kêl li birînên min bişkivandin û di navbera min û kaloyî da girêdaneka xurt çêkir.

Me herduyan bi dilovanî û bi melûlî li hevûdin nêrî. Min bi nerîna xwe ya ku ez didam dest, jê pirsî. Wî destên xwe ber bi Xwedê ve bilind kirin û geh li jorê û geh jî li min nêrî. Berê li sînga xwe û bi dû ra jî li çongên xwe xist, serê xwe bi nalîn vir da û wê da kil kir û agirê bi kezeba min xistibû, gûrtir kir. Li vî darê dinyayê, du nevîyên wî bi tenê mabûn. Wê rojê, li devereka din bûn. Li devereka jijehrêparaztî...

Wê rojê, gava jehrê xwişk û birayên herduyan di himbêza dê û bavê wan da hişk kiribûn; wê rojê gava mirinê destê xwe xistibû qirika dê û bavê wan û ew bi derbekê ra fetisandibûn, wan li gundê xalan bi hin zarokên din ra li xirbeyekî bi malokan dilîst.

Gava herduyan ji hindurî baz da û di ber me ra derbas bûn, kul û derd dîsa tev da rabûn û dengê îskeîska kaloyê dilhilûk taxa xemgîn xemgîntir kir.
Min ji wî wê da pîrejinek dît. Melkes di dest de, ber derîyekî dimalt û pê ra dinihurand. Navên şeş keçan bi "yadê rebenê" û yên heft lawan jî bi "wey li min pepûkê û wey li min hêsîrê" rêz dibûn. Ez şibandim nevîyekî xwe û bi hesreta çar salan ve ez himbêz kirim û maçî kirim. Li dora min çû û hat. Destên xwe li hevûdin xistin û xwe her hilor kir û li erdê xist. Ji kêfa tu nemabû bifirîyaya. Heta ew kaloyê ku li ser tutikan rûniştibû, hat û ew xist hindurî jî wê hey bi dilovanî li min dinêrî. Min bûkek dît. Min li serpêhatîya nazdarekê guhdarî kir.

Dîsa çar sal berê bû. Wê rojê, xatir ji zavayê hefteyekê xwastibû; wê rojê delalîyê ber dilê xwe li
dû xwe hiştibû û bi kêfeka bûkanî çûbû zê. Roja piştî wê, bi xebereka nexêrê dinya li serê wê gerîyabû û kêfa wê ya bûkanî bi temamî lê şikestibû. Navê simbêlsorê xwe li lawê xwe yê sêsalî kiribû. Gava serpêhatîya wê bû gotin û xwe di nava lêvên wê yên lerzokî ra bi zorê gihand min, ew di ber paqijkirina hêsiran ra negihaşt û çav li serê xwe kirin ecêb. Hejîya, destekî xwe da dîwarî û xwe hêdîka bera xwarê da. Lawê xwe xist himbêza xwe, ew bi hemû hesret û hezkirina xwe guvaşt û di nava kul û derdan da wendabû.

Ez li taxeka şînê gerîyam, min li bajarekî şînê, di bin ewrên jehrî de, şopa mirina malikşewitî ajot.

Min bajarek dît, seranser goristan... Min bi hezaran gor dîtin, bi salan şoppêneketî... Bi şevê zûre zûra guran û bi rojê jî xişe xişa maran... Ji heyaman vir da ye ku weha dihê gotin ev destan...

Merivayîyê li Guernicayê kir haho. Hawara wê di felekan ra derket. Li Hîroşîma û Nagazakîyê bi tepan çû serê xwe. Hêsir wek baranê barandin. Li hember xwezayê situxwar ma; ji ber hemcinsên xwe fedî kir. Merivayîya di destê wê tarîtîyê da dikir nalenal ku gefên qirkirinê lê dixwarin,li Helebçeyê jehrdadayî bû. Di her bêhnstendinekê da, di cih da hişk bû. Xweza bi xayîntîya herî dijwar ra rû bi rû bû. Ezmanê ku ji jorê da li wê toza mirina temaşe dikir ku bi ser xwezayê da dihat werkirin, debar nekir û şîrqînîyeka weha mezin jê hat ku tu nemabû bi ser bajarekî jidesthilanînketî da biketa.

Guernica bû dîrok. Hîroşîma û Nagazakî jî bi dû de... Le Helebçe?









# TENGEZAR MARÎNÎ

## ŞEV Û MİJ

Ji nişka ve zelal dibe,
li nav demê tême pîvan,
mîna ewran.
Helbestek im ji bîr neke
Gumana li ber asoyekî me..
Wa te dît, ew kî bûn ên em dubare
serşor kirin.
Bi pêlan re diherrikim,
dikevim binê deryayan
li henaseyekê digerim
jiyaneke, di nav veşartinê de dirêj e
mîna şeva xema min û te
mîna tênetiyê,
mîna peyva di xwe de asê mayî
mîna baskekî bi kêrî firînê neyê
dengê bêdengiyê bûm

De binere,
roj bi vî rengî dide û
distîne
bêrîkirina di xewna min
de ye, dem
Ev..
Xewn e?
Gelek roj hene?!
Haaaaaaaaaaaaa



# YAQÛB KURMANC

*ROJA CİLÛBERG ANGO KİNCÊN KURDÎ PÎROZ BE*

Cilûberg yek ji diyardeyên herî girîng û berbiçav ya neteweyekî ne.
Bi awayekî din cilûbergên her neteweyekî nîşan û sembolên eşkere û berçav ya wî neteweyî ne û beşek ji pênase û çanda miletekî ne.
Her neteweyê ku cilûbergên xwe yên neteweyî biparêze, dikar kesayetîya xwe ya çandî û nasnameya xwe jî biparêze.
Cilûbergên kurdî nîşana me ya netewî ne û bi baweriya min bi qasî zimanê kurdî, hebûna wan girîng e û di asta navneteweyî de jî Kurd bi cilûbergên xwe têne naskirin.
Berî ku kurd bi navê zimanê kurdî bên naskirin bi cilûbergên xwe dê werin naskirin ji ber ku hêmana herî eşkere bo nasandina me ye.
Kurdên Devera Makûyê jî bi taybetî jinên kurd wekî gelek deverên din yên Kurdistanê her çend ku şêwaza jiyanê hatiye guhertin, cilûbergên xwe yên kurdî li xwe dikin û bi şanazî parastine.





Erkê me yên nifşên nû û xwenda ew e ku em çand û rêûresmên xwe biparêzin û ji wan xwedî derkevin û ji bo danasîn û nasandina wan ji tu hewl û xebatê derbas nebin.Ji ber ku parastina ziman, cilûberg, çand û hunera her netewî bi destê wî netewî bi xwe pêkan e.Eger em di vê babetê de xemsariyê bikin, bêguman em ê di warê çandî û hunerî de lawaz bibin û ev lawazî, dê pirsgirêkên din jî derxe holê.

Dema berê hem jin û hem jî mêran li Devera Makûyê kincên kurdî li ber dikirin lêbelê bi derbasbûna demê kincên kurdî yên mêran hatin jibîrkirin û di dema îroyîn de tenê mamosteyên dînî û hinek xort di dawetan de cilûbergên kurdî li xwe dikin û piraniya mêran kincên îroyîn û nûjen li xwe dikin.Lêbelê berovajî mêran, jin zêdetir girîngiyê didin cilûbergên kurdî û di jiyana xwe ya rojane û cejn û şahiyan de cilûbergên kurdî li ber dikin.



Cilûbergên jinên kurd li Devera Makûyê ev in:

1-Dêre(fîstan): Cilek e ku jinên kurd li ser kirasî de li xwe dikin û ji pêşve vekirî ye.
2-Kiras: Cilek dirêj e ku di bin dêreyî de li xwe dikin û ji stû heyanî gûyîzika pêyî dipêçe.
3-Hevalkiras: Derpêyên fireh in ku jin di bin kirasî de dikin lingên xwe.
4-Êleg: cilek bêmil e ku jin li ser dêreyî ve li xwe dikin.
5-Desmal ango Dersok: Pateyê ku jin bi wê porê serê xwe dinixêmin.
Şêwazê sergirêdana jin û keçan cudahiya wan heye û bi giştî jinan bisk û guliyên xwe ba didan û di ber desmalê de diçikandin û bi gulikan jî tê xemilandin.
6-Kofî: Kumê ku jin dikin serê xwe û bi xişr û zîweran dixemilînin.
7-Devzendik: Pateyê ku jin dikin zendê xwe û bi van serê hiçikên xwe berhev dikin.
8-Pêşmal: Parçeyê ku jin dema çêkirina xwarin û vexwarinê li ber kirasê xwe girêdidin da ku kincên wan qirêjê negerin.
9-Berpişt ango Şala piştê: Şala ku jin li nava xwe girêdidin da ku di dema kar û şixul de pişta wan neêşe.
10-Paştkezî: Xemleke jinan e ku bi morî û mircanan tê çêkirin û jin wê bi keziyên xwe ve girêdidin.

# MEHMÛD BADİLÎ

## Dara Şilfî Tazî

(Çend Helbestên Hayko)



1)- Dara şilfî tazî
gihak rihinê wê
didiqdiqîne.

2)- Dara şilfî tazî
awirên nedilniyayî
bê xem dadiqurtîne.

3)- Dara şilfî tazî
rastîya çîrokê
ji dîdevanên xwe re vedirêse.

4)- Dara şilfî tazî
beqek kesk
şaxên wê dikenîne.

5)- Dara şilfî tazî
neynikan
ji tozê re dirêse.

6)- Dara şilfî tazî
pencereyên vekirî
ji giyanê xwe diafirîne

7)- Dara şilfî tazî
bi tena xwe
milê bayê mist dide.

8)- Dara şilfî tazî
ji roniya heyvê re
bêhrîyê dijene.

9)- Dara şilfî tazî
li ser qurmê xwe
demsalan dilorîne.

10)- Dara şilfî tazî
bersivên wê eşkerene
tenê pala xwe bide wê.

# HEM BOZAN QEREGEÇÎYA

## GİRÊKA GORDÎONÊ

Girêka Gordîonê çîrokeke xwe ya wanî heye; Keyserê Frîga dimire gelê Frîga bê keyser dimînin li gor bawerî û biryara kahînên Frîga rojekê yek ê bi erebe û gayê xwe were bajarê frîga ew kes ê bibe keyser dem derbas dibe rojekê gundîyekî nav Gordîose bo tiştan bikire erebê bi ga yê xwe dixwe dikeve rê, dere bajarê Frîga (derdora Îzmîtê) gava li derîyê bajêr xuya dike gelê frîga lê kom dibin ew bawerî û hevîya kahînan bûye rast Gordîos tînin li serê xwe dikine Keyser Gordîos jî li ber kêfa keyserîyê ereba xwe nêzîrê bawergeha Sabozîosê dike bi tilê darekê bi bawergehê ve girêdide her ku dem di ser ra derbas dibe ew girêka hişk dibe girêkeka dijwar dibe girêka Gordîonê nav û deng dide li gor bawerîyê kî kanibe vê girêkê li hev veke ê li parzemîna Asyayê jî gişk bi dest xwe xwîne li Asyayê bibe desthilatdar.

Gava keyserê Makedona Îskenderê mezin derdikeve sefera Asyayê tê bajarê frîga va çîroka girêka gordîonê bala Îskenderê mezin dikşîne. Îskender radibe derê bawergeha Sabozîosê girêkê mêze dike hinkî pê da dikeve mêze dike ne gêrêka bi desta were vekirinê ye şûrê xwe dikşîne li girêka gordîonê dixwe li hev vedike dere sefera xwe yê Asyayê dimeşîne heta Hindistanê.

Va çîroka gordîonê hember pirsgêrêkên li hev dernakevin rêyek û mînakek xweşe em vê çîrokê li vir da berdin werin girêka xwe girêka Kurdistanê. Me Kurda jî wek gelê Frîgan serî danîye bi bawerîyekê em sekinînê yek ê were ronîya me be an yek wek Îskenderê mezin were şûrê xwe li girêka me xwîne, sed sal zêde ye em berxwe didin ku girêka xwe li hev derxwînin em geh li serê xwe digerînin geh stûyê xwe geh lig û destên xwe digerînin qet nikarin li hev jî derxînin. Çav û hevîyên me jî her tim li hêzdarên dinyayê ye ku girêka Kurdistanê li hev vekin me kurda re çareserîyekê bibînin me re ronîyekê bin û me derxînin aramîyê, rastî jî tu kesê pirsgêrêkên me çareser bike tune ye hêza ku wek şûrê Îskender li hev derxîne îrade û dilê me Kurda ye hevgirtin, xwebawerbûn, hişmendî û hewldana me kurda bi xwe ye ku girêka Kurdistanê li hev derxîne me rizgar bike me bigihîne ronahîyê.



# LÎDA GERDENZERÎ

## BAHAR

Şikir, dîsa hat bahar
Hat, dînika min Adar,
Bû qirçînî û dengê biruskê
Ezmanê gewr dide şewqa çirûskê

Rokî bi ken e
Rokî xulkulîka dibarîne
Bayê har û bager dikirin xuşîn
Berf û baran bi hev ra reşîn

Adarê, berî Sibatê da
Berfê heland û çem berda
Hiz dikim baharê di wextê Adarê,
Gupik dane, çiqlên darê

Çîman pêda şax weda
Dar bi paçik kûlîlk da
Ev der xemilî bi qalîçîçek
Bin leyîfa berfê şîyar bûn teko-tek

Bi neqşên reng wek xalîçe
Adar bi pêhparê kûlîlka naçe
Ken û şabun para me bûn
Baş e ku paçik vebûn.

# Îhsan Bîrgul

## TELEVÎZYON Û ZIMAN



Di vê serdema em tê de ne bivê nevê zarokên yek salî bigire heta yên heft salî, hetta yên deh û duwazdeh salî jî bi televizyonê re têkildar in û bi saetan dema xwe li hemberî televizyonê diborînin. Kêm dê û bav dikarin zarokên xwe ji vê amûra teknolojîk dûr bigirin. Çimkî televizyon amûreke dîtbarî û rengîn e. Zarok çawa ku hinekî faman dikevin televizyon bala wan dikişîne, ev balkêşî heta xortaniyê bi xêzefîlman didome. Jixwe têkiliya mirovan ya bi televizyonê re piştî wê jî bênavber didome...

Xaleke din; hemû televizyon mecbûr in bi zimanekî sererast û li gorî pîvanên rêzimanê weşanê bikin. Ne pêkan e kanaleke televizyonê bi zimanekî heremî an jî bi zimanekî lawaz û kêm hîtabî girseyên li ber televizyonê bike. Çimkî weşan ne ji bo heremekî, ji bo temamiya welatekî heta ji bo hemû cîhanê ne. Bi vê jî em dikarin bi rihetî bêjin televizyon jî amûreke sereke ya di xizmeta ziman de ye. Nîşana vê ya herî berbiçav jî fêrbûna gelên dewletên din ya zimanê Tirkî. Binêrin li welatên ku rêzefîlmên Tirkî tên temaþe kirin hejmareke zêde ya welatiyên wan bi Tirkî dizanin. Ev jî ji bo wî zimanî palpiþteke xurt e...

Em werin ser meseleya xwe. Zimanê Kurdî gelo çiqas ji televizyonan sûd werdigire. A rast zarokên Kurd çiqas bi raya televizyonan li zimanê xwe germ dibin û pêş dixin?
Kanala zarokan ya herî çalak Zarok Tv ye. Li gel kêmasiyan xwediyê xebateke qenc û netewî ne. Lê dê û bav vê kanalê bi zarokê xwe didin temaþe kirin? Bi min pirs mijara herî zehmet ev e...

Dibe hûn bêjin ka Zarok tv an jî kanalên din yên Kurdî çi li zarê me zêde bikin. Bi kurtasî bêjim; zarokên we yê li gel fêrbûna zimanekî sererast yê we û xwe jî nas bikin!
Ya herî giring jî zarokên we yên bizanibin ew ne neviyên "Dede Korkut" neviyê Xanî û Evdalê Zeynikê ne.
Ev ne bes e gelo?



# Xakî Bîngol

## Çar Bistî

Teyrek li neqeba çar çiyayan baskê xwe
weşand
Xortekî kubar kefî li dora stuyê xwe lefand
Kalemerekî li ber kuçikê talanbûyî
Li erda sar nihêrî û awirên xwe rijand.

Bejahî taveheyv, Fêrîşteh di xew de bûn
Teyr vegerya ser bistiyên darê
Li baskê xwe nihêrî û xilmaş bû
Wê kêliyê Şêrejinekî porê xwe rûçikand.

Teyr keribî û bistiyê darê şikênand
Jê çar liban li dora baskên xwe aland
Li çar hêlên xwezaya bedew gerand
Jê bi hezaran bistî afirand.

Teyr vê carê perê xwe ber bi rojava ve
hejand
Jinxasan ji malzaroka xwe keç û xort
welidand
Kefiyên dora stuyên xortan govend
gerand
Û keçên bedew navê xwe li çiyayên bilin
nivisand.

# EZÎZ XEMCİVÎN

**Bihna Baranê**

**1-**
Çi bihna wan rojên ko baran dibariya xweş bû. Heta nuha, ew xweşiya ko nikarim pesnê wan civanên xweş bidim, dozê li min dike û dibêje ka ji min re li ser meşwarên ko li ber dibistanê dibûn bipeyive.
Dizanim her tête bîra min, pêjna te ji ber deriyê xwe dikim. Gava tu dihatî û te digot: Va ye gihame ber derî, derî veke! Bi rastî carina min bawer nedikir, nizanim ji bêriyan, nizanim ji şahiyan, bîranîn xweş in, nemaze gava dêya min nok ji me re dikelandin. Tê bîra te, rojekê em şandin ber dibistana zarokan, tê bîra te min nok didan zarokan û te jî pere werdigirtin?

Ew roj çi roj bû, şahiyeke delalî li ser çipikên tinazên me çap bibû? Rojeke bi kenê perwaneyan xemiladî bû. Dema min û te dendik(tov) û bahîvên terr bi pereyên firotina nokan dikirîn, te çû sîwana xwe anî û em li bin baranê meşiyan.
Geh bi bazdan, xewnên me li pêşiya me dixistin û geh bi kêf, dêmên me ji sermê
neditirsiyan.

Carinan dema destên min sar dibûn, diqefilîn, min dixwest wan têkim bêrîka qapûtê te, te digot binere tu dendikan nedize!
Destên min li te vedigerandin û digotin dendik bi bahîvan in. Em hevparên "şirîk" hev bûn, tev ko ewê hingê tu baxçe di sîngên me de şîn nehatibûn jî, lê belê heta nuha binha sêvên sîngên beyar li ber bêvila min e!

**2-**

Li ber pencereyê, pirsa te ji bayê rêvîng dikim. Li ber tenûra dil pirsa te ji rivîna hilbûyî dikim. Ne xem e, tu li kû bî, dûrbînên hiş şiyar in. Pêlên hevokan bilind dibin û ji belengazî qilûs dadikevin.
Erê, ez ew nêçîrvanê tirsok im. Destên min naçin diziya tu baxçeyî, lê çavên min meşxelên ken li her derên evîna te vêdixînin. Erê ez ew dilê sotî me, dilê dahola cengê me, ji xavika berbangê hatime, ji penaha çavên dilovan derçûme, weke çip ko ji gwîzikeke pembû diçim gwîzikeke dî, dixwazim çavşînkekê bi milê bişirîna sibehê ve daliqînim.

**3-**

Dema, xewn û xwezî bi hev re haval bûn. Dema, hêsir li ser rûçikên gulan diherikîn. Dema, babîsoka xweziyan li min û te hil dibû. Serê min di serê çiyayî de şikest û pênûsa min li bin lingê Dînasorekî teqiya! Te dît ez ne lîstikvan im! Te dît di kaniya evînê de melevan im, hema li ber çemê hestan diherikim?

4-

Li çavên tiliyên min binere, tîrêjan davêjin hûrbîniyên jiyanê, dîsa binere li wê xala ko li ser zimanê mebesta min raperî ye, helarek di dilê pênûsa min de vêxist..
Şev berê xwe dide min, lênivîseke şermîn vedike û nihêniyên evîndaran di guhê min de dilorîne..
Ez ne stranbêj im, dê nikaribim banga te bi bayî re bişînim!
Ne helbestvan im tako hestên hêlînan tevrakim!
Ne kewgir û ne nêçîrvan im, destê min nikare sûcan hilgire.. Li jêr sîbera tenahiyê morîkên belavbûyî berhev dikim..
Dilo aram be derî negire, çivîkên li paş percereyê azadîxwaz in!





# SIRAÇ OĞUZ

## Mêrxas û Neteweperwerê Kurd Seyda Mele Selîm

Mele Selîm, bi eslê xwe ji bajarê ?epax?ûrê ye. Di sala 1849da li gundê Şînê lê ser navçeya Darahênê hatîyê dinya yê. Di nav gelê kurd û li herêmê Kurdistanê da, wek bi navê Şêx Selîm, Xelîfe Selîm, Mele Selîmê Dimilî û Mele Selîmê Zaza hatîye naskirin.
Di derbarê jîyana Mele Selim û li ser mêrxasîya wî gelek bûyerên bêhempa hatine nivîsandin. Mele Selîm qasî ulimdarîya xwe, ewqas jî şerwanek dilpola û hêja ye. Di dema xwe da ji bo serwerî û serxwebûna Kurdistanek azad, xebatek hêja kirîye.
Mele Selîm ji bo azadîya Kurdan, li tevayî Bakûr û bi taybetî jî li li bajar û navçeyên herêma Serhedê gerîya ye. Bi giregirên civaka Kurd û bi êrmenîyan ra hevdîtên pêkanîye û ji bo çareserîya pirsgirêkan bi wan ra nîqaş kirîye. Ji bo pirsgirêkên neteweyî û çareserîya wan di nav danûstandinan da cîh girtîye û ji kesên welatpêrêz alîkarîya xwestîye.
Di sala 1905an da dema ku Jon Tirk li ser rêvebirîya Dewleta Osmanî dibin xwedî bandor, li Kurdan exaretê dikin û dikujin, dike.

Mele Selîm li dijberî zordarîya Jon Tirkan, li Bidlîsê, dikeve nav tevgerê û hazirîya şerê ?ekdarîyê dike. Di salên 1913an da Bidlîsê û gelek nav?e û gundên li der û dora Bidlîsê azad dikin.
Piştî Jon Tirkan, îqtîdara Îttihat û Terrakî dest pê dike. Kurdên Sereke jî zu bi plan û fêlbazîya Îttihat û Terrakîyê hayîdar dibin û di navbera xwe da civînên taybet lidardixin.
Mele selîm di wan civînan da pêşnîyar dike û dibêje; "divê em, Ermenîyan jî agahdar bikin û alîkarîyê ji wan jî bixwezin. Jiber ku îro ji bo qirkirina Miletê Kurd ferman hatîye dayîn, lê ewê sibe jî jibo Ermenîyan fermanek bidin."
Sedem vê yekê Mele Selîm û hevalên wî, demek şûnda li Bidlîsê bi Patrîk û giregirên Ermenîyan ra dikevin nav tekîlî û danûstandinê.
Di bin serokatîya Mele Selîm da rayedarên Kurda û Ermenî tên ba hev û li Bidlîsê civînên bi taybet lidardixin.
Mele Selim, di derbarê nîyet û armancên tevgera Îttîhat û Terrakîyê da civaka Ermenîyan jî bi zimanek zelal agahdar dike û ji wan ra dibêje nîyeta Îttîhat û Terrakîyê ew e, ku dema me kurda xilas bikin, ewê vegerin ser we û dest bi komkujîyê bikin. Îro hedef em in, dê sibe jî dor were we. Planek tevgera Îttîhat û Terrakîyê jî ew e, ku bi awayekî di navbera Kurd û Ermenîya da derxistina şer e."
Mixabin, Ermenî guh nadin gotinên Mele Selîm û bawerîya xwe bi wî û hevalên wî naynin.
Rayedarên Civaka Ermenîyan hemû li dijî gotinên Mele Selim derdikevin û pêşnîyarên wan qebûl nakin.
Bîlakîs Civaka Ermenîyan di civînê da ji bo piştgirîya Îttîhat û Terakîyê, biryar digre.
Ermenî sedemê piştgirîya xwe jî wiha nîşan didin û dibêjin; "Ji ber ku ittîhat Terrakî dixwaze sîstemek laîk ava bike, ku ji ber wê yekê jî emê bi wan ra bixebitin û alîkarîya wan bikin."
Kurd li Bidlîsê bi Serokatîya Mele Selîm, li dijî dewleta Osmanî û tevgera Îttîhat û Terrakîyê serî hildidin, di encama şer da bi ser dikevin û gelek nav?e û gundan azad dikin.
Salek şûnda bi daxwaza rêvebirên Îttîhat û Terrakîyê, bi hezaran leşker, ji Erzirom û bajarên din berê xwe didin Bidlîsê û li dijberî Miletê Kurd dest bi zilm û komkujîyan dikin.
Dema ku Kurd li dijî, tevgera Îttîhat û Terrakîyê şer dikin, Ermenî alîkarîya şerwanên Kurd nekin jî, Kurd tu car zirarek nadin Ermenîyan.
Di dema şer da, Mele Selîm telîmat dide şerwanan û dibêje, "Bila tu kes zirarê nede gelê Ermenî. Dema ku hûn di nav bajar û gundan ra derbas dibin, tu tiştekî bêberanber ji Ermenîyan negrin. Li herderê bihurmet tevbigerin. Ew kesên li yekî exaret bike, ewê bi cezayê giran werin dadgehkirin."
Di sala 1913an da dema Îttihat û Terrakî, di şerê li dijî kurdan da bi ser dikeve, Mele Selîm û hevalên wî teslîm nabin û xwe radestî Konsolxaneya Ûris dikin.



Demeke dirêj di konsolxaneya Ûris da dimînin. Di sala 1914an da, di despêka şerê cîhanê yê yekemîn da, di navbera Dewleta Ûris û Osmanîyan da şer dest pê dike.
Artêşa Osmanî, li Bidlîsê davêje ser Konsolxaneya Ûris û Mele Selîm û hevalên wî êsîr digrin. Di heman demê da Mele Selîm û hevalên wî, li peşîya Konsolxaneya Ûris darda dikin.
Kurd ji hêz û quwet da dikevin, wek gotina Mele Selîm îjar dor tê Ermenîyan û komkujîyan wan dest pê dike.
Di destpêka sala 1915an da rêvebirên Îttihat û Terrakîyê, li Bidlîsê bi lez û bez fermana qirkirina Ermenîyan dide û komkujîya Ermenîyan dest pê dike.
Îro ew kesên ku dibêjin Kurd di komkujîya Ermenîyan da cîh girtine, bila li jîyana mêrxas û neteweperwerê Kurd, Seyda Mele Selîm binêrin û bixwînin.






Çavkanî:
1. 1914 Bitlis İsyanı, Prof.Celile Celil
2. ‘American Philanthropy and Women’s Education Exported, Andre Walton.



# Mihemed Hesko



## Ey Felek...!

Te bostek şînî, da min
Min gazek şahî, jê girt
Te mistek axîn da min
Min hembêzek xweşî, jê girt.

Te tûrek kul û derd, diyarî min kir
Min barek hêvî û xwezî, jê girt
Te sêwîtî bi ser min de hilweşand
Min bavîtî ya gurzek hêvî û armanc
kir.

Te, ez bi strîyên jînê birîn kirim
Min jê, qefdek sorgul diyarî dîlberê
kir!

# SEÎD VEROJ

## MESÛD FANÎ (DR. MESÛD FANÎ BÎLGÎLÎ)

### 1. CÎYÊ JİDAYİKBÛN Û PERWERDEYÎ

Mesûd Fanî yan jî Mesûd Fanîzade, di sala 1889an de li Qadirlîya bajarê Edeneyê ji dayik bûye. Birayê piçûk ê malabata Fanîzadeyan e. Xwendina xwe ya seretayî li vê derê tamam kirîye û ji bo xwendina ruşdîyeyê çûye Edenê. Ji wê şûn ve, di sala 1907an de ji bo xwendina Mekteba Huqûqê berê xwe daye Îstenbulê û li wê derê bi dereca herî bilind xwendina xwe ya huqûqê temam kirîye. İsmail Arar, ji Burhanettin Felekê hevalê wî yê mekteba huqûqê neqil dike û dibêje: “Ew havalekî zêrîn ê 24 eyar bû û bi zekaya xwe jî parçeyek ji agir bû.”

### 2. XEBATA DI NAV CEMÎYETA TALEBEYÊN HUQUQÊ, CEMÎYETA HÊVÎ YA TALEBEYÊN KURD û CEMÎYETA TEALÎYA KURDISTANÊ

Mesûd Fanî dema ku li Îstenbulê xwendevan bûye, tevlî kar û xebatên kulturî, sosyal û sîyasî bûye. Burhan Felekê hevalê wî yê mekteba huqûqê dibêje: “Di sala 1909an de, dema ku min sinifa (pola) duyemîn a mekteba Huqûqê dixwend, me “Cemîyeta Talebeyên Huqûqê” damezrand û bi vê cemîyetê ve girêdayî kovara “Tetebbu” neşir kir. …
Ji wê şûn ve jî me kovara “Terbiye” neşir kir. … Jîyanê, me her yekî bi alîyekî ve bir. Cereyanên sîyasî û îctimaî yên demê, ew ber bi pêlên gewre yên xeternak ve bir, ez jî ber bi şîpên (çirên) piçûk ve birim.”
Di salên dawî yên xwendina wî de, ji alîyê talebeyên Kurdên xwendekarên Derûlfunûn ên wê demê ve di roja 27.07.1328 (1912)an de bi navê Cemîyeta Hêvî ya Talebeyên Kurd (CHTK), yekemîn rêxistina xwendekarên Kurd hatîye avakirin.

Li gor gotina Qedrî Cemîl Paşa, bi şîret û ronahîdarîya Xelîl Xeyalî, wî û hevalên xwe dest bi xebata avakirina Cemîyeta Hêvî kirine û Umer Cemîl Paşayê Dîyarbekirî, heta pêkanîna kongreyê ji bo sekreterîya Cemîyeta Hêvî hatîyewezîfedarkirin.  Mesûd Fanî, yek ji endamên CHYK û nivîskarê kovara wê ya bi navê Rojî Kurd bû. Di jimara yekemîn a Rojî Kurd de, bi navê Suleymanîyelî Mesûd û sernivîsa "Hurufumuz ve Teshil-i Kıra'at"  (Herfên me û Hêsanîya Xwendina Wan), nivîsek bi zimanê Osmanî nivisîye. Ew di meqeleya xwe de dibêje:
Ji bo hînkirina 33 tîpan, em nêzîkê du sed şiklan hînê talebeyan dikin, ev, hem ji bo talebeyan û hem jî ji bo mamosteyan barekî pirr giran e. Cehaleta giştî jî, ji ber vê ye. Çareserî ev e ku divê em her tîpekê, tenê bi şiklekî dîyar bikin."
 Herweha nivîseke wî ya din jî, bi îmzeya "Mesud" di jimara yekê ya Hetawî Kurd de, bi sernameya "Dersa'âdet'de (Hetawî Kurd) Ceride-i Garrâsı Müduriyet-i Aliyyesine"  hatîye belavkirin. Cemîyeta Hêvî, heta destpêka Şerê Giştî yê Cîhanê xebatên xwe berdewam kirîye û di nîvê sala 1914an de ji alîyê desthilatdarîya Îtihad û Teraqî ve xebata Cemîyeta Hêvî û endamên wê hatîye rawestandin.
Di dawîya Şerê Giştî yê Cîhanê de, Împeratorîya Osmanî hilweşîya û rewşekê nû peyda bû. Miletê Kurd jî di vê rewşa nû de, rêxistinên nû ava kirin. CTK, rêxistina sereke ya Kurd bû ku di vê pêvajoyê de hatîye avakirin. Her sê birayên Fanîzade jî bûne endamê vê rêxistina nû, di nav xebat û çalakîyên CTKê de ciyê xwe girtine.
Ew ji destpêkê ve di nav xebata mixalif a li dijî Îtihad û Teraqî û herweha dijberê tevgera Mistefa Kemal û hevalên wî bûn. Mesûd Fanî, di vê hengameyê de tête Edenê li nik malbata xwe. Çawa ku min li jorê behs kir, Elî Îlmî yê kekê Mesûd Fanî jî di dawîya sala 1918an de, li bajarê Edenê dest bi neşirkirina rojnameya Ferda kiribû. Di rewşekî weha de, "Dema ku leşkerê Fransayê ketin Edenê, Mesûd Fanî ji bo miteserifîya Cebelîberekat (Osmanîye) hatîye tayînkirin."  Ji ber rexneyên derbarê miteserrifîya wî de, ew, di pirtûka xwe ya bi navê "Atatürk'ün Hayat Felsefesi" de, bersiva sebebê qebûlkirina miteserifîya Cebelîberekatê dide û dibêje: "Siltanê Osmanî ji bo xelaskirina saraya xwe, çîyayê Berekatê pêşkêşî Fransizan dikir…. Dagirtin û êşa vê welatê ezîz bi min re sebir nehiştîbû, ji ber vê yekê min qebûlkirina teklîfa miteserrifîyê, wek deynekî millî didît."
Piştî ku Peymana Lozanê hatîye îmzekirin, bendekê wê yê taybet li ser kesayetên mixalif ên tevgera M. Kemal û hikumeta Anqerê bû. Li gor vê peymanê, dê kesên mixalifê rejîma nû ji Tirkiyeyê bihatana sirgûnkirin û mafê hemwelatîyî ji dest wan bihatana girtin. Navê Mesûd Fanîzade û her du kekên wî jî, di nav vê lîsteya 150an de bûn. Ev biryar di 23ê Nîsana sala 1924an de hatîye tetbîqkirin û di lîsteya "Sirgunên 150an" de, navê wî di rêza 27an de wek Fanîzade Mesûd (muteserifê kevn ê Cebelîberekatê) hatîye lêkirin.
Piştî derçûna ji Tirkîyê, ew û kekê xwe yê Elî Îlmî Fanî jî wekî gelek rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurd, derbasê Binxetê (Sûriyê) bûne. Wê demê Sûriye di bin mandaterîya Fransayê de bû. Xebat û karê xwe yê neteweyî-sîyasî li wê derê di nava rêxistina Xoybûnê de berdewam kirine.

## 3. JÎ BÎNXETÊ VE ÇÛNA PARÎSÊ Û NAMEYEK JÎ BO ZARÊ KÎRMANCÎ

Piştî çar salên xebata nav Xoybûnê, Mesûd Fanîzade ji bo xwendina doktorayê berê xwe dide Parîsa paytextê Fransayê û li Unîversîteya Sorbonê bi krêdîya hikumeta Fransayê dest bi xwendina doktorayê dike. “Di dema amadekirina têza xwe de, ji bo lêkolînê diçe welatên Hindistan, Iraq û Îranê. Di nav mudeta ku li Parîsê dimîne de, li ser felsefeyê jî dixebite.” Di sala 1929an de, ji Fransayê bi sernavê “Qaxezekî Vekirî ji bo Zeynelabidîn Beg” nameyekê balkêş ji bo kovara Zarê Kirmancî şandîye. Nameya navborî, wek pêvek di dawîya vê lêkolînê de heye.

Dema ku wî li Parîsê xwendina xwe ya doktorayê dikir, têkilîya wî ya bi Zeynelabidîn re jî dewam kirîye. Zeynelabidîn Fanî yê Kekê Mesûd, di sala 1926an serdana bajarê Rewandizê kirîye, çûye zîyareta kovara Zarê Kirmancî û ev serdana wî, di jimara sêyemîn a kovarê de hatîye belavkirin. Ger agahîya Taha Toros rast be, bi îhtimaleke mezin kovara Zarê Kirmancî, dema çûna wî ya Bexda û başûrê Kurdistanê ketîye ber destê wî. Îhtimaleke din jî ew e ku kovara Zarê Kirmancî, ji alîyê Zeynelabidîn ve ji bo wî hatîye rêkirin.

Zarê Kirmancî li bajarê Rewandizê û di sala 1926an de dest bi weşanê kirîye. Xwedîyê îmtîyaz û midurmesûlê kovarê Husên Huznî Mukrîyanî bû. Zarê Kirmancî, hem navê çapxane ye û hem jî bi vî navî ji layê xwedîyê çapxaneyê ve kovarek hatîye weşandin. Yekemîn jimara Zarê Kirmancî, di 25ê Gulana 1925an de hatîye çapkirin. “Huznî Mukrîyanî xwedî îmtîyaz û birêvebirê Zarê Kirmancî bûye. Ebdurehman Gîwî yê birayê wî heta jimara (16)ê sala 1929 birêvebirê kargêrîya kovarê bûye.”

Zarê Kirmancî li bajarê Rewandizê û di sala 1926an de dest bi weşanê kirîye. Xwedîyê îmtîyaz û midurmesûlê kovarê Husên Huznî Mukrîyanî bû. Zarê Kirmancî, hem navê çapxane ye û hem jî bi vî navî ji layê xwedîyê çapxaneyê ve kovarek hatîye weşandin. Yekemîn jimara Zarê Kirmancî, di 25ê Gulana 1925an de hatîye çapkirin. “Huznî Mukrîyanî xwedî îmtîyaz û birêvebirê Zarê Kirmancî bûye. Ebdurehman Gîwî yê birayê wî heta jimara (16)ê sala 1929 birêvebirê kargêrîya kovarê bûye.” Li ser bergê kovarê hatîye nivîsandin ku “Kovarekê îctîmaî, tarîxî, fenî û edebî ye” û mehane derdiçê. Kovara Zarê Kirmancî li serhev 24 jimar çapbûne û jimara dawî jî di 23yê Temûza 1932an de hatîye çapkirin.

Têkilîya Mesûd Fanî û Zarê Kirmancî çi wext û bi çi awayî çê bûye, ev baş nayê zanîn. Lêbelê ji nameya wî ya ji bo Zarê Kirmancî dîyar dibe ku vê kovarê dişopîne, diecibîne û piştgirîya weşana wê dike. Dibe ku ew bi têkilîya Zeynelabidînê kekê xwe ji Zarê Kirmancî agadar e, lewma bi sernavê Zeynelabidîn Beg nameyek ji kovarê re rêkirîye. Mesûd, di nameya xwe de, îrfan û pêşkevtina milletekî, bi pêşketina çapemenîya wê ve girê dide û li ser vê mijarê weha dibêje:

“Îrfan û pêşketina her milletekî bi çapemenîya wan tê pêş, çimkî çapemenî zimanê milletê ye û şehameta wî di rihê milletê da ye, cesaretek di dilê wê da ye û mûcîze û afirandin di hişê wî da ye, hêz û quwetek li pişta wî da ye û qabilîyetek ku li tebîetê da ye hemû wan tiştan bi çapemenîyê tê aşkerakirin û ew jî tercûmanî jê ra dike. Serhatî û bas û xwas çi tişt li ser hebûn û tunebûna dinyayê be, em ji çapemenîyê hîn dibîn, çapemenî me agahdar dike ji hemû sîyaseta dinyayê.

Xezeteyên Kurdî yên li Stenbolê derdiketin bên îstisnakirin, xezeteyekî millî û wetenî yê ku yekemîn car li Kurdistanê hatîye neşirkirin, ew jî xezeteya Zarê Kirmancî ye, ku min xwendîye. Zarê Kirmancî bi hîmmeteke mezin û fedakarîyeke giran tê weşandin, rûpelên Zarê Kirmancî ji bo her kurdek esereke giranbiha û yadgarîyeke gelek bi qîmet e.
Di dunyayê da kîjan xezete pirr bilind û bi qîmet e, Zarê Kirmancî ji wî zêdetir qîmet pê ra hatîye dayîn û pirr bi fayde ye ji bo kurdekî. Zarî Kirmancî ku li Rewandizê derdikeve, ji xezeteya Timesê ku li Londrayê derdikeve girîngtir û şayisteyê îstîfadeyê zêdetir e. Herwiha xudanê Zarê Kirmancî zêdetir şayanê teqdîr e, çunke dabeşkerên Timesê bi otomobîlê nebe xezeteyên xwe belav nakin, lê xudanê Zarê Kirmancî, kerek seqet û şelek jî bi destê wî nakevê. Tîpçin, serrastkar, nivîskar, kiravorsaz her bi xwe ye.
Dibe ku em gilî bikin ku xezete mehê carek jî dernakeve, eger gilîyê wisa bikin em neheq in, sebaret bi fedakarîya xudanê wî, hîç kes ji me nekarin li hemberê wî bisekinin. Wî sê sal zêdetir e di nav me da abone kirîye, hêj bedela abonetîyê nedaye, wekî me bihîstîye ji şerman sozê gotinê xwe dide. Her wek çawa ji bo birêvebirina wî xebatek lazim e, ji bo birêvebirin û jiyandina milletek jî fedakarî lazim e û heq e ku em vê ji bîr nekin.
Zarê Kirmancî her wek guh nade herekatê tu berbestek (astengek),herweha li ser berbestan jî derbaz dibe û li meşîna xwe nakeve paş û her dewam dike. Madem ku peyrev û pêşewayekê muqedes a hizir û ziman e, em çima wî neşopînin û çima em vegerînin paş."
Herweha di wê nameyê de, derbarê kultur û edebîyata Kurdî de, dîaloga di navbera xwe û du jineciwanên (madmazelên) Fransizî de weha neqil dike:
"Min ji wan ra behsa edebîyata Kurdan kir ji helbestên Wefayî, Herîq, Ehmedê Kor, Edeb, Nalî, Kurdî, Xeyalî, Mewlewî, Mehwî, Salim, Elîyê Aşiq, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Baba Tahir û Şêx Reza. Ji her yek ji wan helbestvanan min tiştek xwend û (Min got: Sînga te gulî bax e, wî gotî bêdeng be ew yasax e, min got memikê te, gotî lîmon) ji van çend tîpan gelek hez kirin û daxwaz kirin ku ez tekrar bikim…
Piştra wan pirs kir ku gelo ji van zêdetir meqamatê din ên bi Kurdî hene? Min got: Lawik, heyran, niftî, qetar, ellaweysî, nîveşewî, seherî, payîze, eyşe kurî, xezême, xezal, huleşîdî pît, hîcranî, mahûr, ayay, lolo, gêlekî, siwaro, hêhê ye, ji bo eşîrên din jî hor e. Wan pirr bi sersemî ve pêşwazî li axaftina min dikir."
Ji vê nameyê xuya dibe ku zanîna wî ya li ser ziman, edebîyat û folklora Kurdî gelek baş û berfireh bûye.

## 4. VEGER Û MAMOSTEYÎYA SULTANÎYA ANTAQYAYÊ (LYCÉE D‟ANTİOCHE)

Dema Mesûd Fanî li Parîsê xwendina xwe ya doktorayê dewam dikir, kekê wî Elî Îlmî li Antaqyayê bi cî bûbû. Di Sultanîya Antaqyayê (Lycée d‟Antioche) de mamosteyîya edebîyata Tirkî dikir. Mesûd dema ku ji Parîsê vedigere, rasterast diçe nik kekê xwe yê Elî Îlmî li Antaqyayê. Li wê derê ji alîyekî ve karê abûqatîyê dike û herweha di Sultanîya Antaqyayê de jî dersên edebîyat, tarîx û felsefê dide. Mutefekîr Cemîl Merîçê ku wê demê talebeyê wî bûye, di derheqê Mesûd Fanî û mamosateyîya wî de weha dibêje: "Di dema xwendina îdadî de, ew mamosteyê ku min jê feyz digirt, yek ji wan jî Mesûd Fanî bû. Ew doktorê hiqûqê bû û nû ji Sorbonê hatibû.

Ew, di sinifa dehan de, dihat dersa me ya dîroka edebîyatê. Qasê ku tê bîra min, dîroka edebîyatê ya Köprülü bi me dida xwendin.
Pirr xweş Farisî zanîbû. Pêşîyê li rewşa zanîna me mêze kir: Pirsên mîna; şiîr çî ye, edebîyat çî ye? Ji me kirin û talebe bi awayekî xweşik êşand. Ji min re hinek îltimas kir, lêbelê ez li benda îltifatekê ji wê zêdetir bûm. Wê hefteyê ez neçûm mektebê, min bi qasî 7-8 rûpelan, bi manzum şemayekê edebîyata Tirkî amade kir. Di dersa paşî ya hefteya din de, min ew hezeyenname ya ku jê razî bûm pêşkêşî ustad kir. Roja din, Mesûd Beg, bi tevî midur Bazantayî hatin sinifê, bi gotinên ‘maşellah, maşellah’ memnûnîyet û şanazîbûna xwe ji ber hebûna qebilîyetekî weha li sinifê dîyar kirin. Û ji bo xatireya hevnasînê, bi tebrîkên Bazantîy, Nouveau Petit Laroussse ya sala 1933an teqdîmê min kirin. Mesûd Beg, di sinifa yanzdehan de bû mamosteyê min ê dîrokê. Wê salê me pirtûka İsaac Mallet ya li ser Şoreşa Fransayê xwend. Di sinifa diwanzdehan de jî dersa felsefê da me. Di dersê de bi kêmtirîn behsa pênc-şeş kitêbên felsefê dibû.  Ew, bi navê Dr. Mesûd Fanî Bilgili, di nameya xwe ya ku 25ê Çirîya Pêşî ya 1938an de ji bo Riza Tevfîk nivisandîye dibêje: “Ev pênc sal in ku ez li vê derê dersên felsefê didim û îdareya xwe bi wê dikim. Ev du meh in ku ji kar hatime dûrxistin.”

## 4. 1. NİVÎS Û PİRTÛKÊN WÎ

Li gor lêkolîna min, nivîsên wî yên sereke, di kovarên Rojî Kurd û Hetawî Kurd de wek meqale hatine belavkirin. Nivîseke wî bi sernameya “Hurûfumuz ve Teshîl-i Kıra’atı”  [Herfên Me û Hêsanîya Xwendinê] di kovara Rojî Kurd de û nivîseke wî ya din jî bi sernameya “Dersaadet’te Hetawî Kurd Ceride-i Hasi Müdüriyet-i Ailesine” di Hetawî Kurd de hatine belavkirin. Mesûd Fanî, midurîya Mearîfa Cebelî Berekat jî kirîye û “nivîsên xwe yên di rojnameya Ferdayê de, bi navê “Can Bey” nivîsandine.”  Herweha di rojnameya “El-Livâ”yêde nivîsîye ku ev rojname di dawîya sala 1935an li Antaqyayê çap bûye.

## 4.2. TEZA WÎ YA Bİ NAVÊ LA NATİON KURDE ET SON EVOLUTİON SOCİALE

Bi tevî name û meqaleyan, pirtûkên wî jî hatine çapkirin. Têza wî ya doktorayê ya bi navê “La Nation Kurde et Son Evolution Sociale” (Neteweya Kurd û Tekamula wê ya Sosyal/ Kürt Ulusu ve Sosyal Gelişimi), di sala 1933an de li Parîsê hatîye çapkirin. Li ser bergê pirtûkê nivisîye: “MessoudFANY,La Nation Kurde et Son Évolution Sociale, thèse pour le doctorat en droit, Faculté de droit, Université de Paris, Paris, L. Rodstein, 1933, 288p.” Ev pirtûk, di sala 1993an de ji alîyê Prof Dr. Azmi Süslü ve bi temamî nebe jî hatîye wergerandin. Orjînajê pirtûka Mesûd Fanî 288 rûpele e û wergera wê 108 rûpel e. Di wergera Tirkî ya vê pirtûkê de, tehrîfat û kêmanî heye; tehrîfata girîng li ser wergera navê pirtûkê ye û bi tevî wê hinek beşên pirtûkê û bi taybetî jî beşê li ser meseleya Ermenan nehatîye wergerandin. Prof Dr. Azmi Süslü, hemû nebe jî pirranîya têza wî ya bi navê “La Nation Kurde et Son Evolution Sociale”, bi navê “Mesud Fani Bilgiliye Göre Kürtler ve Sosyal Gelişimleri”  wergerandîye ser zimanê Tirkî. Mixabin di vê wergerê de, ji bo ku peyva fransizî ya “Nation” ji bo Kurdan neye bikaranîn, di şûna “Kürt Ulusu ve Sosyal Gelişimi” de, navê pirtûkê wek “Kürtler ve Sosyal Gelişimi” hatîye wergerandin. Divîya navê orjînal ê pirtûkê, wek “Neteweya Kurd û Tekamûla wê ya Civakî” bûya.
Li ser bergê pêşî yê pirtûkê weha hatîye nivîsandin:
“Messoud Fany, Doktorê Hiqûqê li Zanîngeha Parîsê, Kevneparêzerê Cebelû’l Berekatê
La Nation Kurde et Son Évolution Sociale
LIBRAIRIE L. RODSTEIN 17, RUE CUJAS
PARIS-V 1933”
Dema em bala xwe bidin naveroka teza navborî, dîyar dibe ku Dr. Mesûd Fanî, fikrên xwe yên di derbarê Kurdan de, nêzîkê tezên Tirkan kirine. Li gor neqilkirina Süslü, ew di derbarê nifûsa Kurdan de dibêje:

"Ji xeynî bajarên wekî Hekarî û Mûşê, bi taybetî jî li Bazîdê, Mêrdînê, Dîyarbekirê, Elezîz, Melatîye û Urfayê pirranîya nifûsê tirk in." Di beşa li ser ziman de dibêje: "Wekî gelê Kurd zimanê Kurdî jî, zimanekî têkel e û bi nîsbeteke mezin ketîye bin bandora Tirkîya Osmanî; ne tîpên taybet ên Kurdî û ne jî alfabeyekê wî yê xas heye. Ji bo nivisîna zimanê Kurdî, sîstema alfabeya Farisî û têpên Erebî têne bikaranîn."

Ew, li ser eserên xwe yên nivîsandî yên din dibêje; "Esera min a pêşî, broşura bi navê Atatürk'ün Hayat Felsefesi" ye ku ev pirtûk li ser hev 60 rûpel e. "Tu girêdana vê broşurê bi felsefê re nîn e; armanca nivisîna wê, bêtir ji bo xwenasandin û aşkerekirina neheqîyên ku li me hatine kirin e."

Herweha du pirtûkên wî yên bi navê "Manda İdaresinde Hatay Kültür Hayatı" û "5 Temmuz" jî hene.

Li gor agahîya Sedat Bingöl, "dema ku ew li Parîsê dixwîne, di sala 1932an de bi balyozxaneya Tirkîyê re têkilîya wî çêdibe, ji bo nivîsîna têza xwe, ji wan belge û dokumentan taleb dike û dibêje ez dixwazim têzên neteweparêzên Kurd pûç bikim. Ev daxwaza wî ji bo Şukrî Kaya yê Wezîrê Daxilî hatîye rêkirin. Lêbelê ji ber gumanên Şukrî Kaya, nekarîye bersivekê musbet ji wan bigre." Di wê demê de, bi kî re û çi cûre têkilîyên din çêbûne, ev yek baş nayê zanîn. Ew di sala 1933an de, têza xwe ya bi navê La Nation Kurde et Son Évolution Sociale xelas dike, pêşkêşî Unîversîteya Sorbonê dike û di Temûza 1933an de vedigere Sûriyê.

Berîya ku vegere Sûriyê, nameyeke din, di roja 2yê Temûzê de ji bo balyozê Tirkiye yê Parîsê rêdike û tê de dibêje: "Li gor dîtina min, rejîma îro ya ku Tirkîyê xelas kirîye, çareserîya yekane ye û dê miletê Tirk bigehîne mewqîya pêdivî ya ku ew layiqê wê ye. Ez dê bi parastina vê rejîmê, gelek xweşhal bim."

Tiştê balkêş ev e ku serbihûrîya Mehmed Şukrî Sekban û Dr. Mesûd Fanî pirr dişibe hev. Mehmed Şukrî Sekban jî di sala 1933an de li Parîsê bi navê "La Question Kurde" [Mesela Kurd], kitêbekê dide çapkirin.

Nîyeta van her du nivîskaran çi dibe bila bibe, dema em bala xwe bidin naveroka van her du kitêban, ehwalê rewşa sîyasî û psîkolojîk ê her du nivîskaran û konsepta kitêbên wan pirr dişibe hevûdu.

Piştî têkçûna tevgera Agirî û lawazbûna xebat û rêxistina Xoybûnê, êdî ew xwe bi sernekevtî û hêvîşikestî dibînin. Belkî jî ev halê ruhîye yê pêvajoyê, wî ber bi vê zemînê ve kişandîye. Bêguman peywendî û agahîyên ku vê gavê ji alîyê me ve nayê zanîn jî hene. Divê em bipirsin û li dûv biçin; gelo têkilî û pevgirêdanîyek di navbera nivîsandina van her du pirtûkan de heye yan na? Van her du kadroyên rewşenbîr û aktîvîstên tevgera neteweyî ya Kurd ji ber çi fikrên xwe guhartin? Divê ji bo zelalkirin û ronîkirina vê babetê, xebateke berfirehtir bête kirin.

Hevalê wî yê sinifê ji mekteba Huqûqê Burhan Felek li ser nihêrîn û têgihîştina Mesûd Fanî weha dibêje: "Ji hevalên me yên xwendevan Mesûd Fanî hebû; ew ciwanekî ji Edenê bû, tehsîlek baş kiribû, xweş diaxifî û zeka wî wekî cîvayê bû. Ji xwe me bihîstîbû ku ew ji aîleyekê edîb û şair bû. Min dixwest felsefa min, kêf û mîzaca min jî wekî ya wî be.

Xuyekî Mesûd hebû; fikrê ku dohî pê bawer dikir, karîbû îro dijberîya wî bike. Min rojekê ji wî pirs kir: Kuro Mesûd ma li gorî te ye? Tiştê ku te dohî jê re gotîye sipî, tu îro dibêjî reş e!

Ew kenîya û got:

Burhan! Ez heme li meydanê. Alîyê jor (serî) yê min e. Ez dikarim îro fikrekî biecibînim û biparêzim. Sibê naecibînim û dev jê berdidim. Fikir û qenaet, ji bo min wekî gomlekê (kirasê) şevê ne. Li xwe dikim, li xwe dikim û diavêjim. Ez ne yê gomlekê me, gomlek yê min e. …

Digel ku ew salekî ji min piçûktir bû, min ev felsefa wî ya berfireh tênegihîştibû. Paşê ji salan şûn ve min jî têgihîşt ku bi temamî xwexistina nav qalibên dogmatîk û îdeolojîk çiqas 'abes' e."



Dawîyê, em dibînin ku her sê birayên Fanîzade, di salên dawî yên Împeretorîya Osmanî û destpêka damezrandina Cimhurîyetê de, bi fikir û kirinên xwe mixalefê Îtihad-Teraqî û Quwayê Mîllîye bûne, di nav xebat û tevgera kulturî û sîyasî ya Cemîyeta Hêvî, CTKê, CÎK/QÎK û Xoybûnê de cî girtine, ji ber vê hatine cezakirin û navê wan ketîye “Lîsteya 150an.” Dr. Mesûd Fanî, bi pênc zimanan zanîbû; Fransizî, Erebî, Farisî, Kurdî û Tirkî. Piştî vegera ji Fransayê, li Antaqyayê bi cî bûye, li wê derê demeke dirêj meslekê abuqatîyê kirîye û nêzîkê pênc salan jî di Lîseya Antaqyayê de mamosteyîyadersên felsefê kirîye. Piştî ku Antaqya tevlî îdareya Tirkîyê bûye, êdî wî jîyana xwe demeke dirêj li wê derê derbas kirîye. “Di salên dawî yên jîyana xwe de li taxa Levent a Îstenbulê bi cî bûye û roja 15.11.1979an de koça dawî kirîye. Gorna wî li goristana Zincirlikuyu ye.” Dema em bala xwe bidin jîyana 90 salî ya rewşenbîrekî Kurd ê wekî Dr. Mesûd Fanî, bi erînî û neyînîyên xwe ve gelek tiştên ku jê bêne derxistin hene. Di teza wî ya bi sernavê “La Nation Kurde et Son Évolution Sociale” de, gelek tiştên ku bêne rexnekirin û gengeşîkirin jî hene. Di fikrên wî yên li ser
Kurdan de guherînên girîng çêbûne; bi temamî nebe jî wî tezên xwe yên di derbarê Kurdan de nêzîkê tezên fermî yên Tirkan kirine. Bêguman em dê rexneya vê yekê bikin û ji wê encamên pêdivî jî derbixin, lêbelê bêyî ku muhakemeya rast û xeletîyan bête kirin, redkirina her cûre kar û xebata wî ya civakî-neteweyî nerast e. Di dîrokê de, ku her bûyerek li gorî rewşa sîyasî û civakîya dema xwe bête xwendin û şirovekirin, dê encameke hîn nêzîkê rastîyê derkeve meydanê.

# Bûbê Eser



## Ew in dijminê mirovayî

Heta ku em ev bin
Ne xwedî hêz bin
Ne xwedî dewlet bin
Em ê reben û bidest bin

Heta em biparêzin bratiya gelan
Em ê wenda bikin bi hezaran
De bese êdî bigirin hemî derîyan
Êdî silavê jî nedin wan hovan

Wan  welatê me perçe kirine
Baweriyên me ji hev qut krine
Ji bona em nemînin weke kurd
Her tim li serê me dixin mîrkud

Bûbê Dibêje û dike qazî û dinalîne
Xwe dûr bixin ji wan ew alî ne
Xwe  dûr bigrin ji roman ew ne xalî ne
Hukmê  xwe li ser serê me danîne

Nepeyivîn bi zimanê wan,
xwe dûr bixin ji adetên wan
Bavêjin hemî hêjayî û malê wan
Li xwe vegerin û bibînin wan.

# RONÎ STÊRK

## Rewşa Zimanê Kurdî Li Almanyayê






Divê em zimanê kurdî wek mîrasekî ji zarokên xwe û nifşên nuh re bihêlin. Mijara „Perwerdeya Bi Zimanê Kurdî“ mijarek berfireh e. Pêwîste ku lêkolînên curbercur di derheqê vê mijarê de were kirin û ji bo kesên tekîldaran were pêşkeşkirin. Di vê kurteraportê de em dixwazin rewşa perwerdeya bi zimanê kurdî ya fermî li dîyasporayê lê bi taybetî jî li Almanyayê binirxînin.Di seranserê Awrûpa de welatê ku herî zêde kurd lê dijîn Almanya ye. Ji ber ku di statîstîkan de kurd li ser navê welatên ku jê hatine ango wek Sûrîyî, Îranî, Îraqî, Tirkîyeyî û hwd. hatine qeyid û tomarkirin, çiqas kurd li Almanya dijîn nayê zanîn. Lê li gorî lêkolînên hatiye kirin, tê texmîn kirin ku hejmara wan nêzîkî 1.500.000 ye û li Almanyayê mezintirîn koma biyaniyan in. Yekem kovara bi kurdî (ya latînî) ji aliyê Mîr Celadet Ali Bedirxan li diyasporayê, li bajarê Şamê derçû û bû bingeha perewerdeya kurdîya latînî ya nûjen.

Di heman demê de li Yekitiya Sovyeta kevn li Komarên Gurcistanê, Ermenistanê û Azerbeycanê gelek xebatên hêja yên çandî, hunerî û perwerdehiyê derket holê;evdem demagulvedana zimanê kurdîye. Dema em behsa „Rewşa Perwerdeya Zimanê Kurdî li Awrûpa“ dikin, divê em rewşê dîrokî û kronolojîk bifikirin. Di vir de, ger em Kafkasyayê jî di nav Awrûpayê de bihesibînin û dîroka perwerde û pêşketina zimanê kurdî binirxînin, li Awrûpayê sê EKOL derdikevin pêş.
1. Ekola Sovyeta Kevin
2. Ekola Swedê
3. Ekola Almanya
1 Ekola Sovyeta Kevin
Dema em behsa destpêka zimanê kurdî û perwerdeya bi zimanê kurdî (mebesta me li vir zaravaya kurmancî ye) dikin, bêgûman berî hertiştî rol û bandora „Ekola Sovyeta Kevin“ derdikeve pêşberî me. Ji salên 1930an heta salên 1980an çi bi çapkirina berheman, çi bi bernameyên Radyo Erîvanê, kovar, muzîk û şanoyê de, bi kar û xebatên xwe yên hêja zimanê kurdî pêşve birin û kirin ku di hemû qadên jiyanê de zimanê kurdî bibe zimanê rojane. Ji ber ku mijara me ya îro bi taybetî li ser rewşa perwerdeya bi zimanê kurdî li Almanya ye, em ê bihêlin ku ev mijar di dosyayek din de bi berfirehî were nirxandin.

## 2. Ekola Swedê

“Ekola Swêdê” di perwerdeya zimanê kurdî de li Awrûpayê ji destpêka salên 70an heta îro rolek girîng list û hîna jî dilîze. Ev ekol bi xebatên xwe,him li welatên Avrûpa û him jî li Kurdistanê di beşa perwerdeya bi kurdî bandorek girîng hiştiye.

Ji ber ku tekiliyek xurt di navbera perwerdeya ekola Swedê û ya li Almanya re heye, pêwîst e em kurteawirek bavêjin vê ekolê û bibin xwedî agahdariyên înformatif.

### 2.1 Destpêk: Kurtekronolojiya perwerdeya zimanê kurdî li Swedê

Di salên 1975an de parlamentoya Swedê „Reforma Zimanê Dayikê” pejirand û di sala xwendinê ya 1976/77an de bi cih hat.Li gorî vê reformê malbatên ku di mala xwe de bi zarokên xwe re ne bi swêdî, bi zimanek din diaxivîn; qanûn ji zarokên wan re rê vekir êdî bi zimanê xwe bi awayek fermi di xwendegahan de perwerdeyê bistînin. Di sala 1976an de cara pêşî mamoste Reşo Zîlan li Swêdê li bajarê Upsalayê dest bi mamostetiyê dike û bi fermi ders dide şagirtên ji polên 1-9an. Ji vê tarîxê (1976an) û heta îro jî li Swêdê perwerdeya bi zimanê kurdî heye û hejmara şagirtan her ku çûye pirtir bûye. Wekî mînak perwerdeya kurdî di sala 1996/97an de dibe 3129 û di sala 2019an de digihê 8672an. Di sala 1984an de li bajarê Tenstayê cara pêşî pêşxwendegeha kurdî vebû. Dîsa di heman salê de jî li Zanîngeha Stockholmê beşa mamostetiya kurdî vebû û heta sala 1991an dom kir. Xwendina vê beşê 2 sal bûn. Li gora statîstikan, di sala xwendinê ya 2018/19an de, li Swedê di polên 1-9an de 15.629 zarok û ciwanên kurd hene û ji wan 8672 şagird beşdarî perwerdeya kurdî dibin û di navbera 200 -250 mamoste dersên kurdî didin.

### 2.2. Li Swedê rewşa pirtûkên dersên kurdî

Di bavbera salên 1975-1985an de, li Swedê, pirtûkên ku meriv bêje pirtûkên kurdî yên dersê ne tune ne.

Di sala 1985an de yekem pirtûka kurdî ya kurmancî „EM BIXWİNIN“ ji aliyê Enstituya Dewletê ya ji bo Materyalên Hîndekariyê derçû.û dûre jî „EM BINIVİSIN“ derdiçe. Pirtûka yekem ya lîseyê jî bi navê „DERGUŞA NASNAMEYÊ“ di sala 2003 an de derdikeve.

Di navbera salên 1980-81an de kovarên zarokan bi navê KULÎLK, HÊLÎN û HÊVÎbi alîkariya dewleta Swedê ji aliyê komelên kurdan ve derdikevin.
Herweha gelek pirtûkên zarokan jî, di sala 1982an de ji zimanê swedî bo kurdî hatine wergerandin. Di vê demê de gelek weşanxane dest bi çapkirin û weşandina berhemên kurdî kirin.

Ji ber ku mijara min konkret perwerdeya kurdî ya fermî di xwendegehan de ye, ez mijara perwerdeyên ku taybet di komel û enstîtuyan de tên dayin nakim. Lê divê neyê ji bîr kirin ku piştgrîya dezgeh û saziyên kurdan di beşa perwehiyê rolek girîng dilîzin.

Dema em bi gelemperî li sîstema perwerdekirina Swêdê dinêrin, em dibînin ku ji bo pêşketin û berfirehkirina ziman dewlet ne tenê mûçeyên (meaşên) mamosteyan, herweha hemû xerckirinên bo dersan wek materyal, pirtûk û hazirkirin û çêkirina wan jî dide û kurdên li wir hebûna van derfetan baş bi kar tînin.

## 3. Ekola Almanya (û welatên din ên Awrûpa)

Li dû derstpêkirina perwerdehiya bi zimanê kurdî li Swêde li Almanya jî kurd ketin nav tevgerekê.

Ji bo parastin û hemû mafên zarokan di sala 1989an de ji aliyê Dezgeha Yekitiya Netewan (UNO) peymana ku ji 54 xalan pêk tê belav kir. Heta niha (Tirkiyê jî di nav de) 180 dewletvê peymanê îmze kirine. Di vê peymanê de hemû mafên zarokan wek nasname, ziman, çand, hînbûna di xwendegahan de û hwd.tê misoger kirin. Ev Peyman di sala 1992an de ji alî Almanya jî hate pejirandin û îmzekirin ku ev buyer bû bingeha perwerdeya bi zimanê kurdî ya fermî di xwendegehên Almanyayê de.

### 3.1 Kurtekronolojiya perwerdeya zimanê kurdî li Almanya

Hîna di salên 1970an de hin hewldanên perwerdeya kurdî li Almanya hebû. „Federasyona Komeleyên Kurdistanê ên Demokratîk“ dersên kurdî ji bo endamên xwe wek kursên ziman didan. Lê wek perwerdeya fermî, cara pêşî di sala xwendinê ya 1992/93an de li Bajareyaleta Bremenê, dersên kurdî bi navê„Dersên Zimanê Dayikê-Kurdî“ dest vê kir û bi du mamosteyan, ku niha yek ji wan jî ez im, di 9 xwendegan de heta îro bê navber tê dayin. Li dû eyaleta Bremenê di sala 1993an de li eyaletên Hambûrg (lê mixabin piştî demekê dersdayin hate rawestandin), Niedersachsen û 1994n de jî li Nordrhein-Westfalen (NRW) dersên Zimanê Dayikê Kurdî ket nav mufredeta xwendinê. Ji sala 2019an û vir de jî li Eyaleta Berlînê û di sala 2020an de jî li Rhainland Pfalz de dersê kurdî tên dayin.

Li Almanya ya federal ku ji 16 eyaletan pêk tê, hukumeta navendî tevî karê perwerdehiyê nabe û her eyalet bi xwe biryarê didin, bê ew ê mufredeta perwerdeyê çawa be.

Herweha dîsa ew bixwe biryarê didin bê di hundir vê mufredatê de ji bo Zimanê Dayikêjî cih heye an na. Hinek eyalet perwerdehiya zimanê dayikê napejirînin û derfet nadin ku dersên dayikê di xwendegehan de were dayin. Hinek eyalet jî vê yekê dipejirînin, lê tenê bi şerta ku ev yek bi riya konsolosxanan re were birêvebirin. Lê Ji ber ku Kurdistan wek dewlet nehatiya naskirin û konsolxanê Kurdistanê jî tune ne, di van eyaletan de perwerdeya kurdî jî nikare were dayin. Lê hinek eyalet jî bêyî vê şertê (konsolxana) perwerdeya zimanê dayikê pejirandin. Di nav van eyaletên ku perwerdeya zimanê dayike nas dikin, îro li seranserê Almanya tenê li 5 eyaletan perwerdahiya bi zimanê kurdî tê dayin. Navên van eyaletan ev in: Bremen, Berlîn, Niedersachen, Nordrhein-Westfalen û Rhainland Pfalz.

Li gorî statîstikên di destê me de ne li van her 5 eyaletan 28 mamoste bi awayek fermî hatine wezîfedarkirin û di 37 bajara û 75 xwendegehan de ji polên 1-10an de (xwendegehên serateyî û navîn) Dersên Zimanê Dayikê Kurdî (Kurmancî, Soranî û Kirdmanckî) didin nêzîkî 3000 şagirtan. Piraniya wan li eyaleta Nordrhein Westfalen (NRW) ne.

**Li gorî eyaletan Dersên Zimanê Dayikê - Kurdî**

• Nordrhein Westfalen (NRW): 16 mamoste, di xwendegehên serate û navîn, pola 1-10

• Nidersachsen: 8 Mamoste, di xwendegehên serateyî de

• Bremen: 2 Mamoste, di 9 xwendegehên serateyî de, 230 şagirt, pola 1-4

• Berlin: Mamosteyek, 35 şagirt, di 3 xwendegehên serateyî.

• Rheinland-Pfalz: Mamosteyek, 45 şagirt, xwendegehên serate û navîn.

Bajarên ku Dersên Dayikê Kurdî tên dayin ev in:

**Li eyaleta Nordrhein Westfalen:** Köln (kurmancî, soranî), Bochum (kurmancî û soranî), Duisburg (kurmancî û kirdmanckî) li van bajarên din jî tenê dersên kurmancî hene: Bonn, Oberhausen, Leverkusen, Herne, Dortmund, Essen,Wuppertal, Mülheim, Bielefeld, Herford, Wesel,Dinkslagen, Voerde, Senden, Steinfurt, Rheine, Greven, Kleve, Hamm

**Li eyaleta Niedersachsen:** Oldenburg, Hannover, Hildesheim, Celle, Achim, Peine, Osteholzscharmberg (li bajarên Wildeshausen û Cloppenburg ji ber tunebûna Mamoste ders niha nayê dayin)

**Li bajareyaleta Bremenê:** Bremen

Li Rheinland-Pfalz: Mainz, Bad Kreuznach

**Li Bajareyaleta Berlînê:** Berlîn

Mamosteyên kurd ênku wezîfedar in, xwedî heman şert û mercênmamosteyekî ne ku bi fermî dersên almanî didin:

• Ew jî ji alî wezareta perwerdehiyê ve tên tayin kirin.

• Peymana wan a kar wek mamosteyên din in.

• Ew jî heman mûçeyê (maaşê) werdigrin.

• Ji bo bê pirsgirêk dersên xwe karibin bidin hemû şert û mercên dersdayinê ji alî Wezareta Perwerdeyê tê bicîhkirin.

Hêjayî gotinê ye ku li derveyî xwendegehan li hinek zanîngehên Almanya wek Bremen, Berlin, Essen, Bielefeld, Hambûrg û hwd. ji zû de ye Dersên Kurdî wek „Kursên Taybet“ tên dayin. Lê cihê şaneziyê ye ku cara pêşî, ji sala 2014an û vir de li zanîngeha Carl Von Ossietzty Universität Oldenburg (li bajarê Oldenburgê) ji alîyê min ve zimanê kurdî wek „Basis Modul“ di nav modulên bijarte de tê dayin.

Li vir xwendekar di dawiya semestirê de li gora encama ezmûnê (credit points) notên kredîyan xwe (3 an 6 KP) werdigrin û zimanê kurdî di nav wan modulên din ên Zanîngehê de tê nivîsandin û notên wan tê hesabkirin.

### 3.2. Li Almanya Rewşa Materyalên Perwerdekirinê

Wezaretên Perwerdehiyê berhem û materyalên zimanê kurdî bi xwe çap nake û ti alîkarî jî ji bo wan nade. Lê berhemên ku di dersayinê de tên bikaranîn, ji alî Komisyona Wezareta Perwerdehiyê ve tê kontrolkirin û tenê li dû erêkirina wan ev berhem dikarin di dersdayinan de bên bikaranîn.
Li vir pirsgirêka berhemên dersdayinê û ji aliyê Wezareta Perwerdehiyê pejirandinan wan derdikeve pêş me. Mamosteyên me an berhemên ku li Swêdê hatine amadekirin, an jî berhemên „Yekitiya Mamosteyên Kurd li Awrûpa“ (YMK) amadekirine, bi kar tînin. Di nav YMK de Komisyona Berheman heye û ev komisyon bi karê afirandina berheman ji pola 1 heta 10an mijûl dibin û heta niha bi dehan berhemên perwerdekirina, ji bo şagirdan amade kirine û karê xwe berdewam dikin. Ji bilî berhemên ku ji alî YMK ve hatine weşandin, berhemên Alan Dilpak bi navên Xwendin ronahî ye, (1993)
Binêre, binivîsîne, birengîne (1993) û Gencîneya peyvan 1,2,3,4
jî hêjayî bi navkirinê ne û mamosteyên ku bi taybetî di xwendegehên serateyî de ders didin ji wan siûdê werdigrin.
Wezareta Perwerdehiyê ji bo bidestxistina berheman ji bo serê şagirtekî alîkarî dide mamsoteyên kurd.

Mînak li Bajareyaleta Bremenê ji bo xwendina salekê 5 Euro ji şagirdekî tê terxandin, da ku mamoste karibe ji wê/wî re materyalên xwendinê bikire. Ev dirav (pere) li eyaleta NRW de ji bo şagirdekî 28 Euro ye.

### 3.3 Pêvajoya Serlêdanên Dersên Zimanê Dayikê Kurdî û Şert û Mercên Mamosteyan

Li her eyaletekê şert û mercên perwerdekirina bi zimanê dayike dikare cûda be, lê bi gelemperî ji bo ku dersên zimanê dayike were dayin pevajo wusa ye:
Di destpêkê de di xwendegeha ku dersê zimanê kurdî ew ê lê were dayin dive dê û bav ên şagritan daxwaza dersên kurdî bikin û Forma Serlêdanê ya zimanê dayikê dagrin û vê formê bidin rêveberiya xwendegehê. Ji bo ku serlêdan were pejirandin divê di xwendegehê ya serateyî bi hindikayî 15 û di ya navîn (Oberschule) de jî bi hindikayî 18 şagirt li xwendegehê qeyidkirîbin. Lê ne pêwîste ku hejmara tê xwestin hemû li xwendegehekê bin. Rêveberiya xwendegehê formên serlêdanê dişîne DaîreyaPerwerdeyê (Schulamat) an jî Wezareta Perwerdeyê. Karmendê bêşa zimanê dayikê ya Wezareta Perwerdeyê bi rêveberiyê xwendegehê (mudur) re dikeve pêwendiyê û şert û mercên dersdayinê dinirxînin.
Li vir mijarên wek bê hejmara şagirtan temam in an jî bê polek ji bo dersdayinê amadeye an na tên nirxanidn. Li dû zelalkirina van xalan êdî bi fermi daxwuyaniyek li ser malperaWezarete Perwerdehiyê tê dayin, ku ew li mamosteyekê/î ji bo zimanê kurdî digerin û kesên dixwazin dikarin heta dema ku hatiye beyankirin serlêdanên xwe bikin.

Di vê daxwuyaniyê de şert û mercên mamostetiyê tê rave kirin ku bi gelemperî wusa ye:
Mamosteyê/a ku dixwaze serî lê bide divê:
• Xwedî diplomeya mamostetîyê; an jî dîplomaya ji beşek wek mamostetiyê (mînak zanîna perwerdehiyê)li Almanya be
• zanîna zimanê kurdî ya xwe îspat bike, ku di asta gelek baş de ye û dikare dersan bide.
• Ger kesek ji welatê ku jê hatiye mamostetîyê xwendibe, mamostetî kiribe, xwedî zanîna kurdîyek baş be û ligel wan jî li Almanya xwedî mafê karkirina wî/wê hebe û herweha jî zimanê almanî bi hindikayî di asta C1 zanibe.
Li vir hin problem di tayinkirina mamosteyan de derdikeve pêş me. Carina em dibînin ku mamosteyek li Kurdistanê mamostetî kiriye û kurdî jî gelekî baş zane lê sertîfîkaya wî ya almanî ya di asta C1 tune ye. An jî mamosteyek li li vir xwendiye û almanî baş zane, lê kurdîya wê/wî ne di wê asta dersdayinê de ye.
Ji bo çareserkirina vê problemê Yekitiya Mamosteyên Kurd (YMK) di nav hewldanê de ye, ku bi hevşirîkatiya zanîngehekê KursênMamosteyên Kurdî organîze bikin û mamosteyan li gora sîstemema perwerdeya almanya perwerde bikin.

### 3.4 Rola Malbat, Dezgeh û Saziyan û Çend Pêşniyar

Ji bo ku dersên zimanê dayikê kurdî li xwendegehekê were dayin pêdiviya xebatek muşterek bi malbat, dezgeh û saziyên fermî re heye. Berî hertiştî divê tekiliyek xurt di navbera malbatan de hebe.

Ya baş ew e ku dezgehek malbatan hebe ku karibe di beşa perwerdeyê de temsîlkariya hemû malbatan bike û li gor pêwistiyê bi dezgehên fermî re têkeve têkiliyê. Herweha divê têkiliyek xurt di navbera malbat û mamoste de jî hebe. Mamoste divê bi awayek sîstematîk di xwendegeha ku ew dersan dide civînan bi dê û bavan re çê bike û wan di derheqê metod û awayên dersdayinê de agahdar bike. Ji aliyê pedegojîyê gelekî girîng e ku dê û bav xwe di nav perwerdehiya kurdî ya bi zarokên wan re heye de his bikin, da ku ew jî karibin alîkariya zarokên xwe bikin û di mijara biberdewamî beşdariya dersên kurdî de bandorek erênî li ser wan bihêlin. Di asta dersdayinek serkeftî de rol û fonksiyona komel û dezgehên kurdî yên li Almanya jî gelek girîng in. Ew dikarinçi di mijara komkirina navan, çi jî di destpêkirina xebatên perwerdeya kurdî de bi rêya semîner û konferansên înformatif de dê û bavan di derheqê hebûna mafê zimanê kurdî agahdar bikin. Herweha ew jî wek komel karin rola xwe ya civakî û perwerdeyê bi kar bînin û şopînerê dersdayinên kurdî bin.

Pêwendiyên di navbera mamoste, malbat, dezgehên kurd û saziyên fermî; bi hevre karkirina wan di asta perwerdeyê de pêwîst e. Ji ber vê yekê jî divê ev pêwendî mayinde be û danûstendin taybetî bi wezarate perwerdeyê, bi sendîkaya perwerdeyê (GEW) û Landes Institut fur Schule hebe.

Hêyajî gotinê ye ku di perwerdeyê de mamoste aktorê sereke ye. Rol û fonksiyona mamosteyên jêhatî gelekî girîng in.

Ji bo ku mamosteyek bikaribe vê rola xwe baş bi cih bîne, divê ew di pîşeya xwe de di nav zanînê de be, xwe pêş bibe; xwedî kompetenseka bilind û pedagojîk be.
Ez di wê baweriyê de me dema bi beşdarbûna berpirsiyarên sazîyên têkildar „Kordînasyona Ziman û Perweheiya Kurdî li Awrûpa“ were sazkirin, em dikarin ji bo hemû pirsgirêkan re bi hevdu re çareseriyekê jî bibînin.

Gotina dawî dema li welatekî zimanek bi fermi were naskirin û mafê perwerdehiyê jî were dayin, ev yek di zagonên wî welatî jî de jtê parastin. Dewlet tenê bi naskirina zimanekî karê xwe naqedîne; ew di heman demê de li dû naskirina zimên ji bo pêşketina û bi taybetî jî perwerdehiya bi wî zimanî hemû derfetan diafirîne. Ev mafek e xwerû ye.











# FARÛQÊ FEROYÎ

## NEZANÎN NE ŞERM E

Rojekê ji rojan;

Hz. elî û zaneyên der dora wî li hev kom dibin û dikevin nava nîqaşên zanistî. Ji wan oldaran yek ji hz. elî dipirse û dibêje:

-Ya şêrê xwedê; dema kûçik sala xwe tijî dike çawa tê fam kirin?

Hz Elî difikire; dike û nake nizane bersiva vê pirsê. Ji civata xwe ra dibêje:

-Ez ê lêkolînê bikim û sibê bersiva vê pirsê ji we ra bejim...

Wê şevê xew nakeve çavên hz. elî û sibê zû ji mal derdikeve û xwe bi xwe dibêje; " li filan gundî ilmdarekî sewalan heye, heke zanibe ew ê bizanibe." Bi rê da li şivanekî rast tê. Dema ku şivan çav li hz. elî dikeve bi lez û
bez tasek şîr didoşe û xwe ji nav pezê xwe bera ser rêya wî dide û kulavê xwe li ber lingên wî radixîne, tasa şîr dirêjî desta dike û dibêje:

-Oxir be ji te ra ya şêrê Xwedê. Naha tu westiyayî. Fermo bîskê rûnê, bêhna xwe veke...

Hz. Elî tasa şîr ji destê şivên digire û li ser kulêv rûdine, şîr û nanê xwe dixwe û pêva; şivan jê dipirse û dibêje:

-Ya şêrê Xwedê rêwîtiya te bi ku da?

-Ne tu bipirse û ne jî ez bêjim.. Ji doda halmesla min ev e...

-Ya şêrê Xwedê; ji bersîva vê pirsê hêsantir û ne tiştekî din...

-Çawa? Tu bersiva vê pirsê dizanî?

-Belê, şêrê Xwedê. Ez dizanim...

Kêfa hz. Elî bêtir ji şivên ra tê û dibêje:

-De ka bibersivîne vê pirsê...

-Ya şêrê Xwedê; kûçik hetanî sala xwe tijî neke rûdine û dimîze. Lê sala xwe tijî bike û pê ve li piyan, lingekî

xwe radike û dimîze. Bersîv ev e...

Hz. Elî pirr kêfxweş dibe û berî ku ji nîvê rê bi paş de vegere, ji şivên ra dibêje:

-Ez te jî vedixwînim im civata îşev...

Hz Elî; bikêf ji cem şivên bi paş ve vedigere û diçe. Dibe êvar şivan pezê xwe dajo govê û ew jî berî dide hêwan a

ilmdaran. Dema ku dikeve hundirê hêwanê; Hz. Elî ji ber wî ra dibe ser piyan û şûna xwe nîşanî wî dide dibêje:

-Fermo. Were a li vir rûnê...

Şivan û civat tev bi hev ra, li hemberî vê nêzîkatiyê matmayî dimînin...

Hz Elî dizîvire ji civatê ra dibêje:

-Ez dizanim hûn tev ecêbmayî manin, lê îşev mamosteyê civatê şivan e. Ji ber ku pisporê mijarê ew bixwe ye...



# MAMO KADER

## Tirsa Heralî

Heriya heft gundan di nav têlên porê te de
hatiye veşartin.
Tirsa xwe heralî bajo,
ber bi newalan ve, ber bir valahiyê,
kal bi kal wê kevin bike.
Destên ji xebatê dilsar neynika têkçûna ruh in.
Kavil in,
lêvên nebûnê bi ser ruh de dixwînin,
ewên tîp bi tîp wendabûnê bi lêv dikin,
sirgûn in ji hebûnê.
têkçûn zindî ye.
Li vir,
Wendabûn xwe begekî pozbilind dibîne.
Bi destên henekirî,
ezê xewnên kavirîn bikim sifreya hebsiyên
hêviyan.
Taya mirinê,
ezê qizêz bi qizêz ji sawîrên wan bişom.
Mîna bayekî heralî,
ezê ço bikim ronahiyê legan bi legan.
Li vir,
heye bo te çiyayên ji xwenan,
kenê li ser lêvên qîzan.
Bo te,
ferheng dîroka germa kêvir
û xwîna xwezayê dihûne.
Êş lîstika hespên bêmal e.
Lê bo te,
Cehniyekî bermalî dive.
Da ku, xwîna xwe di te da saz bike.
De bajo hestên germ bi rojavayê jiyanê ve,
Bajo.



# Lİ SER SÎNEMAYA KURDÎ Û SÎNEMAYA CÎHANÊ 10 PİRTÛK


## AMADEKAR: RÛMET MED

Ji destpêka kişandina fîlman bi vir de 125 salan derbas bûne. Hunera heftemîn ango "Sînema" li gorî hemû hunerên bingehîn, hunereke ciwan e û li seranserê hemû cîhanê, geşedana xwe bi awayên cûr bi cûr didomîne û hin caran xwe ji nû ve diafirine. Nivîskariya hunerê, wêjeyê û sînemayê ji bo famkirin û têgihiştina wan gelek girîng e û ji ber wê di ciheke taybet de ye ku ji bo pêşveçûna hunerê û fikrên nû, diyarker û pir hêja ye. Ez jî bi vê hest, fikr û ramanê, ji bo temaşevan û sînemahezên ezîz, lîsteyeke pirtûkên sînemayê amade kirim ku tê de 10 lêkolîn û xebatên girîng ên ku li ser sînemaya Kurdî û sînemaya cîhanê hatine nivîsandin, cih digrin.

### Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor û Mirin


Pirtûka "Kürt Sineması: Yurtsuzluk, Sınır ve Ölüm" (Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor û Mirin, 2019), geşedana dîrokî ya sînemaya Kurdî vekolîne ku ji aliyê derhêner û lêkolînera kurd Mizgîn Mujde Arslan ve bi tirkî hatiye amade kirin. Mizgîn Mujde Arslan, di nava çavkaniya girîng de, gotar û nivîsên ku li ser sînemaya Kurdî hatine nivîsandin û ji bo temaşavan, sînemavan, xwendevan û sînehezan bijartine û berhev kirine. Piştî 8 salan, çapa duyem a pirtûka "Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor û Mirin", di dawiya meha Gelawêja sala 2017'ê de ji aliyê Weşanên Agora Kitaplığı ve hate weşandin û du mehan paşê jî çapberiya pirtûkê derçû.
Nivîskar/Amadekar: Mizgîn Müjde Arslan.
Weşanxane: Agora Kitaplığı. Rûpel: 400

03




## Sînemaya Kurdî


Pirtûka “Sînemaya Kurdî” di sala 2017ê de ji aliyê lêkonîner û nivîskarê kurd Dilazad A.R.T ve bi kurdî hatibû amade kirin û bi awayekî dîjîtal (e-pirtûk / pdf) ji Weşanên Zanîngeh hate weşandin. Xebata lêkolîna sînemayê ji çar beşan pêk tê û her yek sernavên pirtûka “Sînemaya Kurdî” geşedana dîrokî ya sînemaya Kurdî vedikole. Gotarên ku di nava pirtûka Sînemaya Kurdî de de cih digirin; “Nerîneke Giştî Li Ser Sînemaya Kurdî”, “Sînemaya Bêwelat, Sînemaya Kurdî”, “Di Peydabûna Sînemaya Netewî de Pirsgirêkên Sînemaya Kurdî”, “Zarê” ne.
Nivîskar: Dilazad A.R.T. Weşanxane: Weşanên Zanîngeh. Rûpel: 55




## YOL - Riya Welatê Xerîbiyê

Pirtûka “Yol - Riya Welatê Xerîbiyê” ji aliyê çêkerê fîlman ê Swîsreyê Edi Hubschmid ve hatiye amadekirin ku li ser serpêhatiya hevkariya Cactus Filma Zurîhê bi lîstikvanê sînemayê, derhêner, nivîskar û rewşenbîrê marksîst ê kurd Yilmaz re ye. Di salên 1980yî de encama vê hevkariyê de du fîlmên derhênerê nemir Yilmaz Guneyî ji pargîdaniya Cactus Filma Zurîhê hatin çêkirin. Xebata “Yol - Der Weg Ins Exil” di sala 2017ê de bi elmanî hatibû nivîsîn û pirtûk, piştre bi navê “Yol - Riya Welatê Xerîbiyê” ji bo kurdî, bi navê “Yol - Bir Sürgün Hikayesi” ji bo tirkî û bi navê “Yol - The Road to Exile” ji bo inglîzî hate wergerandin û ji aliyê Weşanên Publishing Partners ve hate weşandin. Wergerê pirtûkê yên bi kurdî û bi tirkî, lîstikvanê sînemayê yê kurd Husên Duzen e. Ev pirtûka Edi Hubschmidî qala jiyan û xebatên Yilmaz Guneyî ku li salên sirgûnê dike û hevaltiya wî ya bi derhênerê kurd re nîşan dide. Fîlmê “Yol” (1981) yê derhêner Yilmaz Guneyî di sala 1982an de li Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Cannesê Xelata Pameya Zêrîn wergertibû.
Edi Hubschmid Ji Almanî Bi Wergera: Husên Duzen
Weşanxane: Publishing Partners. Rûpel: 224.







## Derhênerên Jinên ên Cîhanê

Lêkolîna “Celluloid Ceiling: Woman Film Directors Breaking Through” Derhênerên Sînemaya Jinên Cîhanê) ku ji aliyê du nivîskarên sînemayê, nivîskara Îrlandayê Gabrielle Kelly û nivîskara Awistiralyayê Cheryl Robson ve bi îngilizî hatiye nivîsandin û qala sînema û xebatên yekem derhênera Jin Alice Guy-Blaché û derhênerên jin ên sînemayê yên; Jane Campion, Lucrecia Martel, Park Nam-ok, Haifaa Al-Mansour, Safi Faye, Yeşim Ustaoğluyê dike. Pirtûk, bi wergeriya Nazli Pakkan re ji aliyê Weşanên Agora Kitaplığı ve, bi navê “Dünya Kadın Sinema Yönetmenleri” (2016), bi tirkî hatibû weşandin.
Nivîskar/Amadekar: Gabrielle Kelly û Cheryl Robson / Werger: Nazli Pakkan. Weşanxane: Agora Kitaplığı. Rûpel: 400


## Sînemaya Cîhanê


Lêkolîna sînemayê ya bi navê “Sînemaya Cîhanê” (2017) ya nivîskar û lêkolînerê kurd Dilazad A.R.Tî, ji aliyê Weşanên Zanîngeh ve bi kurdî û weke e-pirtûk hatiye weşandin. Pirtûk, ji çar lêkolînan pêk tê ku her yek van li ser mijarên sînemaya cîhanê ne. Sernavên lêkolînên sînemayê yên ku di nava vê pirtûkê de cih digrin ev in: “Bi Giştî Sînema û Dîroka Destpêka Sînemayê”, “Dîroka Sînemayên Welatên Cîhanê”, “Sînema û Propaganda”, Grass (Çîmen, Giya, Geya)”.
Nivîskar: Dilazad A.R.T
Weşanxane: Weşanên Zaningeh. Rûpel: 65



## Bi Hemû Filmên Xwe Yilmaz Guney

Pirtûka “Bütün Filmleri İle Yılmaz Güney” (Bi Hemû Filmên Xwe Yilmaz Guney) ya lêkolîner û nivîskarê tirk ji aliyê Agah Ozguç re bi tirkî hatibû amadekirin, hemû mijar û kurtî yên çîrokên filmên yên lîstikvan derhêner û sînemavanê navdarê kurd Yilmaz Guney’ê berhev kirine û bi 120 fîlmên Yilmaz Guneyî bi wêneyên filmên derhênerê ve hatiye weşandin. Lêkolîna Ahag Ozguçî di sala 2015ê de ji nû ve, ji aliyê Agora Kitaplığı ve hate weşandin û xebateke girîng û watedar e.
Nivîskar/Amadekar: Agah Özgüç
Weşanxane: Agora Kitaplığı. Rûpel: 379





## Destpêk û Dîroka Sînemayê

Xebata bi kurdî “Destpêk û Dîroka Sînemayê” (2018) ya nivîskar û lêkolînerê kurd Dilazad Artî, weke dijital / e-pirtûk ji Weşanên Zanîngehê hat weşandin û di rûpelên xwe de, ji destpêka heta roja me avakirin û pêşketinên hunera sînemayê bi awayekî lêkolînî mijar ji xwe re girtine. Di pirtûkê de geşedana sînemayê, ji despêkê hunera heftemîna heta roja me bi awayekî kronolojîk hatiye rêzkirin û ji bo sînemahez û sînemageran çavkaniyeke girîng e.
Nivîskar: Dilazad A.R.T
Weşanxane: Weşanên Zaningeh. Rûpel: 90




## Spêleya di Keştî de: Sazkirina Kurdîtî û Tirkatî ya di Sînemaya Tirkî de

Pirtûka "Gemideki Hayalet: Türk Sinemasında Kürtlüğün ve Türklüğün Kuruluşu" (Spêleya di Keştî de: Sazkirina Kurdîtî û Tirkatî ya di Sînemaya Tirkî de) ya nivîskarê sînemayê û akademîsyenê kurd Sebahattin Şenî di Îlona 2019ê de ji Weşanên Metis ve, bi tirkî hate weşandin. Lêkolîna nivîskar Sebahattin Şenî ji 9 beşan pêk were û nimanên Kurd û Tirk ên di Sînemaya Tirk de û têkîliyên serwerî û pêvajoya dîrokî vedikole. Pirtûk, ji danehevên lîteratûrên Rojhilatzanî û Kolonyalîzm sûd werdigire û xwendavenên xwe bi mînakên fîlman re derdixe rêwîtiyeke dîrokî. Di nava pirtûkê de; beşeke bi sernavê "Kürt Sineması: Varoluşun Politikası ve Poetikası" jî hatiye amadekirin. Her wiha nivîskar di rûpelên pirtûka xwe de fîlmên; "Hudutların Kanunu" (1966) yê Ömer Lütfi Akad, "Toprağın Kanı" (1966) yê Atıf Yılmaz, "Derman" (1983) yên Şerif Gören û Zeki Ökten, "Vizontele Tuuba" (2004) yê Yılmaz Erdoğan, "Hakkari'de Bir Mevsim" (1983) yê Erden Kıral û "Gelecek Uzun Sürer" (2011) yê Özcan Alperî, rave dike.
Nivîskar: Sebahattin Şen. Weşanxane: Weşanên Metis. Rûpel: 360




03

## Demê Hatiye Morkirin

Pirtûka bi rûsî "Запечатлённое время" (Demê Hatiye Morkirin), ji gelek nivîs û gotarên derhênerê nemir ê rûs Andrey Tarkovskî pêk were û heta niha bi gelek zimanên cîhanê hatiye wergerandin. Lêkolîna girîng a derhênerê, di nav nivîsa sînemayê de berhemek gelek girîng e û Tarkovsky tê de fikr, hest û ramanên xwe yên li ser hunera heftemîn ango sînemayê anîye zimên. Pirtûk, bi navê "Sculpting in Time" bi ingîlîz hat weşandin. Di 2007ê de bi wergeriya nivîskara tirk Füsun Ant re û pişt re jî ji aliyê werger û nivîskarê tirk Mazlum Beyhan ve ji bo tirkî hatiye wergerandin û di 2017ê de ji Weşanên Agorayê derketiye.
Nivîskar: Andrey Tarkovskî / Werger: Fûsun Alp û Mazlum Beyhan. Weşanxane: Agora Kitaplığı. Rûpel: 272
*Berga vê nivîsê, ji pirtûka "Destpêk û Dîroka Sînemayê" ya Dilazad Artî hatiye wergirtin.




## Sînemaya Neteweyekî Bêdewlet

Nivîskar û derhênerê kurd Soner Sert pirtûkeke bi navê “Devletsiz Bir Ulusun Sineması” (Sînemaya Neteweyekî Bêdewlet) amade kir ku qala hebûn û geşedana Sînemaya Kurdî dike. Lêkolîna nivîskarê di meha Cotmeha sala 2019ê de ji Weşanên Dipnot ve, bi tirkî derket. Pirtûka sînemayê ya Soner Sertî li ser hebûn û geşedana Sînemaya Kurdî disekine û bi aliyên civakî, siyasî, çandî, aborî ve, berhemên sînemavanên kurd ên ku li erdnîgariyên cuda de dijîn, vedikole û nîqaşeke estetîk dest pê dike. Pirtûk, li ser mijarên bêwarî, sînor û mirin, rehendên cuda yên fîlmên Sînemaya Kurdî vedikole.


Nivîskar û sînemagerê ciwan Soner Sert di pirtûka xwe ya nû de pirsa “Tiştê ku Sînemaya Kurdî Sînemaya Kurdî dike çi ye?” dipirse û bersiva wê pirsê digere. Sînemaya derhênerê navdar ê kurd Yilmaz Guney û bandorên wî yên li ser sînemavanên Kurd rave dike. Nivîskar, di lêkolîna xwe de, bi mînakên fîlmên wekî; “Dema Hespên Serxweş” (2000), “Gomgashtei Dar Aragh” (2003), “Kûsî Jî Dikarin Bifirin” (2005), “Nîvî Heyvê / Niwemang” (2006) yên Behmen Qubadî, “Votka Lemon” (2003), “Kilometre Zero” (2005), “Warê Min ê Îsota Şêrîn” (2013) yên Hiner Saleem, “Bîranînên Li Ser Kevirî” (2014) yê Shawkat Amin Korkî, “Fotograf” (2002) yê Kazim Ozî û “Gitmek: Benim Adım Marlon ve Brandom” (2008) yê Huseyin Karabey re, rehendên estetîka hevpar ên fîlmên Sînemaya Kurdî vedikole. Nivîskar di pirtûka xwe de, de qala destpêk û geşedana Sînemaya Kurdî dike û fîlmên Kurdî yên di salên 2000’an de li festîvalên fîlman ên neteweyî û navneteweyî de xelatan wergirtine, vedikole û di rûpelên xwe de ramanên geş dihewîne.

Nivîskar: Soner Sert
Weşanxane: Weşanên Dipnot. Rûpel: 192

# Mahîn Şêxanî

## QEDERA DIRÊJ

Qeder, bi ter, mest û gêj e
Delalê dil nebirêje
Peyvek tenê tu bibêje
Bê kaniya vînê bimêje
Evîn xweş e her weqt û dema
Wek saz û dîlan û sema
Mîrovno kes nebê çima
Evîna rast rastiyê dibêje
Cîhan tev pêr dixemile
Her rengek sed sorgul e
Yara min di nav de şah gul e
Di dil de ye ew ji mêj e
Ne nalîn û xem û hêsir
Ne axîn û jan û keder
Rengîn e buhara bi ter
Qedram bi ter pir dirêj e..



# JI BO ÇÊKİRİNA E-KOVARAN

MÎTANNÎ AJANS

mitanniajans@gmail.com